



## Naveroka hejmar 5

---

Sernivîsar

Husein Muhammed: Daçek di kurdî de

Roger Lescot: Memê Alan bi kurdî û fransî

Mehmet Özer: Xalbendî

Kurmancî, soranî, zazakî... zîwan yan dîyalekte? (kurmancî ra: Hasan Aslan)

Rizgar Behadur: The effect of orthographic depth on reading acquisition

Peter Trudgill: Ziman û netewe (wergêran: Hesenî Qazî)

Bikaranîna navên heywanan bi mecazî

Emîr Hesenpûr: Kêşey zimanî resmî (be soranî û bi kurmancî)

L. Beranî, E. Bamernî, D. Şerîf: Kurdish personal names: a sociolinguistic perspective

Kurterêbera ferhengsaziyê

“Ferhenga zanistên civakî” ya Abdurrahman Kîran

Zarname: ferhengoka tîrmên zimannasî

---

## Sernivîsar

### Hejmareke berfireh û tênaverok li ber we ye

Kovara zimannasî û zimanê kurdî *Kanîzar* dîsa li ber we ye, xwandevanên hêja. Vê carê em gihiştine hejmara pêncem. Bi hejmara rûpelan, her pênc hejmar tînan maneya bi qasî hezar rûpelên tênaverok derbarê zimanê kurdî û zimannasiya giştî. Di vê hejmarê tenê de nêzîkî 300 rûpel hene.

Vê carê çendînan zimannas û nivîskarên kevn û yênan nû cihê xwe di vê hejmarê de digirin. Vekolîn û nivîsarên vê carê bi kurmancî, soranî, zazakî yan inglîzî ne.

**Mehmet Özer** di vekolîneke berfireh de xalbendiya (nuqteşaniya, *punctuation*) kurdî bi nimûne pêşkêşî xwandevanên me dike. Ev lêkolîn bi dirêjahiya kitêbekê ye.

**Husein Muhammed** vê carê daçekên kurdî (*adposition*) kiriye mijara vekolîneke xwe ya 70-rûpelî. Daçek yek ji giringtirîn beşên zimanê kurdî ne lê heta niha yek ji jibîrkirîtirîn mijarên zimanê me bûne. Bi vê vekolîna berfireh û berhevder, armanc ew e ku valahiyeke berçav di zimannasiya kurdî de were dagirtin.

Di vê hejmarê de jî em nivîsareke dirêj ya **Peter Trudgill** bi soranîkirina **Hesen Qazî** diweşînin. Nivîsara me ya din bi soranî berdewamiya nivîsa **Emîr Hesenpûr** e ku em hem bi soranî û hem jî bi kurmancî pêşkêşî dikin.

Gelo kurmancî, soranî û zazakî her yek zimanekî serbixwe yan jî çend zar û lehceyên eynî zimanî ne – û li gor çî şert û pîvanan? Ev pirs mijara nivîsareke berfireh ya bi zazakî ye ku em vê carê belav dikin. Ew ji aliyê **Hasan Aslan** ve ji kurmancî hatiye wergerandin.


**Lezgîn Beranî, Esmâ Bamernî û Dilgeş Şerîf** bi berfirehî li ser navên kurdî û binavkirinê di civaka kurdî de bi inglîzî dinivîsin. Nivîsara me ya din bi inglîzî ji **Rizgar Behadur** e û derbarê tesîra alfabeyê li ser hêsanî yan dijiwariya hînbûna xwandinê ye.

Di vê hejmarê de jî em du kitêbên li ser zimanê kurdî dinirxînin – wek her carê, niha jî yeke nû û yeke kevn. Berhema nû *Ferhenga Zanistên Civakî* ya **Abdurrahman Kiran** e. Ya kevn jî dastana *Memê Alan* bi berhevkirin û fransîkirina **Roger Lescot** e. Em ne tenê vê berheme dinasînin û dinirxînin – em herwiha wê ji xwandevanên xwe re li ser malpera xwe berdest dikin.

Bo hêsanîkirina têgihiştina nivîsar û vekolînên zimannasî, em di vê hejmarê de jî ferhengoka Kanîzarê ya peyvên zimannasî ji berê berfirehtir belav dikin.

## DAÇEK DI ZIMANÊ KURDÎ DE

**Husein Muhammed**



“**Di** tarîka şeva hicran çiraxek sîfet im ya Reb  
**Ji** ser **heta** piyan ar e, **bi** carek vêketim ya Reb  
Nema min sebr û aramek **ji ber** jana evîna dil  
Evîn behr e belê tenha **di ber** pêlan ketim ya Reb  
**Ji** dilber dûr ketim lewra bela ser daye can û dil  
Temaşa nakî ey zalim kî ez bêtaqet im ya Reb  
Meger pirsê **li** min nakî belê tim tê xiyala min  
Şev û rojan **bi** nalîn im **bi** ah û hesret im ya Reb  
Şev û rojan **bi** kovan im **bi** bilbil **re** dilovan im  
Hevalê xuncê baxan im, **ji** gul ez dûr ketim ya Reb  
**Di** gel bilbil dinalim ez, zirav im wek hilal im ez  
Şikestî rengê dal im ez, **di** halê hirqet im ya Reb  
**Di** kûra 'eşqê borî me, yeqîn ez pîrê torî me  
**Di** "lailma" derûrî me, **di** qeyda hicret im ya Reb  
Meger ez Rustemê kurd im, firaqê ez nexweş kerdim  
Cegerxwîn im siyahçerd im **di** kunca xelwet im ya Reb

Cegerxwîn: Şeva hicran<sup>1</sup>

## 1. MIJAR Û PEYVNASIYA WÊ

**Daçek** (adpozisyon, bi inglîzî *adposition*) birreke peyvan (word class) ya rêzimanî ye ku têkiliyên cihî yan demî diyar dike yan jî hin erkên wateyî nîşan dike.

Daçek li gel navdêran, cînavan, rengdêran, hokeran yan jî komikên navdêrî tên bikaranîn. Ji van gotinên bi daçekan re tên bikaranîn di rêzimanê re **temamker** (*complement*) yan jî berkara daçekî (*object of the preposition*) tê gotin. Daçek û tamamker bi hev re dibin **komika daçekî** (*adpositional phrase*).

Di kurdî de daçek dikarin pêşdaçek (*preposition*), paşdaçek (*postposition*) yan jî dordaçek (*circumposition*) bin.

**Pêşdaçek** (*preposition*) dikevin berî tamamkerên xwe (daçek di nimûneyan de hatine qelewkirin):

- **li** malê
- **bi** kêran
- **ji** Kurdistanê
- **bo** me kurdan
- **ji** kû?
- **heta** niha
- **bi** xwandin û nivîsînê

**Dordaçek** (*circumposition*) ji du yan zêdetir beşan pêk tînin ku bi kêmî beşeke wê li pêş û beşekê li paş tamamkerê ye:

- **di** kitêbê **de**
- **ji** min **re**
- **bi** hevalên xwe **re**
- **ji** wê rojê **ve**
- **ber bi** malê **ve**

<sup>1</sup> Heman helbest ji aliyê hunermend Xelîl Xemgîn ve bi deng hatiye navdarkirin lê di versiyona dengî de çendîn guhartin hatine kirin ku ya giringtirîn guherandina “ya Reb” bi gotina “wey lê” ye:

[https://www.youtube.com/watch?v=54x\\_b9GsGHQ](https://www.youtube.com/watch?v=54x_b9GsGHQ). Heman helbestê herwiha navê xwe daye bernameyeke helbestan bi pêşkêşkeriya Ehmed Huseynî di Ronahî TV de.

- ji sala 1994 şûn de

**Paşdaçek** (*postposition*) ew daçek in ku dikevin pey temamkera xwe:

- kû ve, kû de, pişt re, dû re

Paşdaçekan bêyî pêşdaçekan di kurmanciya nivîskî de diyardeyeke nadir e. Anku gava ku mirov paşdaçekan di kurmancî de bi kar tîne, di zimanê nivîskî û di devokên rojhilatî û navendî de adeten pêşdaçekan jî pê re dibêje yan dinivîse anku wan bi hev re dike dordaçek.

Lê li deverên herî bakur û rojava yên kurmancîaxiv de, paşdaçek bi berfirehî li cihê dordaçekan yan jî heta carinan li cihê pêşdaçekan jî tên bikaranîn. Bo nimûne:

standard, rojhilatî, navendî	rojawayî, bakurî <sup>2</sup>
di kitêbe de <sup>3</sup>	kitêbê de
ji min re <sup>4</sup>	mi[n] ra, mi[n] re
li mal(ê)	mal(ê) de, mal(ê) da
ji zû ve/de	zû de, zû da

Ji aliyê peydabûna xwe ve daçek dikarin **xwerû** anku **sade** bin anku ne ji du yan zêdetir beşan pêk hatibin (bo nimûne pêşdaçekên “bi, di, ji, li, heta” yan paşdaçekên “de, re, ve”) yan jî **pêkhatî** anku **komdaçek** bin anku ji du yan zêdetir beşan pêk hatibin (bo nimûne “li ser, ber bi, ji bo”).

Daçek dikarin **komikgir** bin anku bikevin gel komikeke peyvane: bo nimûne “li, ji, heta” ku dikarin di komikên wek “li Kurdistanê, ji mala me, heta dikana taxê” de bên bikaranîn. Yan jî daçek dikarin serbixwe bin, bo nimûne “pê, jê re, tê de” ku nakevin gel ti peyvên din daku komikên daçekî pêk bînin yan jî bi xwe komikeke daçekî pêk tînin.

<sup>2</sup> Li vir mebest ji “rojawayî, bakurî” deverên kurmancîaxiv yên herî bakur û rojava ne, mexsed ne hemû Bakurê Kurdistanê yan hemû Rojavayê Kurdistanê ye.

<sup>3</sup> Li cihê paşdaçekên “de, re” yên zimanê nivîskî adeten di devokan de “da, ra” hene. Li cihê paşdaçeka “ve” ya zimanê nivîskî jî di hin devokan “va” heye lê di piraniya devokan de jî “ve” li kar e.

<sup>4</sup> Devokên rojhilatî li cihê “ji ... re, ji ... ra” adeten pêşdaçeka “bo” bi kar tînin.



Peyva “daçek” di rêzîmannivîsîna kurmançî de bi berfirehî bi vê maneyê li kar e.<sup>5</sup> Lê hin caran ew bi maneya hemû pêşgir û paşgir û peyvikên din jî yê biçûk hatiye bikaranîn.<sup>6</sup> Lê bi serdestî “daçek” di kurmançî de bi wateya “adpozisyon”, xaseten “prepozisyon” hatiye bikaranîn û li vê derê jî bikaranîna me ya peyvê dê di wî warî de be. Bi qasî ku tê zanîn, peyva “daçek” yekem car jî aliyê Celadet Bedirxan ve di Hawarê de hatiye bikaranîn û wisa diyar e ku peyv jî aliyê wî ve hatiye dariştin.

Bi esehî etîmolojiya peyva “daçek” jî nayê zanîn tevî ku bêguman e ku ew nûpeyveke çêkirî anku neolojîzmek e. Texmînen ew jî peyvên “dan” û “çek” hatiye sazîkirin. “Çek” li vê derê ne (tenê) maneya “sîleh” dide lê wateya “çil, alet, amûr” jî dide (wek di hin devokên kurmançî de, bi taybetî li Mêrdînê). “Çek” dikare herwiha forma palatalîzekirî jî peyva “tek” (tevî, li gel, pê re) be anku “dan pê re, dan gel” jî ber ku mirov daçekan dide gel hin birrên din yê peyvan, wan bi tenê bi kar naîne. Bo ketina N jî “dan”ê, bidin ber “daxuyanî” jî “dan-xuyanî”.

Di soranî de ti peyveke baş-çihê-xwe-girtî ya bi maneya “daçek” peyda nabe. Hin caran gotina “amrazî danepa” yan “amrazî xistinepa” (amûra dan palê, amraza dan pê re), gelek caran jî peyva inglîzî “preposition” bi wayê “prîpozîşîn” di rêzîmanên bi soranî de tê bikaranîn.<sup>7</sup> Herçi rêzîmannivîsîna bi zazakî ye, bi piranî wek tirkî peyva “edat” ya esil-erebî bi kar tîne.<sup>8</sup> Di kurdiya başûrî de peyva “gerdnîş” bi maneya “daçek” hatiye bikaranîn.<sup>9</sup>

## 2. EV VEKOLÎN Û YÊN BERÎ WÊ

Daçek di kurdî de yek jî birrên bîngêhîn yê peyvan in (li gel navdêr, lêker, rengdêr, hoker û cînavan). Loma di piraniya kitêbên rêzîmanê de cih jî daçekan re jî hatiye dan. Lê dîsa jî cihê ku di rêzîmannameyên kurdî de jî daçekan re tê dan, beramberî cihê ku jî birrên din yê peyvan re (xaseten jî lêker û navdêran re) tê terxankirin, pir kurt û kême. Sebebê vê ew e ku rêzîmannivîsîna

<sup>5</sup> Binêrin bo nimûne: Îbrahîm Seydo Aydoğan: Rêzîmanên Kurdî û Termînolojiya Wan:

<http://www.kurdigeh.com/rwdx/sitepdf/Ib.Seydo-terminoloji.pdf>

<sup>6</sup> Bo nimûne Selîm Biçûk di kitêba xwe ”Rêzîmana Kurdî – Kurmançî” de peyva “daçek” bi vê maneya berfireh dinivîse: [http://www.bicuk.de/reziman1.htm#1.2.3.7\\_Daçek](http://www.bicuk.de/reziman1.htm#1.2.3.7_Daçek)

<sup>7</sup> Bo nimûne:

[http://yageyziman.com/Renusi\\_Kurdi.htm#%D9%BE%D8%B1%DB%8C%D9%BE%DB%86%D8%B2%DB%8C%D8%B4%DB%86%D9%86\\_\(preposition\)](http://yageyziman.com/Renusi_Kurdi.htm#%D9%BE%D8%B1%DB%8C%D9%BE%DB%86%D8%B2%DB%8C%D8%B4%DB%86%D9%86_(preposition))

<sup>8</sup> Binêrin bo nimûne: <https://zimannas.wordpress.com/2016/03/16/edat-zazaki-de/>

<sup>9</sup> <https://zimannas.wordpress.com/2015/10/08/gerdnis1-le-kurdi-kirmasani/>

kurdî bi piranî li ser çemandin û ravekirinê ye û daçek nayên çemandin û bi piranî bi ravekê (izafeyê) nayê girêdan jî.

Heta niha ne bi kurmançî û ne jî bi ti lehceyên din jî yên kurdî ti vekolîneke berfireh li ser daçekan nehatiye kirin. Herwiha, ti berhevdaneke berfireh di navbera daçekên lehceyên cuda yên kurdî de yan jî di navbera daçekan de di kurdî û di zîmanên din de nehatine kirin.<sup>10</sup>

Di rastiyê de ne tenê di kurdî de lê heta di zîmanên din de jî vekolînên berfireh li ser daçekan kêmin. Sebeb ihtimalen ew e ku daçek bi piranî “rût” in: bêpêşgir û bêpaşgir in, bêcîns û bêhejmar in – mirov dikare bibêje ku hinekî “bêkes” in. Belkî rêzîmnas ji ber rûtiya wan ti tiştêkî hêjayî vekolînê tê de his nakin.

Lê daçek ji aliyê şiklê xwe ve sade û rût bin jî, ji hêla bikaranîn û wate û watedana xwe ve gelek giring û bingehîn in. Herwiha tesîra wan li ser peyvên berî yan piştî wan heye. Lê bo vekolîna wan, divê mirov ji daçekan bi xwe zêdetir li derdorên wan binêre daku giringî û rola wan fehm bike. Lê mixabin ji gelek rêzîmannivîsan re hêsantir e ku bi carekê tenê li peyvekê binêrin loma ti tiştên hêjayî vekolînê di daçekên “rût” de nabînin.

Armanca vê vekolînê ew e ku bi awayekî zimannasî û sistematîkî lê bi şêweyekî bo xwandinê hêsan û fehmbar daçekên kurdî bide nasîn. Em ê daçek û cûreyên wan binasînin. Em ê daçekên bingehîn yên kurmançî, lehceyên din yên kurdî û zîmanên din yên lêzim bidin ber hev û diyar bikin ka daçekên niha yên kurdî ji kû tî. Daçek bi xwe di kurdî de naçemin lê peyvên bi xwe re diçemînin – em ê diyar bikin ka ev çemandin çawa ye û sinorên wê çi ne. Em behsa daçekên bi zerûrî ravekdar (bi ravek, bi izafe), yên bi dilxwazî ravekdar û yên bi mecbûrî bêravek bikin.

Yek ji taybetmendiyên giring yên kurdî (xaseten kurmançiya nivîskî) hebûna mişe û zehf ya dordaçekan (*circumposition*) e. Em ê diyar bikin ka ew çi ne, çawa çêbûne û çima tiştêkî wisa di kurdî de berbelav e.

### 3. ERKÊN DAÇEKAN

<sup>10</sup> Di çend kitêbên rêzîmanê de yên bi ravekirina lehceyê kurdî bi lehceyê din (bo nimûne kitêba Roşan Lezgîn ya rêzîmana zazakî bi kurmançî) yan kitêbên berhevdana lehceyên kurdî (bo nimûne rêzenivîsên Seîd Veroj li ser berhevdana kurmançî û zazakî) lê ev jî tenê kurt in û bi pîralî li meseleyê nanêrin.



Daçek di kurdî de bi taybetî lêmangeha tiştan, jêdera wan û bereka wan diyar dîkin. Mebest ji “lêmangeh” li vê derê ew cih e ku tiştê lê ye, “jêder” ew cih e tiştê jê tê yan jê peyda dibe. Mebest ji “berek” jî ew cih e ku tiştê ber bi wî ve diçe yan tê birin:

- lêmangeh (*position*):
  - o ew li Kurdistanê bû.
  - o di rojnameyê de hatiye nivîsîn ku...
- jêder (*source*): Ez ji malê hatim.
  - o Ew ji Afrîkayê ye.
- berek (*direction*):
  - o Ew ber bi me ve hatin.
  - o Ez ê ji te re bînim.

Erka din ya serekî ya daçekan diyarkirina têkiliya gotinên demî ne:

- di du hefteyan de
- bi rojekê
- heta sibê
- ji niha pê ve

Li jêrtir em ê hem li bikaranîna daçekan li gel gotinên cihî û hem jî li gel yên demî ve gerin.

#### 4. DAÇEK LI GEL BIRRÊN DIN

Daçek adeten ne tenê lê li gel hin birrên din yên peyvan tê bikaranîn. Di gelek zîmanan de adeten daçek tenê di komikê de bi navdêr yan cînavan re tên xebitandin. Di kurdî de jî bi piranî wisa ye.

Lê di rastiyê de daçek di kurdî de dikarin hemû birrên din jî yên peyvan wergirin. Li vê derê em ê bibînim ku daçek dikarin ne tenê her carê bi peyveke ji birrê ve lê heta çend peyvên her yek ji birrê jî komikan pêk bînin.

Li vê derê em ê bi çend nimûneyan bikarhatina daçekan li gel her birreke din a peyvan destnîşan bikin.

### **Daçek + navdêr**

Daçek bi berfirehî li gel navdêran komikên daçekî çêdikin. Hem pêşdaçek, hem paşdaçek û hem jî dordaçek di kurdî de dikarin li gel navdêran peyda bibin. Bo nimûne:

- pêşdaçek û navdêr: bi tirimpêlê, ji dikanê, heta malê
- dordaçek û navdêr: di kitêbê de, ber bi sinor ve, di Helebê re
- paşdaçek û navdêr (tenê devokî): malê de (standard: li malê)

### **Daçek + cînav**

Daçek herwiha bi berfirehî bi cînavan re komikan çêdikin. Dîsa hem pêşdaçek, hem paşdaçek û hem jî dordaçek di kurdî de dikarin li gel cînavan peyda bibin. Bo nimûne:

- pêşdaçek û cînav: bi te, ji wan, li we
- dordaçek û cînav: ji min re, ber bi wî ve, li ba wê
- paşdaçek û cînav (tenê devokî): mi ra (standard: ji min re)

Ji bilî van, daçek û cînav (bi taybetî cînavên kesê sêyem) bi hev ve dihelin jî:

- jê (ji wê/wî/wan
- pê ve (bi wê/wî/wan ve)
- tê de (di wê/wî/wan de)

### **Daçek û hoker**

Daçek û hoker jî bi berfirehî bi hev re komikan çêdikin. Bo nimûne:

- pêşdaçek û hoker: ji jêr, heta jor, ber bi pêş
- dordaçek û hoker: ji niha ve, di paş re
- paşdaçek û hoker: paş ve, pêş ve

### **Daçek û rengdêr**

Ne bi qasî navdêr, cînav û hokeran bi berfirehî lê dîsa rengdêr jî bi daçekan re komikên daçekî pêk tînin. Bo nimûne:

- pêşdaçek û rengdêr: bi tenê, ji dûr
- dordaçek û rengdêr: ji nêzîk ve

### Daçek û lêker?

Daçeka “-e” ya bi maneya “ber bi ... ve” bi lêkeran vet ê nivîsîn:

- hat-e malê (ber bi malê ve hat, heta malê hat, bo malê hat)
- diçim-e wê derê

Di nivîsînê de ev “-e” bi piraniyeke mutleq di kurmancî û soranî de bi lêkera berî xwe vet ê nivîsîn. Ji ber erk û fonksiyona xwe, ew bi çend lêkerên livînê yan livandinê yan jî raguhestinê (neqilkirinê) re tê bikaranîn, bo nimûne: çûn, hatin, birin, dan...

Lê ji aliyê hevoknasî ve ev daçeka “-e” ne ji komika lêkera pê ve lê ser bi peyva li dûv wê ve ye:

- [hat][e malê]

Anku “e” li gel peyva “malê” komikeke daçekî pêk tîne, wek:

- [heta malê] [hat]
- [ber bi malê ve] [hat]

Lê [e malê] tenê bi pêşrewiya lêkera berî xwe mimkin e û daçeka “e” bêyî lêkera berî xwe peyda nabe.

### Daçek li gel komikan

Daçek dikarin ne tenê di heman demê de li gel peyveke ji birreke din werin bikaranîn lê ew dikarin di heman demê de li gel çendîn peyvên ji birrên cuda komikan pêk bînin. Li vê derê em ê tenê çend nimûneyan bidin:

- pêşdaçek + navdêr + cînav: *li mala me*
- pêşdaçek + navdêr + rengdêr: *ji bajarekî mezin*

- pêşdaçek + navdêr + cînav + rengdêr: *ji bajarê me yê mezin*
- pêşdaçek + navdêr + cînav + hoker + rengdêr: *li bajarê me yê hinekî mezin*
- pêşdaçek + tevoka têtildar (*relative clause*): *li karê ku ew dike*
- dordaçek + navdêr + cînav: *di kitêba wê de*
- dordaçek + navdêr + rengdêr: *di kitêba mezin de*
- dordaçek + navdêr + cînav + rengdêr: *di kitêba wê ya mezin de*
- dordaçek + navdêr + cînav + hoker + rengdêr: *di kitêba wê ya pir mezin de*
- dordaçek + tevoka têtildar: *di kitêba ku ew dixwînim de*
- hoker + paşdaçek: *pêş-ve, paş-ve, vir-de, wir-de*

## 5. DAÇEK Û TEWANG

Di kurmancî de di zimanê ji herdu halên navdêr û cînavan, li gor rêbaza giştî halê çemandî anku tewandî bi daçekan re tê bikaranîn:

- li Kurdistanê (ne “li Kurdistan”)
- bo min (ne “\*bo ez”)
- bi kerekî
- ji kurdan re

Ev qeyd û bendeke giştî ye lê divê were gotin ku çendîn haletên awarte û istisnayî jê hene ku em ê li jêr rê bikin.

Halê çemandî bi xwe ne herdem ji halê neçemandî cuda ye anku herdu eynî ne:

- welat (neçemandî) – welat (çemandî, di hin devokan de “welatî”, di hinên din de “welêt”):
  - o ji welat/welatî/welêt

Piraniya navên deveran, yên ku bi forma xwe ya xwerû anku neçemandî bi vokalekê bi dawî tînin, di nav piraniya kurmancîaxivan de forma wan ya çemandî jî her eynî form e:

- neçemandî: Almanyayê, Qamişlo, Zaxo
- çemandî: Almanyayê, Qamişloyê, Zaxoyê”
  - o li Almanyayê/Qamişloyê/Zaxoyê”

Di biwêjan de adeten navdêrên beşeke bingehîn ji biwêjê naçemînin. Bo nimûne:

- bi kar anîn (ne "bi karî anîn")
- ji hal çûn (ne "ji halî çûn")

Lê eger navdêr ne beşek bingehîn yê biwêjê be anku bikare bi peyveke din biguhere, hingê ew diçeme:

- dest pê kirin: dest bi xwandinê kirin, dest bi dest bi nivîsînê kirin (ne "dest bi nivîsîn/xwandin kirin")

Navdêrên hokerkirî yan daçekkirî yan li gel daçekan dikarin neçemin yan jî du formên wan yê çemandî û neçemandî li gel daçekan li kar in lê maneya wan ne eynî ye:

- li serî/binî (li beşa jorîn/jêrîn)
- li ser/bin (kurtkirina bo nimûne "li ser/bin maseyê")

Rengdêrên kurmancî hal û hejmaran tine ne loma forma bi daçekan re tê bikaranîn jî xwerû ye:

- "dûr" → "ji dûr" (bidin ber "dikan" → ji dikanê/dikanan" ji ber ku "dikan" navdêr e û forma wê ya çemandî ya yekhejmar yan pirhejmar bi daçekan re tê bikaranîn lê "dûr" rengdêr e û tenê wek xwe dimîne)

Hokerên jî bêyî hal û hejmar in loma bi daçekan re jî nayên çemandin:

- ji niha ve, ber bi jêr ve

Lê çend hoker ji aliyê bikaranîna xwe ve dikarin bibin navdêr jî û wisa werin çemandin jî:

- jêr → li jêrê (li beşa jêrîn)
- jor → li jorê (li beşa jorîn)

Navdêr di kurmancî de bi dubareyî naçemin. Loma eger navdêr yan cînav ji xwe ji ber ravekê hatibe çemandin, ew êdî duçarî naçeme:

- "Kurdistan → li Kurdistan-ê" → lê "Başûrê Kurdistanê → li Başûrê Kurdistanê" (ne "li Başûrê Kurdistanê-ê")
- "ew → mala ew-ê → mala wê" lê "mala wê → ji mala wê" (ne "mala wê-ê")

Heta hin navdêrên mê jî dikarin neçemandî jî bên bikaranîn û pir tînen bikaranîn jî:

- li mal = li malê

Navê gelek deverên Kurdistanê bi eslê xwe pirhejmarên çemandî ne û êdî ew dubare nayên çemandin:

- li Botan/Behdînan/Mukriyan/Serhedan (pir kêmbi awayê: li Botanê/Behdînanê/Mukriyanê, qet ne "li Serhedanê")

Gelek caran navê deverên din jî neçemandî tê dîtin:

- li Kurdistan

Ev nimûne di zîmanê normal de nerêzîmanî (li gor rêzîmanê nerast) tê hesabandin. Lê bikaranîna vî awayî di helbestan de mimkin e.

Herçi birrên ji bilî navdêr û cînavan in, ew di bin tesîra daçekan de naçemin:

- rengdêr: nêzîk → ji nêzîk ve
- hoker: niha → heta niha

## 6. DAÇEK Û RAVEK<sup>11</sup>

Di rêzîmana kurdî de mebest ji "ravek"ê paşgîrek e ku dikeve dûv peyva pêştir û wê bi peyva li pey wê ve girê dide. Di kurmançî de ev paşgîr li gor ne herdem eynî paşgîr e lê li gor cîsê mê (-a, -ya), nêr (-ê, -yê) û pirhejmar (-ên, -yên<sup>12</sup>) in:

- kitêba Hesênî
- destê wê
- sêvên sor

Peyva yekem herdem navdêr e yan jî rengdêr yan lêkerên navdêrkirî ne. Peyva duye dikare navdêr, cînav, rengdêr, rengdêreke navdêrkirî yan lêkerêke navdêrkirî be. Peyva duyem raveker e û peyva yekem jî raveber e anku peyva duyem peyva yekem rave dike, şirove dike, deqîqtir dike û hwd. Bi

---

<sup>11</sup> Bo bikaranîna ravekê (izafeyê) yan bikarneanîna wê li gel daçekan di farisî de, binêrin bo nimûne: Marina Rantseva: Persian Preposition Classes: <http://septentrio.uit.no/index.php/nordlyd/article/view/75/71>

<sup>12</sup> Di hin devokan de -êt, -êd, -yêt, -yêd, -ê, -yê.



gotineke din, peyva duyem behsa çawanî, xwediya/ê yan bikaranîna ya peyva yekem dike. Bo nimûne:

- navdêr + navdêr: kitêba Fatê
- navdêr + cînav: kitêba wê
- navdêr + rengdêr: kitêba xweş
- navdêr + lêkereke navdêrkiirî: kitêba xwandinê
- navdêr + rengdêreke navdêrkiirî: kitêba mezinê (bo nimûne xwişka mezin)

Carinan ravek dikare cînav jî be:

- ezê/eza/ezî reben
- tuyê hêja

Gelo ravek li gel daçekan jî heye anku gelo pêşdaçek bi peyva berî xwe ve yan jî paşdaçek bi peyva piştî xwe ve bi ravekê tên girêdan?

Pêşdaçekên bingehîn "bi, di, ji" bi bi ravekê bi peyva pey xwe ve nayên girêdan:

- bi kêran (ne "\*bi-ya kêran" yan "\*bi-yê kêran")
- ji malê (ne "ji-ya malê" yan "\*ji-yê malê")
- di rojnameyekê de (ne "di-ya rojnameyekê de" yan "\*di-yê rojnameyekê de")

Helbet gotinên wek "bi ya min", "bi ya nû", "bi ya malê" yan "bi yê min, bi yê nû, bi yê malê" yan jî "bi yên min, bi yên nû, bi yên malê" hene lê li vir ravek ne aîdî daçekê ye lê li şûna peyvekê navdêrekî hatiye bikaranîn ku di gotinê de hatiye jêxistin:

- bi ya min = bi gotina min
- bi yê nû = bi bivirê nû
- bi ya malê = bi pencereya malê

Bi heman awayî gotinên wek "ji ya min", "di ya min de" û hwd. jî hene. Lê li vir "ya, yê, yên" tenê şûngirên hin navdêran in, ew ne girêdekên navbera daçek û berkarên wan in.

Heta piraniya daçekên pêkhatî, yên ku beşeke wan ji navdêran pêk hatiye jî, adeten bêyî ravekê tên bikaranîn:

- li ser xanî (ne "li serê xanî")
- li bin erdê (ne "li binê erdê")

Lê carinan ravek jî tê bikaranîn:

- li teniştaya xanî
- li kêleka dikanê
- ji serê mehê ve

Lê mirov carinan heman peyvê hem bi ravekê re û hem jî bêyî ravekê dibîne:

- li serê çiya
- li ser xanî
- berî te, beriya te
- li nav bajarê, li nava bajarê

Gelo mesele çî ye û em ê çawa bizanin ka kengî kîjan awa tê bikaranîn? Eger herdu awa jî rast bin, gelo wateya wan eynî ye? Gelo di vê meseleyê de ti cudahî di navbera lehceyan de hene?

## 6.1. Daçekên bi zerûrî bêyî ravek

Wek ku me li jor got, daçekên bingehîn "bi, di, ji" û herwiha daçeka "li" – gava ku xwerû tîn bikaranîn – ravekê nagirin û nikarin bigirin jî:<sup>13</sup>

- bi tirimpêlê
- di xew çû
- ji Kurdistanê
- li gundan

Ew herwiha wek beşek ji dordaçekan jî bi zerûrî bêyî ravek tîn bikaranîn:

- bi dîwaran ve
- di kitêbê de
- ji niha ve

---

<sup>13</sup> Bo daçeka "bo, ji bo, ji boyî, ji bona" li jêtir di nivîsê de binêrin.

Herwiha bi hin daçekên aloz anku pêkhatî re jî bikaranîna ravekê ne mimkin e:

- li gel wan (ne \*li gelê wan” yan “li gela wan”)

## 6.2. Bi dilxwazî bi ravekê re

Li gel daçekên pêkhatî, yên ku beşa wan ya duyem bi eslê xwe navdêr be, bi piranî bikaranîna ravekê mimkin e:

- çû serê çiya
- ji tenişt malê
- heta pişt gundî
- li dora taxê zivirîn
- ji aliyê wî ve hatiye nivîsîn

Lê heman peyv dikarin bêyî ravek jî werin bikaranîn loma em dibêjin ku ew bi dilxwazî bi ravekê re ne:

- çû ser xanî
- ji tenişt malê
- heta pişt gundî
- li dor taxê zivirîn
- ji alî wî ve hatiye nivîsîn

Piraniya daçekên pêkhatî wiha bi dilxwazî dikarin bi ravekê re bî bikaranîn lê bikaranîna wan bi ravekê re ne zerûrî ne. Lê wek ku me li jor dît, peyva “gel” di daçeka “li gel” de nikare ravekê bigire tevî ku eslê peyva “gel” navdêr e jî – lê “li gel” niha êdî wek daçek tê hesibandin û peyva “gel” bi wateya xwe ya eslî anku “kom, grûp” êdî nayê bikaranîn yan jî pir bisinor bûye û tenê maneya “koma etnîkî/zimanî” dide.

Ji bilî daçekên ku beşeke wan bi zelalî navdêr e, hin navdêrên din jî dikarin ravekê bigirin lê bikaranîna ravekê bi wan re ne zerûrî ye:

- li gor → li gora wî

- ji bo → ji bona<sup>14</sup> wê

Ji bilî van formên bi ravekê, herwiha ji van daçekan varyantên bi daçeka -î/-yî jî hene:

- li gorî wî
- ji boyî wê

### 6.3. Hin caran zerûrî

Bi hin daçekên pêkhatî re jî bikaranîna ravekê zerûrî ye. Bo nimûne:

- bi xêra/saya wan (ne “\*bi xêr/say wan”)
- bi xatirê/xatira<sup>15</sup> we (ne “\*bi xatir we”)
- derheqê meselê<sup>16</sup>
- derbareyê/derbarê me (ne “\*derbare me” yan “\*derbar me”)

Hin ji van daçekan, ji bilî bi raveka -ê/-a, dikarin herwiha bi-î/-yî re jî bînan bikaranîn:

- derbareyî me

Li vê derê di rastiyê de di “derbare-yî” de “-yî” ne daçek e (wek “dij-î, temaşe-yî TV kir) lê raveka soranî ye ku hevberî ravekên kurmancî -a û -ê ye, wek:

- kiçî min (keça min)
- kurî min (kurê min)

Hin caran hin daçekên pêkhatî wisa pir bi ravekê re tên bikaranîn ku mirov dibêje qey bikaranîna ravekê bi wan re zerûrî ye. Bo nimûne:

- ji aliyê kê ve hatiye nivîsîn?
- bi destê dijminan hat kuştin

<sup>14</sup> Dengê N di “ji bo-n-a” de herfa rêgirtina li ber hiyatusê ye. Bo hiyatusê û rêgirtina li ber wê, binêrin:

<https://zimannas.wordpress.com/2016/02/22/hiyatus-u-regirtina-li-ber-we-di-dengnasiya-kurdi-de/>

<sup>15</sup> Awayê “bi xatirê we” bi kurmanciya navendî û varyanta “bi xatira we” jî forma kurmanciya rojhilatî ye. Anku di kurmanciya navendî de “xatir” nêr e lê di kurmanciya rojhilatî de mê ye. Lê li vê derê ya giring: herdu komdevok jî peyva “xatir” di daçekê de bi ravekê bi peyva pey wê ve girê didin û bikaranîna “xatir”ê bêyî ravekê ne mimkin e.

<sup>16</sup> Herwiha “derheqê meselê de” û “di derheqê meselê de”

Lê heta daçekên wiha jî carinan bi awayê bêyî ravek tên dîtîn:

- ji alî hêzên amerîkî ve<sup>17</sup> (li şûna “ji aliyê hêzên amerîkî ve)
- Ji alî din ve<sup>18</sup>

Carinan mirov herdu awayên bikaranînê heta di heman nivîsa heman nivîserî de jî dibîne:

- “ji aliyê xwe ve” û “ji alî olî û netewî ve”<sup>19</sup>
- “bi aliyê xwe ve” û “bi alî xwe ve”<sup>20</sup>

Wisa dixuye ku, çiqas bikaranîna daçekekê zêdetir dibe û zêdetir bi awayekî ji maneyên konkret yê peyvên pêkîner dûr dikeve, wisa bikaranîna ravekê jî yan dikeve yan jî dibe bi dilxwazî.

#### 6.4. Cudahiyên devokî

Bikaranîna daçekên bi ravekan re yan jî bêyî ravekan di kurmanciya nivîskî de bi herdu awayan were dîtîn jî, li gor hin devokan carinan tenê yek ji wan mimkin e. Bo nimûne, mirov di nivîsên kurmancî de van herdu varyantan dibîne:

- “li nav bajaran” û “li nava bajaran”
- “berî wan” û “beriya wan”

Ji van yê bêyî ravek (“li nav bajaran, berî wan”) formên kurmanciya rojhilatî ne û formên bi ravekê re jî (“li nava bajaran, beriya wan”) varyantên kurmanciya navendî ne. Eger mirov teng bi devokî lê binêre, awayê “berî wan” di kurmanciya navendî de û forma “beriya wan” jî di devokên kurmanciya rojhilatî de ne mimkin in yan şaş in.

Di kurmanciya nivîskî de herdu awa tên dîtîn ji ber ku nivîskarên kurmancî hin qîsekerên kurmanciya rojhilatî û hin jî peyiverên kurmanciya navendî ne (û hin jî axiverên hin devokên din in) û herwiha ji ber ku ti nivîskar tenê xwe bi devoka xwe ve sinordar nakin û sûd û kelkê ji awayên devok, zarava û heta zimanên din jî werdigirin.

<sup>17</sup> <http://krd.sputniknews.com/kurdistan/20150709/338529.html>

<sup>18</sup> <https://muradciwan.wordpress.com/2013/11/12/serdana-barzani-a-irane/>

<sup>19</sup> Herdu nimûne ji vê nivîsarê ne: <http://www.rojevakurd.com/cend-gotin-li-ser-qirkirna-ermeyan/>

<sup>20</sup> Herdu nimûne ji: <http://rudaw.net/kurmanci/middleeast/turkey/261220151>

## 6.5. Cudahiyên bergehî û wateyî

Li gel hin peyvên tenê formên bê ravek yê daçekên pêkhatî bi serdestî li kar in. Bo nimûne, di kurmançî de em adeten dibêjin “kitêb li ser maseyê/masê/mêzê” ye lê em nabêjin “kitêb li serê maseyê/masê/mêzê” ye. Di rastiyê de awayê “kitêb li serê maseyê ye” jî mimkin e lê hin maneya wê ne tam wek ya “kitêb li ser maseyê ye” ye:

“Li ser maseyê” tê maneya ku kitêb ser cihê bilind yê maseyê ye û mase wê radigire û loma kitêb nakeve xwarê. Lê “li serê maseyê” maneya tiştêkî wek “li rexekî/aliyekî” maseyê dide.

Nimûneyeke din: Eger bibêjin ku filan tişt “li ser çiya ye”, mebesta me ew e ku ew tişt bi rastî li gupika anku nuqteya herî bilind ya çiyayekî ye. Lê eger em bibêjin filan tişt “li serê çiya ye”, mebesta me ew e ku ew li devereke çiyayî ye lê ne illeh li gupika/lûtkeya çiyayekî ye.

Nimûneyeke din: Di hin devokên kurmançî de “heyv” hem maneya “gerestêrka şevê” (bi inglîzî “moon”) û hem jî wateya “meh, teqrîben 30 roj” dide (bi inglîzî “month”).<sup>21</sup> Wek prensîp, mirov dikare daçeka pêkhatî “li ser” hem bi ravekê re û hem jî bêyî ravekê bi peyva “heyv” re bi kar bîne. Bo nimûne:

- Em ê (li)<sup>22</sup> serê heyvê hev bibînin.
- Em ê li ser heyvê hev bibînin.

Hevoka yekem maneya “em ê li destpêka heyvê/mehê hev bibînin” dide û gotineke normal e û behsa rewşeke ne xerîb dike. Lê “em ê li ser heyvê hev bibînin” wê maneyê dide ku qaşo em ê biçin ser gerestêrka bi navê “heyv” li wê derê hev bibînin.

Di devokên ku “heyv”ê tenê bi maneya gerestêrka esmanî û “meh”ê jî bi maneya “30 roj” bi kar tînin de, bikaranîna daçeka “li ser tenê bi ravekê re mimkin e:

- Em ê li serê mehê hev bibînin.
- \*Em ê li ser mehê hev bibînin.<sup>23</sup>

<sup>21</sup> Bidin ber tirkî “ay” ku hem wateya “heyv” (gerestêrka şevê) û hem jî maneya “meh” (30 roj) dide.

<sup>22</sup> Bikaranîna “li” li vê derê ne zerûrî ye û gelek caran nayê bikaranîn jî.

<sup>23</sup> Di zimannasiyê de \* li pêş peyvekê yan hevokêkê tê maneya wê ku ew awa peyda nabe yan jî nerêzimanî ye anku çewt e.



## 7. DAÇEKÊN BINGEHÎN

### 7.1. Pêşdaçekên bingehîn

Pêşdaçekên bingehîn di kurmancî de ev: **bi, di, ji, li, bo**. Di tabloya li jêr de em ê hevrehên wê di ziman û zaravayên lêzim de pêşkêş bikin. Hêjayî bibîranînê ye ku di van ziman û zaravayan de ev daçekên hevreh ne herdem hevwater ne. Anku tevî ku ew ji eynî rehî ne, mane û bikaranîna wan ne herdem wek hev e.

kurmancî	bi <sup>24</sup>	di	ji	li
sorani	be	de <sup>25</sup>	-	le
kurdiya başûrî	we, be	de <sup>26</sup>	je, ej <sup>27</sup>	le
hewramî	we, be	-	ce	ne
zazakî	be, ebe, ebi	de <sup>28</sup>	-	-
farisî	ba, be/bê	der, ender	ez	-
pehlewî	ped	ender	ez	-
hexamenişî	peti	ender <sup>29</sup>	heç	ena
avestayî	peiti-	-	heç <sup>30</sup>	_31

<sup>24</sup> Hêjayî gotinê ye ku hevwatera "bi" ya kurmancî di inglîzî de "by" (bixwîne: bay) lê ji aliyê etîmolojiyê ve ew ne ji eynî rehî ne. Mirov dikare etîmolojiya "bi" ya kurdî tenê heta îraniya kevn bigihîne, ji wê dûrtir etîmolojiya peyvê ne diyar e. Di makezimanê proto-hindûewropî de li cihê pêşdaçekên niha, halên navdêran dihatin bikaranîn anku dawîya navdêran bi awayên cuda dihat çemandin/tewandin (wek tirkiya niha). Loma piraniya pêşdaçekên niha yê zimanên hindûewropî bo nimûne di navbera kurdî û inglîzî yan kurdî û rûsî de ne ji eynî rehî ne.

<sup>25</sup> Tenê bi soraniya mukriyanî, di soraniya silêmanî de peyda nabe.

<sup>26</sup> Pêşdaçeka "de" tenê di hin devokên kurdiya başûrî de peyda dibe, di piraniya devokên başûrî de li cihê wê "le" li kar e.

<sup>27</sup> Tenê di çend devokên başûrî de "je, ej" li kar in, bi piraniya "le" bi vê maneyê jî bi kar tînin.

<sup>28</sup> Di zazakî de "de" tenê wek paşdaçek tê bikaranîn.

<sup>29</sup> Di heman demê de hevreh *hindir*, *hundir* ya kurmanciya navendî ye jî ku di kurmanciya rojhilatî de peyda nabe.

<sup>30</sup> Bi maneya "li pey, li dûv".

<sup>31</sup> Tevî ku ev daçek di avestayî de nayê dîtin jî, ew dîsa jî gelek kevn e û – berevajî hin daçekên din yê kurdî – hevrehên wê di gelek zimanên din jî yê hindûewropî de tê dîtin. Bi gelek zimanan ew bi forma "in" (bo nimûne latînî û inglîzî) yan jî "en" e (wek mînak bi yûnanî).

Di tabloyê me de daçeka “bo” nehatiye dan. Ew bi şiklê bû tenê di kurmcî û soranî de peyda dibe.<sup>32</sup> Mirov dibêje qey hevrehên wê di zaravayên din yên kurdî û zimanên din yên îranî de peyda nabe. Lê bi intihimaleke mezin ew wiha peyda bûye:

- bo < berew, berwe < ber be, ber bi

Ew herwiha texmînen hevrehê “berayî” ya farisî û “ro” ya zazakî ye.

Anku ji aliyê dîrokî ve “bo” ne daçekê sade û xwerû ya yekpar e lê niha êdî ew daçekeke sade tê dîtîn û loma me jî ew li vir wek daçekeke sade hesabandiyê û rêz kiriye.

### Pêşdaçekên bingehîn di devokên kurmcî de

standard	rojhilatî <sup>33</sup>	navendî	rojavayî <sup>34</sup>
<b>bi</b>	-p, -b, -f, -v, -ip, -ib, -iv	bi, b'	bi, b'
<b>di</b>	-t, -d, -it, -id	di, d'	(di, de, da)
<b>ji</b>	-ş, -j, -iş, -ij	ji, j'	(je, ja)
<b>li</b>	-l, -il, l'	l, l'	li, le

### BI

Erk û peywira bingehîn ya daçeka “bi” diyarkirina amûr, alet û hacetan e. Mirov bi wê diyar dike ka çi bi çi tê kirin anku çi bo kirina çi tê xebitandin.

- bi kêran li hev dan
- bi tirimpêlê hat
- bi kurdî

<sup>32</sup> Di kurmcîya rojhilatî û di soranî de wek “bo”, di kurmcîya navendî û rojavayî de tenê bi daçeka “ji” re wek “ji bo” (ji bona, ji boy, ji boyî).

<sup>33</sup> Di axiftina kurmcîya rojhilatî (navendên wê DIhok û Hekarî) pêşdaçek bi piranî bi peyva berî xwe ve dizeliqin: bo nimûne “ez ê-l malê bim” (ez ê li malê bim), “mi-p kêrê birî” (min bi kêrê birî). Xusûsiyeta din ya pêşdaçekên kurmcîya rojavayî ew e ku di wan de konsonantên bilerz (B, D, J) dibin bêlerz (P/F, T, Ş).

<sup>34</sup> Bikaranîna pêşdaçekan (xaseten pêşdaçeka “di” yan varyantên wê) di kurmcîya rojavayî de nادر e.

- bi baweriya te

Maneya bîngêhîn ya vê daçekê bi piranî (lê bi ti awayî ne herdem) di van zîmanan de bi van daçekan tê diyarkirin:

- inglîzî “by”, erebî “bi”, farisî “bi”, tirkî “ile, -la, -le”

Hêjayî gotinê ye ku tevî wekheviya vê daçekê di kurdî, erebî û inglîzî de, ew dîsa jî ji aliyê etîmolojî ve ne ji eynî rehî ne (*li jêrtir binêrin*) lê peyva kurdî û farisî hevreh in.

## JI

Erkê serekî yê vê daçekê ew e diyar bike ka cihê derketina yan jêhatina tiştekî yan kesekî çî ye:

- ji malê
- ji wî alî ve

Beramberî daçeka ji di hin zîmanan de bi piranî ev daçek yan (di rewşa tirkî de) ev halê rêzîmanî li kar in:

- inglîzî “from”, erebî “min”, farisî “ez”, tirkî “-dan, -den”

## LI

Ev daçek cihê mana, sekinîna, peydabûna kesekî yan tiştekî diyar dike:

- li malê
- li wê derê
- li Kurdistanê

Di kurmançiya standard de “li” tenê bi maneya cihê ku tiştek lê ye diyar dike lê ne tiştê ku tiştek tê de ye. Loma em dibêjin “li Kurdistanê” lê em bi kurmançiya giştî nabêjin “\*li kitêbê” yan “\*xwarin li qazanê ye” lê “di kitêbê de” yan “xwarin di qazanê de ye”.

Ev cihê vê daçekê bi çend zîmanên din bi piranî ev peyvik li kar in:

- inglîzî “in, at”, erebî fî, farisî “der”, tirkî “-da, -de”.

**DI**

Ev daçek bi piranî ne tenê lê li gel paşdaçeka "de" (yan "da") re tê bikaranîn. Ew maneya "filan tişt di bêvan tiştî de" diyar dike:

- di pirtûkê de
- di çanteyê wê de

Di hin zimanan de beramberî "di ... de" ev awa hene:

- inglîzî "in", erebî "fî", farisî "der", tirkî "-da, -de"

Wek ku tê dîtin, hevberên "di ... de" û "li" di van zimanan de eynî ne. Lê di kurmançî de "di ... de" û "li" bi erk û peywirên xwe bi piranî nikarin li cihê hev bîn bikaranîn.

Cudahiya "di ... de" ji daçeka "li" ew e ku di kurmançiya standard û giştî de forma "di ... de" ne bi cihan re lê bi tiştan re tê bikaranîn. Loma adeten mirov dibêje "li Kurdistanê", ne "di Kurdistanê de" tevî ku di bin tesîra hin zimanên din de mirov carinan vê formê jî dibîne.<sup>35</sup>

## 7.2. Pêşdaçekên serbixwe

Bikaranîna daçekên bingehîn bi serbixweyî anku bêyî birrên din yên peyvan bi wan ve girêdayî bin jî mimkin e. Lê hingê ne formên "bi, di, ji, li" lê awayên "pê, tê, jê, lê" tên xebitandin. Hingê Ê-ya di wan de maneya "wê / wî / wan" dide. Bo nimûne:

- bi wê / wî / wan → pê
- di wê / wî / wan → tê
- ji wê / wî / wan → jê
- li wê / wî / wan → lê

Ji aliyê wateyê ve formên bi Ê maneya "wê / wî / wan" bidin jî, ji hêla hevoknasî ve ew ne tenê cihê cînavan digirin lê dikarin cihê navdêran jî bigirin:

- bi avê → pê
- li bajarî → lê

<sup>35</sup> Binêrin hin lînkên vê derê: <https://www.google.fi/webhp?sourceid=chrome-instant&ion=1&espv=2&ie=UTF-8#q=%22di+kurdistan%C3%AA+de%22>

- di kitêban de → tê de

Ji aliyê guherîna dengê ve, ji hemûyan I dikeve û Ê lê zêde dibe. Ji aliyê lerezê ve, B û D yên bilerz di “bi, di” de dibin P û T yên bêlerz. Lê J-ya bilerz di “ji” de wek xwe dimîne û nabe hevbera xwe ya bêlerz Ş (ji > jê, ne \*şê).

Di lehceyên din jî yên kurdî de ev desteya duyem ya daçekan jî heye. Cudahiya serekî di navbera kurmançî û soranî de di vê mijarê de ew e ku di kurmançî de ev desteya daçekan bi rastî jî serbixwe tê bikaranîn anku ti tiştek bi wan ve nayê girêdan lê di soranî de desteya cînavên pêvekirî (zeliqandî, bi soranî *likaw*) bi wan re tê bikaranîn.<sup>36</sup> Hingê ew li cihê navdêrên xwerû + navdêr/cînav yên kurmançî tên şuxilandin. Bo nimûne:

soranî	kurmançî
pê-m	bi min
lê-t	li te
tê-y-da	di wê / wî de
pê-tan	bi we
lê-man	li me; ji me
bo-yan	bo wan, ji wan re, jê re

### CUDAHİYÊN ZARAVAYÎ Û DEVOKÎ DI BIKARANÎNA PÊŞDAÇEKÊN BINGEHÎN DE

Di soranî de bikaranîna “be”, di kurdiya başûrî û hewramî de bikaranîna “we” û di zazakî de xebitandina “bi”<sup>37</sup> bi piranî wek di kurmançî de ye. Anku mirov dikare bibêje ku ev daçek di hemû lehceyên kurdî de di bingeh de hevreh û hevwater ye.

Daçeka “li” wek “le” di soranî û kurdiya başûrî de û herwiha wek “ne” di hewramî de jî li kar e. Di zazakî de ti şûn û şopa wê ne diyar e. Di piraniya devokên soranî û kurdiya başûrî de ew hem bi erkê “li” ya kurmançî û hem jî bi erkê “di ... de” yan û heta bi rola “ji” ya kurmançî jî radibe.

<sup>36</sup> Bo vê desteya daçekan û girêdana wan bi cînavan ve, binêrin bo nimûne Pollet Samvelian: What Sorani Kurdish Absolute Prepositions Tell Us about Cliticization:

[http://web.stanford.edu/group/cslicpublications/cslicpublications/TLS/TLS9-2005/TLS9\\_Samvelian\\_Pollet.pdf](http://web.stanford.edu/group/cslicpublications/cslicpublications/TLS/TLS9-2005/TLS9_Samvelian_Pollet.pdf)

<sup>37</sup> Varyantên din yên vê daçekê di zazakî de: varyantên din: be, ebe, ebi, eve:

<https://zimannas.wordpress.com/2016/03/16/edat-zazaki-de/>

Gava ku ew li şûna “ji” ya kurmancî tê bikaranîn, di soranî de ew adeten (lê ne herdem) li gel paşdaçeka “-we, -ewe” tê bikaranîn:

- le małewe (li malê)<sup>38</sup>

Li cihê “di ... de” ya kurmancî, di soranî de pêşdaçeka “le” adeten wek dordaçek li gel “-da/-a” tê xebitandin:

- “le çante-da”<sup>39</sup>
- “le kitêb-a” (di kitêbê/kitêbekê/kitêban de)

Lê carinan heman dordaçek di soranî de li cihê “li” ya kurmancî jî tê bikaranîn:

- le bazar-a (li bazarê)

Li aliyekî din, hevrehên “ji” ya kurmancî yan di lehceyên din de qet peyda nabin (soranî, zazakî) yan jî tenê di çend devokên berteng yên hin lehceyan de li kar in (kurdiya başûrî). Ji bilî kurmancî, hevrehê wê tenê di hewramî de bi awayê “ci, ce” berbelav e. Wek ku li jor hat gotin, di soranî de li cihê wê dordaçeka “le ...-ewe” yan jî tenê pêşdaçeka “le” li kar e.

Heta di hin devokên kurmancî yên nêzîkî soranî de jî “ji” peyda nabe û li cihê wê jî “li” yan dordaçeka “li ...(e)ve/(e)we”:

- ez li malê ve hatim (ez ji malê hatim)

Lê ev diyarde ne tenê ji tesîra soranî ya li ser van devokên kurmancî ye. Bi heman awayî di hin devokên kurmanciya rojhilatî de jî (bo nimûne li Semsûrê / Adiyamanê) jî li cihê “ji” jî daçeka “li” tê bikaranîn.<sup>40</sup>

Li aliyekî din, hevrehê “ji” ya kurmancî di hewramî de “ce” ye ku ne tenê bi maneya “ji” lê herwiha bi wateya “li” ya kurmancî jî tê bikaranîn.

Di zazakî de li cihê pêşdaçeka “ji” ya kurmancî paşdaçeka “ra” û li cihê “li” ya kurmancî jî paşdaçeka “de” tê bikaranîn:

<sup>38</sup> Di kurmancî de jî forma “ji malê ve” anku wek dordaçek peyda dibe.

<sup>39</sup> Di nivîsîna soranî ya bi alfabeya latînî de paşdaçeka adeten bi peyva berî xwe ve tînen zeliqandin.

<sup>40</sup> Bo vê agahiyê spasdarî kek Alî Baran im.



- Seywan bi eslê xwu Mahabad *ra* yo la nika Diyarbekir *de* ciwîyeno.<sup>41</sup> (Seywan bi eslê xwe *ji* Mehabadê ye lê niha *li* Diyarbekirê dijî – kurmançîkirin ji min, H.M.)

Daçeka “di” di kurmançiya rojhilatî û navendî de berbelav e. Ew di soraniya mukriyanî de jî bi forma “de” li kar e. Di soraniya Silêmaniyê de – ku tesîreke bingehîn li ser soraniya nivîskî heye – pêşdaçeka “de” peyda nabe loma “de” di soraniya nivîskî de bi awayekî berbelav nayê dîtin. Di kurdiya başûrî de ew di çend devokan de peyda dibe, carinan bi maneya “li” lê hin caran jî bi wateya “ji” ya kurmançî.

Di zazakî de pêşdaçeka “di / de” peyda nabe lê ew wek paşdaçeka “de” li kar e. Di kurmançiya rojavayî û serhedî de jî ew wek pêşdaçek kêr li kar e (yan qet nayê bikaranîn) lê ew wek paşdaçek bi forma “de” yan “da” bi berbelavî tê bikaranîn û gelek caran cihê “li” ya kurmançiya rojhilatî û navendî jî digire.

### 7.3. Paşdaçekên bingehîn

Di kurmançî de sê paşdaçekên sade hene. Di zimanê nivîskî de ew bi piranî wek “de, re, ve” lê hin caran jî wek “da, ra, va” tên nivîsîn. Di piraniya devokan de formên serdest “da, ra, ve” ne, di hin devokan de – lê ne di piraniya wan de – jî li cihê “ve” forma “va” li kar e. Di vê vekolînê de em ê di nimûneyan de formên “de, re, ve” yên di zimanê nivîskî de serdest bi kar bînin lê em ji hebûna “da, ra, va” jî haydar in û herwiha ji nîqaşa li ser rastnivîsîna wan jî agadar in.

#### Paşdaçekên kurmançî û hevrehên wan

kurmançî	de, da	re, ra	ve, va
soranî	-da, -a	-ra	-ewe
kurdiya başûrî	-	era ...	-ew, -we
hewramî		-ere	-ewe, -o
zazakî	de, di, der	... ra, rê	o

<sup>41</sup> <http://www.zazaki.net/yazdir/haber/wesanxaney-rosna-ra-hrna-kitab-1970.htm>

farisî	der	ra, rû, -o	-
--------	-----	------------	---

Maneya paşdaçekan bi piranî bi pêşdaçekên li gel wan dordaçekan pêk tînin ve girêdayî ye û li gor pêşdaçekê diguher lê herwiha maneya pêşdaçekê jî diguherîne. Hin caran di rêzimannameyên kurdî de tê gotin ku paşdaçek wateya pêşdaçekê “xurt” dikin. Lê ev ne rast e. Bo nimûne:

- “ji min re” ne xurtkirina “ji min” e lê maneya van herduyan bi temamî berevajî hev e.

#### Paşdaçekên bingehîn di devokên kurmançî de

standard <sup>42</sup>	rojhilatî	navendî	rojavayî
de	da	da, de	de, da
re	ra	ra, re	re, ra
ve	ve	va, ve	ve, va

### 7.4. Dordaçekên bingehîn

Ji pêşdaçekên sade û paşdaçekên sade ev desteyên dordaçekan di kurmançî de peyda dibin:

	de	re	ve
<b>bi</b>	bi ... de	bi ... re	bi ... ve
<b>di</b>	di ... de	di ... re	di ... ve
<b>ji</b>	ji ... de	ji ... re	ji ... ve

Hin ji van di hemû yan piraniya devokên kurmançî de bi berfirehî li kar in (bo nimûne “di ... de” yan bi varyanta xwe ya “di ... da”). Hin jî tenê di hin devokan de tînin bikaranîn (wek mînak “di ... ve”).

<sup>42</sup> Bi nivîskî hin kes formên bi A bi kar tînin: da, ra, va.

Li vê derê em ê bikaranîna her yekê ji wan bi nimûneyan diyar bikin û herwiha wateya wan ya bîngêhîn û berbelaviya wan di devokên kurmancî de rêz bikin. Rêzkirina me dê li dûv berbelavî û mişetîya wan be.

**bi ... de, pê de** (bi inglîzî *downwards along*)

Dordaçeka “bi ... de” yan varyanta wê “bi ... da” yan jî bi forma xwe ya serbixwe “pê de” (pê da) liva ber bi pêş û jêr de diyar dike:

- bi avê de çû (ket ber avê û avê ew bi xwe re ber bi jêr de bir)
- pê de çû xwend (ji serê/destpêka nivîsekê ber bi binê/dawîya wê de xwand)

Di pratîkê de gelek caran bikaranîna “bi ... de” li gel “bi ... ve” (li jêrtir binêrin) tên têkilîkirin yan li cihê hev tên bikaranîn.

**bi ... re, pê re** (*with*)

Dordaçeka “bi ... re” yan “bi ... ra”, bi forma xwe ya serbixwe “pê re, pê ra” di kurmanciya navendî de bi maneya “li gel, tevî” tê bikaranîn:

- Ew bi min re ye (ew li gel min e, ew tevî min e)
- Em *bi* hev *re* hatin.

Dordaçeka “bi ... re” di kurmanciya rojhilatî de nayê bikaranîn û li cihê wê “li gel, di gel” li kar in. Di kurmanciya rojavayî de jî “bi ... re” yan peyda nabe yan jî kêm li kar e. Li cihê wê daçeka “tevî” heye.

**bi ... ve, pê ve** (*on, stuck/attached to*)

Dordaçeka “bi ... ve” (di hin devokan de “bi ... va”), bi forma xwe ya serbixwe “pê ve” (carinan “pê va”) maneya wê dide ku tiştek bi tiştekî ve yan bi cihêkî ve hatiye zeliqandin, lûsandin yan asêkirin:

- tablo bi dîwarî ve bû

Dordaçeka “bi ... ve” herwiha liva rastgehî / edil ya ber bi pêş ve diyar dike:

- bi rê ve çû

Di bikaranînê de hin caran “bi ... de”, “bi ... ve” û heta “bi ... re” jî tîen tevlihevkin. Di hin devokan de tenê yek yan du ji wan hene û yê din nayên bikaranîn.

**di ... de, tê de** (bi inglîzî *in, inside*)

Dordaçeka “di ... de” yan varyanta wê “di ... da” yan jî bi forma serbixwe “tê de” (tê da) berbelavtirîn dordaçeka kurmancî ye. Ew maneya hindirê yan nava tiştêkî kûr yan sergirtî dide ku tiştêkî tê de ye:

- xwarin di qazanê de dikele
- di avê de nexeniqe
- di kitêbê de gelek wêne hebûn

Ev daçek adeten cihê sabit yê tiştêkî diyar dike, ne livîna ji wî yan jî ber bi wî ve. Lê carinan ew di livîna ber bi hindirê yan nava tiştêkî jî tê xebitandin:

- ket di avê de (ket avê, ket nav avê)

Bi taybetî di kurmanciya navendî de ew di heman demê de carinan li gel peyva “hindir” (yan varyanteke wê wek “hundir, hindur...”) tê bikaranîn:

- di hindirê xanî de

**di ... re, tê re** (bi inglîzî *through, via*)

Dordaçeka “di ... re” yan varyanta wê “di ... ra” yan jî bi forma xwe ya serbixwe “tê re” (tê ra) jî di hemû yan piraniya devokên kurmancî de peyda dibe. Ew maneya derbazbûna yan derbazkirina di nav cihekî yan tiştêkî re dide:

- Em ji Dihokê *di Zaxo re* çûn Cizîrê
- Dezî *di kuna/qula derziyê re* kir

**di ... ve, tê ve** (inglîzî *in, inside*)

Dordaçeka “di ... ve” (di ... va), bi forma xwe ya serbixwe “tê ve” (tê va) maneya cihê tiştêkî di cihekî sergirtî de lê ne di tiştêkî biçûk yan teng ve dide.

- di odayê ve
- di xanî ve

Lê ne bo nimûne “\*di kitêbê ve” yan “\*di qazanê ve”.

Bikaranîna dordaçeka “di ... ve” û varyantên wê bi devokên kurmanciya rojhilatî û hin devokên sersinorî yên navbera kurmanciya rojhilatî û kurmanciya navendî ve girêdayî ye. Di piraniya devokên kurmanciya navendî de li cihê wê jî dordaçeka “di ... de” û guhartoyên wê tên bikaranîn.

### ji ... de, jê de (bi inglîzî *downwards from*)

Dordaçeka “ji ... de” yan “ji ... da”, bi forma xwe ya serbixwe “jê de” yan “jê da” maneya livîna ber bi xwarê yan jêr de yan jî ji cihekî bilindtir ber bi cihekî nizmtir de:

- ji çiya de hat (ji serê çiya ber bi binê çiya de hat)

Cudahiya wê ya bingehîn ji dordaçeka “bi ... de” ew e ku “bi ... de” tê maneya “li gel tiştê bi jêr de livîn” lê “ji ... de” maneya hevrêtî û bihevrelivînê nade, tenê maneya livîna ber bi jêr de diyar dike.

Di kurmanciya navendî û rojavayî de gelek caran “ji ... de” li cihê “ji ... ve” tê bikaranîn anku livîna ji cihekî ve bêyî ku liv illeh ber bi jêr de be. Bo nimûne:

- *ji aliyê me wî de* hatiye nivîsîn (rasttir: *ji aliyê wî ve*)

### ji ... re (bi inglîzî *for, to*)

Dordaçeka “ji ... re” yan “ji ... ra”, bi forma xwe ya serbixwe “jê re” yan “jê ra” bi berfirehî di kurmanciya navendî de bi maneya “bo, ji bo” tê bikaranîn. Di kurmanciya rojhilatî de ew qet peyda nabe û li cihê wê yan “bo” (di kêm devokan de “jo”) yan jî daçeka paşlêker “-e” tê xebitandin:

kurmanciya navendî	kurmanciya rojhilatî
diyariyek ji te re	diyariyek bo te
ji min re got	gote min

**ji ve, jê ve** (inglîzî *from the direction of*)

Dordaçeka “ji ... ve” (di kêma devokan de “ji ... va”), bi forma xwe ya serbixwe “jê ve” (yan “jê va”) maneya aliyê ku tiştê jê tê dide. Liv dikare li rastgehê be yan jî ber bi jor ve be lê ne ber bi jêr de (di diyarkirina liva ber bi jêr de hingê “ji ... de” forma bikêrhatî ye):

- ji malê ve (ji malê yan ji aliyê ku malê lê ye)

Dordaçeka “ji ... ve” yan varyanteke wê hem di kurmanciya rojhilatî û hem jî di kurmanciya navendî de peyda dibe lê bikaranîna wê zêdetir di kurmanciya rojhilatî de sistematîkî ve; kurmanciya navendî gelek caran “ji ... de” yan varyanteke wê li cihê “ji ... ve” jî bi kar tîne.

**Dordaçek ji pêşdaçekên “bo” û “li”?**

Di kurmanciya giştî de dordaçek tenê bi alîkariya pêşdaçekên “bi, di, ji” tên çêkirin û pêşdaçekên “bo, li” di beşdarî sazkirina dordaçekan nabin. Bi gotineke din, dordaçekên wek “bo ... de, bo ... re, bo ... ve” yan “li ... de, li ... re, li ... ve” di piraniya devokên kurmancî de peyda nabin.

Bi qasî ku em haydar in, dordaçekên “\*bo ... de, bo ... ve” bi rastî jî qet di kurmancî de peyda nabin. Ehmedê Xanî di Mem û Zînê de bi kêma carekê dordaçeka “bo ... re” (bi forma “ji bo ... ra”) bi kar aniyê:

Bextê me ji *bo me ra* bibit yar

Carek bibitin ji *xwabê hişyar*<sup>43</sup>

Ne diyar e ka ev form bi rastî carekê di kurmancî de hebûye yan jî Xanî ew bi armanca temamkirina qafiyê ji ba xwe ve çêkiriye yan pêşdaçeka pêkhatî “ji bo” û dordaçeka “ji ... ra” têkil kirine û dordaçeka “ji bo ... ra” jê saz kiriye. Tiştê diyar ew e ku niha di kurmancî de dordaçeka “bo ... re” yan “ji bo ... re” peyda nabe.

Dordaçeka *li ... de* yan hê jî zêdetir bi varyanta xwe ya *li ... da* di hin devokên kurmanciya rojhilatî yê nêzîkî soranî de li şûna “di ... de” (di ... da) ya kurmanciya giştî tê bikaranîn:

<sup>43</sup> Bi kurmanciya niha “Bextê me ji me re bibe yar, carekê ew ji xewê bibe hişyar.” Binêrin bo nimûne: <https://kurdistanamin.wordpress.com/62/>

- li kitêbê da<sup>44</sup>

Heman dordaçek di soranî de jî bi awayê “le ...-da” yan jî bi forma xwe ya sivikkirî “le ...-a” li kar e:

- le kitêb-da, le kitêb-a

Di heman devokên kurmançî de li cihê jêderî “ji” jî herwiha daçeka cihê “li” tê bikaranîn. Loma ji daçeka “li” jî dordaçeka “li ... ve” bi maneya “ji ... ve” û dordaçeka “li ... da” bi wateya “ji ... de” jî di van devokan de li kar in:

- li malê ve hat (ji malê ve hat)
- li çiyay da hate xarê (ji çiyayî de hat xwarê)

Di soranî de herwiha dordaçeka “le ...-ewe” heye ku hem li cihê dordaçeka “ji ... ve” û hem jî li cihê daçeka xwerû “ji” jî yê kurmançî tê emilandin.

## 7.5. Tesîra analojîyê li ser şikilgirtina daçekên kurdî yê bingehîn

Di zimannasîyê de, bi taybetî di dengnasîyê de, mebest ji *analojîyê* anku *wekhevîkirinê* ew e ku hin peyvên bi maneya xwe yan jî karê xwe wek hev, nêzîkî hev dibin. Ev nêzîkbûna wan hin caran dijî qeyd û bendên giştî yê dengnasî ye. Anku eger mirov li gor qeyd û bendên giştî yê dengnasî biçe, hingê guherîna ku di wan çêbûne nikarin li gor rêbazên guherîna dangan bîn şirovekirin yan jî li gor rêbazên dîroka dangan awarte û istisna ne.

Pêşdaçekên bingehîn yê kurmançî *bi*, *di*, *ji*, *li* pir dişibin hev:

- di her yekê ji wan de du herf yan deng hene
- li dawîya her yekê ji wan dengê “i” peyda dibe

---

<sup>44</sup> Kêm be jî, carinan dordaçeka “li ... da” bi nivîskî jê tê dîtin. Yek ji kesên ku wê bi sistematîkî li şûna “di ... de” û heta li cihê daçeka xwerû “li” jî bi kar tîne, nivîskar Perwîz Cîhanî ye. Bo nimûne: “Ez pir şad im ku vê gavê *li* xizmeta heweyên rêzdar *da* me... Lê muxabin *li* vê tîpguhêzîyê *da* bi dehan û sedan şaşîyên zeq ketine nav deqa berhemên seydayî da... *li* gelek cîyan *da* qafîye têkdane...” Ji: [http://www.avestakurd.net/arshiv/V1/author\\_article\\_detail.php?article\\_id=811](http://www.avestakurd.net/arshiv/V1/author_article_detail.php?article_id=811)

Di soranî de li cihê “i” ya kurmancî “e” di van daçekan de heye. Lê dîsa jî ew heman deng di hemûyan de dubare dibe<sup>45</sup>:

- be, de, le

Formên serbixwe (yên ku navdêr li pey nînin) yên van daçekên kurmancî û soranî jî dîsa pir dişibin hev. Bi kurmancî:

- jê, lê, pê, tê

Lê eger em li etîmolojî û tarîxa van daçekên kurmancî û soranî binêrin, em ê bibînin ku di eslê xwe de ev daçek ne wiha mîna hev bûn.<sup>46</sup>

kurmancî	bi <sup>47</sup>	di	ji	li
soranî	be	de <sup>48</sup>	-	le
hewramî	we	-	ce	ne
farisî	ba, be/bê	der, ender	ez	-
pehlewî	ped	ender	ez	-
hexamenişî	peti	ender <sup>49</sup>	heç	ena
avestayî	peiti-	-	heç <sup>50</sup>	_51

<sup>45</sup> Di soranî de \*”je” (hevwatera ”ji” ya kurmancî) peyda nabe û herwiha ”de” (“di”) jî tenê di soraniya Mukriyan de heye, ew di soraniya Silêmaniyê de – ku tesîreke mezin li ser soraniya nivîskî heye – peyda nabe. Loma mirov di nivîsên soranî de ji van her çar daçekan axlebe tenê “be, le” dibîne. Li cihê “ji” ya kurmancî, di soranî de pêşdaçeka “le” li gel paşdaçeka “-ewe” tê bikaranîn: *le mal-ewe* (ji malê, ji malê ve).

<sup>46</sup> Eger malik vala be, axlebe ji wê ye ku hevrehê wê daçeka kurdî di wî zimanî yan wî zaravayî de nehatiye qeydkirin yan jî bi kêrî haya min jê nîne.

<sup>47</sup> Hêjayî gotinê ye ku hevwatera ”bi” ya kurmancî di inglîzî de “by” (bixwîne: bay) lê ji aliyê etîmolojîyê ve ew ne ji eynî rehî ne. Mirov dikare etîmolojîya “bi” ya kurdî tenê heta îraniya kevn bigihîne, ji wê dûrtir etîmolojîya peyvê ne diyar e. Di makezimanê proto-hindûewropî de li cihê pêşdaçekên niha, halên navdêran dihatin bikaranîn anku dawîya navdêran bi awayên cuda dihat çemandin/tewandin (wek tirkiya niha). Loma piraniya pêşdaçekên niha yên zimanên hindûewropî bo nimûne di navbera kurdî û inglîzî yan kurdî û rûsî de ne ji eynî rehî ne.

<sup>48</sup> Tenê bi soraniya mukriyanî, di soraniya silêmanî de peyda nabe.

<sup>49</sup> Di heman demê de hevrehê *hindir*, *hundir* ya kurmanciya navendî ye jî ku di kurmanciya rojhilatî de peyda nabe.

<sup>50</sup> Bi maneya “li pey, li dûv”.

<sup>51</sup> Tevî ku ev daçek di avestayî de nayê dîtin jî, ew dîsa jî gelek kevn e û – berevajî hin daçekên din yên kurdî – hevrehên wê di gelek zimanên din jî yên hindûewropî de tê dîtin. Bi gelek zimanan ew bi forma ”in” (bo nimûne latînî û inglîzî) yan jî ”en” e (wek mînak bi yûnanî).



Dema ku mirov van daçekên kurdî (di nimûneyên me de kurmancî, soranî û hewramî<sup>52</sup>) dide ber hevrehên wan yên bi zimanên din yên îranî, mirov dibîne ku di kurdî de ew pirr dişibin hev: tenê dengê destpêkê cuda ye. Lê gava ku mirov li heman peyvan bi zimanên din yên îranî dinêre, mirov dibîne ku ew bi dengên xwe ne wisa nêzîkî hev in. Guherîna van peyvan û nêzîkbûna wan di kurdî de li gor qeyd û bendên giştî yên dengnasiyê ne mimkin e ku werin şirovekirin. Bo nimûne, di ti peyvên din de “ender” nabe “di”. Guherîna van daçekan û qalibgirtina wan ya niha di kurdî de tenê bi alîkariya analojîyê gengaz û pêkan e anku mimkin e. *Bi, di, ji, li* nêzîk hev bûne ji ber ku ew ji aliyê rêzimanî ve bi heman erk û wezîfeyê radibin (hemû daçek in û hemû tên pêşîya navdêran) tevî ku maneya wan ji hev cuda ye jî.

Lê pêşdaçeka *bo* (ji *bo*, ji *bona*, ji *boyî*) wisa neguheriye. Wek ku li jor jî hatiye gotin, analojî tişteki nepayî ye: dikare biqewime lê dibe ku çênebe jî. Yek ji sebebên serekî ku çima dengê O di pêşdaçeka “*bo*” de wek di paşdaçekên din de nebûye “*i*” (di soranî de jî nebûye “*e*”) ihtimalen ew e ku hingê ew dê bi pêşdaçeka “*bi*” re bûbûya yek. Kurdî xwastiye rê li ber vê yekbûna du daçekan bigire. Lê li aliyekî din, hevrehên daçekên farisî *ba* (pê re) û *be/bê* (bi) jî herdu di kurdî de bûne yek (bi kurmancî *bi*, bi soranî *be*).

Sebebekî din jî dikare ew *be* ku *bo* di rastiye de di kurdî de ne bi qasî “*bi, di, ji, li*” pêşdaçekeke serekî û bingehîn e. Di kurmanciya navendî û rojavayî de ew wek daçekeke bi serê xwe nayê xebitandin. Ew di van komdevokan de herdem bi *ji* re ye: *ji bo* (li gel alternatîvên devokî *ji bona, ji boy, ji boyî*). Di kurmanciya rojhilatî de û herwiha di soranî de jî *bo* bi tena serê xwe li şûna “*ji bo*” ya kurmanciya navendî û herwiha bi maneya “*jê re, ji ... re*” ya kurmanciya navendî jî li kar e. Lê wisa diyar e ku di soranî de jî bi kêmî di hin devokan de demekê ew bi forma “*le bo*” jî hebûye ji ber ku di soraniya Hewlêrê de wê şiklê “*lo*” (kurtkirina “*le bo*”) wergirtiye. Di hin devokên kurmancî de jî “*ji bo*” wek “*jo*” tê kurtkirin.<sup>53</sup>

<sup>52</sup> Nimûne ji zazakî li vê derê nehatine rêzkirin ji ber ku zazakî li cihê pêşdaçekên kurmancî axlebe paşdaçekan bi kar tîne. Li gor qenaeta min, ev ji tesîra ermenî ye û vê dawiyê jî ev tendens li ber tesîra tirkî hatiye xurtkirin.

<sup>53</sup> “*Jo*” bo nimûne di nav eşîra Çonikiyan de ku ser bi eşîra Sindiyan e û li Zaxoyê dijîn li kar e. Lê zêdetir ev form ji devê pîrejîn û pîremêrên wan tê bihîstin - di devê xortan de “*bo*”, ya li derdorê berbelavtir, serdest e.

Ne hindî pêşdaçekan be jî, tesîra analojîyê di kurdî de herwiha li ser paşdaçekan jî diyar e. Di kurmanciya nivîskî de ev her sê paşdaçek serdest in:<sup>54</sup>

- de (wek “tê de, di ... de”)
- re (wek “tê re, di ... re, pê re, bi ... re, jê re, ji ... re”)
- ve (wek “pê ve, di ... ve, jê ve, ji ... ve, di ... ve<sup>55</sup>”)

Wek ku tê dîtîn, vê carê jî ew bi du awayan wek hev in:

- di her yekê ji wan de tenê du deng/herf hene
- li dawîya hemûyan dengê “e” heye

Lê gava ku mirov li tarîxa van paşdaçekan dinêre, mirov dibîne ku her yek ji wan ji peyveke cuda hatiye û nêzîk hev bûne:<sup>56</sup>

kurmancî	de / da	re / ra	ve / va
soranî	da / -a	ra <sup>57</sup>	-ewe
farisî	der <sup>58</sup> , ender	ra <sup>59</sup>	-
pehlewî	ender	ray <sup>60</sup>	-
hexamenişî	ender	radi <sup>61</sup>	epe
avestayî	-	-	epe

<sup>54</sup> Berevajî kurmanciya nivîskî, di piraniya devokan de formên “da, ra, ve” serdest in. Di hin devokan de jî li cihê “ve” forma “va” heye. Lê di rewşa devokan de jî dîsa yan her sê yan jî bi kêmî du ji van daçekan bi du awayan wek hev in: di her yekê de du deng hene û di hemûyan de yan jî di du ji wan de “a” li dawîya peyvê heye.

<sup>55</sup> Ji bilî kurmanciya rojhilatî, di devokên din yê kurmancî de “tê ve, di ... ve” yan nadir e yan jî hema qet peyda nabe.

<sup>56</sup> Eger malik vala be, bi ihtimaleke mezin hevrehê vê peyva kurmancî di wî zimanî de nehatiye qeydkirin. Bi ihtimaleke biçûktir mimkin e ku ew hatibe qeydkirin lê haya min jê tine be.

<sup>57</sup> Di soraniya mukriyanî de heye, di ya Silêmaniyê de peyda nabe yan nadir e.

<sup>58</sup> Di farisî de ne paşdaçek e lê pêşdaçek e (wek “di” ya kurmancî yan “de” ya soraniya mukriyanî).

<sup>59</sup> Wezîfe û maneya vê paşdaçekê ji ya kurdî cuda ye lê eslê peyvê eynî ye.

<sup>60</sup> Di pehlewî de “ray” maneya “jê re, ji bo, bo” dide. Bide ber “era” (bo, ji bo, jê re) ya kurdiya başûrî.

<sup>61</sup> Maneya “radi” di hexamenişî de “ji ber, ji bo, seba, sera, ji sebebê ku” ye.

Em bi zelalî dibînin ku paşdaçekên me ji şiklên cuda û dûrî hev hatine û nêzîk bûne heta ku dawiyê ferqkirina wan tenê bi xêra dengê / herfekê ye. Bi kurtî: tesîr û karîgeriya analojîyê li ser daçekan diyar e.

## 8. DAÇEK JI NAVDÊR Û HOKERAN

Hejmara daçekên bingehîn di kurdî û zimanên din yê îranî de bisinor e. Ji bilî wan, hejmareke daçekên din jî hene ku bi eslê xwe ji navdêr in. Di hin rewşan de ew wek navdêr û bi hemû taybetmendiyên navdêran tên bikaranîn lê carinan jî ew bi wek daçekan tev digerin û dixebitin.

Gelek ji wan – lê ne hemû – bi eslê xwe navên beşên leşî ne. Bo nimûne:

peyv	bikaranîn wek navdêr	bikaranîn wek daçek
ser	serê min	danî ser maseyê
ber	berê xwe da min	ket ber avê
kêlek	kêleka min têşe	were rûne kêleka min
tenişt	teniştta min têşe	were rûne teniştta min
bin	binê behrê	ket bin avê
pey, pê	piyên min	ket pey wê
dû, dûv	dûva wê	da dû(v) wê
pişt	piştta wî dixure	çû pişt xanî
pêş		da pêş me û bi rê ket
paş		çûn paş yê din
dev <sup>62</sup>	devê wî	çû dev wî
nik <sup>63</sup>		çû nik wê
ba <sup>64</sup>		were ba min

<sup>62</sup> Wek daçek "dev" maneya "cem, nik, ba, rex, alî, hêl" dide.

<sup>63</sup> Wek daçek "nik" maneya "cem, ba, rex, alî, hêl" dide. Ji aliyê etîmolojî ve "nik" ihtimalen ji peyva "nêzîk" hatiye kurtkirin anku eslê wê ne navdêr lê rengdêr e.

<sup>64</sup> Wek daçek "ba" ne ji peyva "ba" (hewa) ye lê hevrehê "ba" (pê re, li gel) ya farisî ye yan jî erebî "bal" (alî, rex, hêl) e.

gel <sup>65</sup>	gelê kurd	hat gel me
-------------------	-----------	------------

Ev daçekên bi eslê xwe navdêr hem bêyî daçekên bingehîn tên bikaranîn (wek di nimûneyên li jor de) û hem jî bi taybetî bi daçekên bingehîn re û bi wan re daçekên aloz anku pêkhatî saz dikin (li jêrtir li beşa "daçekên aloz" binêrin)

## 9. DAÇEKÊN WERGIRTÎ

Daçek hin peyvên bingehîn yê zimanî ne loma piraniya wan ji mêj ve di zimanî de hene û piraniya wan ji ber heman sebebê herwiha xwemalî ne, wek mîras ji zemanên kevn yê zimanî mane. Lê dîsa jî di kurdî û di gelek zimanên din de jî hejmareke ne kêr ya daçekan bi eslê xwe biyanî ne.

Kurdî hin daçek bi kêrî ji erebî, farisî, tirkî û ermenî wergirtine. Herwiha di kurdî de hin daçekên durehî hene anku du beşên wan ji du rehên cuda ne. Carinan beşek xwemalî û yek biyanî ye lê carinan jî herdu beş jî bi eslê xwe biyanî ne lê her beşek jê ji zimanekî cuda ye.

Li vê derê emê hewl bidin daçekên wergirtî li gor zimanên jêder wan rêz bikin.

### Ji erebî

Çawa ku kurdî herî zêde peyvên biyanî ji erebî wergirtine, wisa piraniya daçekên wergirtî jî di kurdî de bi eslê xwe ji erebî ne. Mirov dikare hin wan wiha rêz bike:

daçek	wateya wê bi inglîzî	berbelaviya wê di kurdî de
<b>dor</b>	around	di piraniya devokên kurdî de
<b>heta, hetanî, heya, heyani</b>	until	yek yan çend formên wê di hemû lehceyên kurdî de
<b>cem</b>	at one's place, with	kurmanciya navendî û rojavayî lê ne rojhilatî
<b>xeyrî, xeynî, xêrî, xênî</b>	apart from	yek yan zêdetir varyant di hemû devokên kurmançî de

<sup>65</sup> Maneya eslî ya peyva "gel" kom e anku çend kesên yan tiştên bi hev re.

<b>(ji) bilî</b>	apart from	kurmanciya rojhilatî û geh-geh kurmanciya navendî
<b>miqabilî</b>	opposite to	hemû kurdî
<b>zidî</b>	against	hemû kurdî
<b>ruxmî, rexmî</b>	despite, in spite of	hem di zimanê nivîskî û hem jî bi taybetî di axiftinê de nadir e
<b>badê</b>	after	di zazakî de

Hêjayî gotinê ku lîsteya li jor ne tamam e lê mirov nikare bibêje ku lîste gelek ji vê dirêjtir e jî: daçekên ji erebî wergirtî ne tenê du-sê lib in lê ne lîsteyeke bêsinor û vekirî ye jî.

### Ji tirkî

Daçeka esil-tirkî ya berbelav di kurdiya nivîskî de "(li) gorî" û varyantên wê ne: li gor, li gora, angorî, anegorî. Bi şêweyê "be gwêrey..." ew herwiha ketiye soranî jî.

Dîsa "(ji/li) orta..." (li nava...) jî ji tirkî ye û ji bilî zazakî wek "ortê de, wertê da..." ketiye zazakî jî. Di kurmancî de li her derê neyê bikaranîn jî, ne tenê li Bakurê Kurdistanê bisinorkirî ye lê gihîştîye nav kurdên Sovyeta Berê jî û di berhemên wan yên nivîskî de jî tê dîtin.

Daçeka "qarşiyê..." (dijî, zidî) hem ketiye devokên kurmancî û hem jî yên zazakî. Ew carinan di nivîsînê de jî di berhemên kurdî de tê dîtin.

Daçeka "(le) ara-da" (li holê, li meydanê) ya soranî jî bi eslê xwe ji tirkî, azerî yan tirkmenî ye lê ew di kurmancî de nayê bikaranîn yan pir kêm tê bikaranîn.

### Ji farisî

Ji ber nêzîkiya kurdî û farisî, herdem ne mimkin e mirov bibêje ka daçek (yan peyveke din) di wan de hevpar e ji ber ku wek mîras ji herduyan re maye yan jî ji ber ku yekî ji wan ji ya din wergirtiye. Lê dîsa jî çend daçek hene ku guman jê nîne ku vê dawiyê ji farisî ketine kurdî.

Pêşdaçeka “der” di farisî de hevwatera dordaçeka “di ... de, tê de” ya kurmancî ye. Ew hem serbixwe û hem jî wek beşek ji çend daçekên pêkhatî vê dawiyê ketiye kurdî (adeten pêşî soranî û paşî yekser yan jî bi rêya soranî cihê ji xwe re di kurmancî de jî peyda kiriye):

- derbare, derbarê, derbareyî...

Carinan “derbare” herwiha bi pêşdaçeka “di”, bi paşdaçeka “de” yan jî bi dordaçeka “di ... de” ya xwemalî ya kurmancî re jî tê dîtîn û bihîstin:

- di derbarê...
- derbarê ... de
- di derbarê ... de

Daçeka “der” ya farisî herwiha wek daçekeke serbixwe jî di gotinên wek “sed der sed” (100 %, sed ji sed, sed li ser sedê...) û “pey der pey” (li pey hev, li dûv hev) de tê dîtîn. Ew herwiha gelek caran di helbestên kurdî de (xaseten di klasîkan de) li cihê “di ... de” yan “di ... ve” yê kurmancî de hatiye bikaranîn.<sup>66</sup>

Herwiha daçeka “(bi) say(a)...” (bi xêra, ji dewleyî serê...), bi soranî “le sayey...” jî ji farisî ye. Ew bi piranî tenê di zimanê nivîskî de tê bikaranîn.

### Ji ermenî

Bi kêrî daçeka “het” ya zazakî bi eslê xwe ji ermenî ye. Di ermenî de ew pasdaçek e, di zazakî de hem wek paşdaçek û hem jî wek pêşdaçek li kar e:

- ma het (li ba me, li cem me)
- hetê ma de (li aliyê me, li hêla me)

### Durehî

Çend daçekên pêkhatî yê kurdî bi eslê xwe durehî ne anku beşên wan ji zimanên cuda ne. Carinan beşek xwemalî û yek biyanî ye. Adeten beşa biyanî ji erebî ye. Bo nimûne:

---

<sup>66</sup> Bo nimûne Cigerxwîn di helbesta xwe “Ji ber derdê ewan” (1945) de wiha dibêje: “Her yek bi hezar rengî dixwin vî miletê dîl / Lê ew bi xwe der bircên belek, xan û sera ne.”

- ji bilî (“ji” ji kurdî, “bilî” ji erebî)
- dewrûber / dorûber (“dewr / dor” ji erebî, “ber” ji kurdî)
- navbeyn, mabeyn, navbên, mabên (“nav-“ yan “ma-“ ji kurdî/îranî, “beyn / bên” ji erebî)
- ji xeynî/xeynî/xêrî/xêynî (“ji” ji kurdî, yên din ji erebî)
- xêncî (“xên < xeyr” ji erebî û “-cî < ji” ji kurdî)
- li gorî (“li” ji kurdî, “gorî” ji tirkî “göre”)

Wek ku tê dîtîn, carinan beşa xwemalî li destpêkê ye lê carinan jî beşa biyanî.

Carinan herdu beş jî bi eslê xwe biyanî ne lê her beşek jê ji zimanekî cuda ye. Bo nimûne:

- derheq (“der” ji farisî, “heq” ji erebî – peyv bi xwe di farisî de hatiye pêkanîn û jê derbazî kurdî bûye)

Ev nimûneya dawiyê anku “derheq” dikare di kurdî de xwerû were bikaranîn lê adeten ew bi alîkariya raveka “-ê” (“derheqê filan tiştî”) de tê bikaranîn. Herwiha pêşdaçeka “di”, paşdaçeka “de” û “dordaçeka “di ... de” jî dikarin bi wê re werin xebitandin:

- derheq wan çi got?
- derheqê wan çi got?
- di derheqê wan çi got?
- derheqê wan de çi got?
- di derheqê wan de çi got?

### **Gelo daçekên xwerû jî pir-rehî ne?**

Gelo têkiliya daçekên kurdî li gel daçekên zimanên cîran çi ye? Wekhevîtiya çendîn daçekên kurdî, erebî û tirkî mirovî mat û ecêbgirtî dike.

Di kurdî û erebî de “bi” hevwaterê û teqrîben hevdeng in (i-ya peyva kurdî piçekê ji ya peyva erebî kurttir e). Paşdaçekên kurmancî û zazakî “de, da” (wek “tê de, tê da”) hevdeng û hevwaterê “-de, -da”) yên tirkî ne.

Heta paşdaçeka kurdî “re, ra” (bo nimûne di dordaçeka “pê re, pê ra” anku “li gel”) de jî dişibe “ile” (pê re, li gel) ya tirkî eger em bînin bîra xwe ku di kurdî de L/R dikarin bi hev biguherin û herwiha di zimanên îranî yên nû de vokalên kurt ji destpêka peyvên du- yan pirkîteyî neketine.

Dîsa “li” ya kurmançî û hevwatera wê ya soranî “le” pir dişibin “-le, -la” yê tirkî lê ji aliyê waterî ve jê cuda ne: “-le, -la” ya tirkî bi piranî hevwatera “bi” ya kurmançî ye. Heman “li” ya kurmançî û “le” ya soranî heta ji aliyê dengî ve û ji hêla waterî ve jî nêzîkî ‘*ela* (li ser) ya erebî ne.

Gelo ev daçek ne hevreh in anku ne ji eynî rehî ne? Gelo zimanekî ew ji yê din wergirtine?

Adeten dijwar e ku mirov bibêje ka peyvên kurt yê yekkîteyî bi rastî hevreh in yan jî bi tesadîfî wek hev in. Di rewşa daçekên kurdî de hevrehên wan di zimanên din jî yê îranî yê nû, navîn û kevn de peyda dibin loma mirov dikare teqrîben bi esehî bibêje ku kurdî ew ne ji erebî yan tirkî wergirtine.

Li aliyê din, mirov dikare bi heman esehîtiyê bibêje ku erebî û tirkî jî ew ne ji kurdî wergirtine ji ber ku di zimanên lêzimî wan de jî herehên van daçekan peyda dibin. Bi gotineke din, wekhevîtiya van daçekan di kurdî û zimanên cîran de bi eslê xwe divê tesadîfî be.

Lê tevî ku eslê wan ji hev cuda be jî, dîsa ji ber hebûna daçekên (teqrîben) hevdeng yê (teqrîben) hevwatera bi ihtimaleke mezin pozisyona van daçekan di kurdî de xurt kiriye. Bo nimûne, paşdaçeka “de, da” di kurmançî û bi taybetî jî di zazakî de cihekî gelek xurt heye ji ber ku kurmançî û xaseten jî zazakî ji aliyê cografî û tesîrî ve nêzîkî tirkî ne. Pozisyona hevwatera vê paşdaçekê ya soranî “-da, -a” di soranî de ne wisa bihêz e. Di kurdiya başûrî de û di farisî de ew qet wek paşdaçek peyda nabe û wek pêşdaçek bi şiklê “de” tenê di hin devokên kurdiya başûrî de maye û di farisî de jî tenê wek pêşdaçek (lê ne wek paşdaçek) bi şiklê “der” maye.<sup>67</sup>

## 10. DAÇEKÊN ALOZ

Mebest ji daçekên aloz (*complex adpositions*) ew daçek in ku ji daçeke bingehîn û yek yan çend peyvên din pêk tînin. Daçekên aloz dikarin li ser sê beşan bînin parvekirin:

- pêşdaçekên aloz
- paşdaçekên aloz
- dordaqçekên aloz

<sup>67</sup> Bo ketina R ji dawiya peyvên di kurdî de, bidin ber “îcar > îca” yan “vê carê > vêca”.



## 10.1 PÊŞDAÇEKÊN ALOZ

Di kurdî de pêşdaçekên aloz (*complex prepositions*) adeten ji daçeke bingehîn û peyveke din pêk tên.

Bo nimûne:

- li ser, ji bin, bi xêra...

Wek ku tê dîtin, beşa yekem adeten da\_çekeke bingehîn e û beşa duyem peyvek e ku bi eslê xwe navdêr (*ism, noun*) e.

Lê hin pêşdaçekên aloz hene ku tê de daçeka bingehîn ne li destpêkê lê li dawiyê ye. Di kurmanciya giştî de ev nimûne ber belav e:

- ber bi...

Ji soranî mirov dikare van nimûneyan bide:

- dij be (dijî), sebarete be (derbarê, derheqê)

Ji kurmanciya devokî mirov dikare herwiha vê jî lê zêde bike:

- xêncî (ji "xên < xeyn < xeyr" + "jî")

## 10.2. PAŞDAÇEKÊN ALOZ

Paşdaçekên aloz dikarin ji paşdaçekeke bingehîn û peyveke din pêk bên. Paşdaçeka bingehîn li dawiyê ye û peyva din berî wê tê. Wek paşdaçekan bi giştî jî, bikaranîna paşdaçekên aloz jî bêyî pêşdaçekan di kurmanciya giştî û nivîskî de nادر e lê di gelek devokan de peyda dibe:

- niha *şûn-de / şûn-ve / şûn-da / şûn-va* (ji niha pê ve)

Paşdaçekên aloz dikarin herwiha ji daçekeke serbixwe (jê, lê, pê, tê) û paşdaçeke bingehîn pêk bên.

Bo nimûne:

- niha *pê ve*

## 10.3. DORDAÇEKÊN ALOZ

Hin dordaçekên aloz dikarin ji pêşdaçekeke aloz û paşdaçekeke bingehîn pêk hatine. Bo nimûne:

- **ber bi ... ve:** *ber bi malê ve çû, ber bi bajarê ve.*
- **di ser ... re:** *pir di ser avê re derbaz dibin, balafir di ser serê me re firîn.*

Hin dordaçekên aloz jî ji pêşdaçekeke bingehîn + daçekeke serbixwe û paşdaçekeke bingehîn pêk bînin. Bo nimûne:

- **ji ... pê ve:** *ji îro pê ve, ji niha pê ve.*

Herwiha dordaçekên aloz dikarin ji pêşdaçekeke bingehîn + paşdaçekeke nebingehîn + paşdaçekeke bingehîn jî pêk hatibin:

- **ji ... şûn de:** *ji niha şûn de, ji hingê şûn de*

## 11. KOMIKÊN DAÇEKÎ

Li jor hatiye diyarkirin ka daçek dikarin li gel kîjan birrên peyvan peyda bibin. Di komikên daçekî de ne tenê birreke din lê di heman demê de çendîn bir bi hev e di eynî demê de jî peyda bibin. Bo diyarkirina imkanên berfirehbûna komikên daçekî, mirov dikare nimûneyeke wiha bide ku tê de dordaçeka “di ... de” tê de ji hev vedikişê û peyv dikarin di navbera wan de zêde bibin:

- di kitêbê de
- di kitêbekê de
- di kitêba min de
- di kitêbeke min de
- di kitêba min a mezin de
- di kitêbeke min a mezin de
- di vê kitêba min a mezin de
- di vê kitêba min a mezin a li ser maseyê de
- di vê kitêba min a mezin a li ser maseyê ya bi kurdî de
- di vê kitêba min a mezin a bi kurdî ya ku min daniye ser maseyê de
- ...

Di heman hevokê de du yan zêdetir komikên daçekî dikarin **li pey hev** jî peyda bibin. Bo nimûne:

- “ji îro heta sibê” ku ji du komikên pêşdaçekî pêk hatiye
  - ji îro
  - heta sibê
- “li jor di beşa ... de” ku ji komikeke pêşdaçekî û komikeke dordaçekî pêk hatiye:
  - pêşdaçek: “li jor”
  - dordaçek: “di beşa ... de”
- “ji vir pêş-ve” ku ji komikeke pêşdaçekî û komikeke paşdaçekî pêk hatiye
  - pêşdaçek: “ji vir”
  - paşdaçek: pêş-ve

**Komikeke daçekî dikare di komikeke din a daçekî de** be. Bo nimûne:

- “di rojnameya li ser maseyê de” ku tê de komika “li ser maseyê” di komika daçekî ya “di rojanmeyê de” ye

Hin caran bi teorîkî mimkin e ku di komikên di hev de heman dordaçek li pey hev dubare bibe:

- di rojnameya [di destê min de] de

Lê di rewşên wiha de heman paşdaçek di pratîkê de nayê dubarekirin loma bo nimûne:

- di rojnameya ... *de* + di destê min *de* → di rojnameya di destê min *de* (ne “\*di rojnameya di destê min *de de*”)

Anku tenê de-yek tê bikaranîn.

Eger paşdaçek ne eynî bin, herdu dikarin li pey hev peyda bibin. Bo nimûne:

- di kitêba ... *de* + bi min *re* → di kitêba bi min *re de*

## 12. DAÇEK Û PEYVRÊZÎ

Di hevokên daçekdar de adeten komika daçekî li pey kirdeyê û berî lêkerê tê:

- Ez *li malê* bûm.

Eger hokereke demkî jî di hevokê de hebe, hingê ew adeten dikeve navbera kirdeyê û komika daçekî:

- Ez *hingê* li malê bûm.

Eger di hevokê de berkara / biresera yekser hebe, ew dikare berî yan jî piştî komika daçekî be:

- Ez *şîvê* li malê dixwim.
- Ez li malê *şîvê* dixwim.

Li gor peyvîziya kurmancî, adeten raveber berî ravekerê tê:

- kitêba kevn (“kitêb” raveber e anku tê ravekirin û “kevn” jî raveker e anku diyar dike ka kitêb çawa ye)
- birayê min (“bira” raveber anku tê şirovekirin û “-yê min” jî raveker e anku diyar dike ka bira yê kê ye)

Di peyvîziya kurmancî ya eslî de komikên daçekî yên raveker jî li pey peyva yan komika raveber tên.

Bo nimûne:

- kurd di dîrokê de
- Kurdistan piştî cenga cîhanî ya yekem
- daçek di kurdî de
- kitêba li ser maseyê
- ava zelal ji kaniya çiyayên welatê me
- teqîneke bihêz li Enqerê

Mirov dikare van gotinan wiha bisinifîne:

raveber	raveker
kurd	di dîrokê de
Kurdistan	piştî cenga cîhanî ya yekem
daçek	di kurdî de
kitêb	-a li ser maseyê
ava zelal	ji kaniya çiyayên welatê me
teqîneke bihêz	li Enqerê

Di piraniya zimanên din de jî (bo nimûne, erebî, farisî, inglîzî û fransî de) peyvrêziya komikên daçekî wek vê peyvrêziya resen ya kurdî ye anku peyva raveber li destpêkê ye û komika daçekî ya raveker li pey wê tê. Bo zelalkirina vê meseleyê em dikarin çend ji nimûneyên li jor li inglîzî wergerînin:

- Kurds in history
- Kurdistan after the First World War
- adpositions in Kurdish
- the book on the table (the book = kitêb, on = li ser, the table = mase)

Lê di tirkî de peyvrêzî berovajî vê ye. Eger em ji hevoka “kitêba li ser maseyê” dest pê bikin û hewl bidin wê li tirkî wergerînin, awayê herî mihtemel yê wergerandinê dê ev be:

- masa üstündeki kitap (masa = mase / mêze, üstündeki = ya li ser, kitap = kitêb)

Wek ku tê dîtin, peyva “kitêb” (bi tirkî “kitap”) ji destpêka gotinê çûye dawiya wê û peyva “mase” (tirkî “masa”) ji dawiya gotinê hatiye destpêka wê. Ne tenê di vê hevokê de, li di nimûneyên din de jî peyvrêziya tirkî berovajî ya kurdî (û herwiha ya inglîzî, erebî, farisî, fransî û gelek zimanên din e).

- Tarihta Kürtler (peyv bi peyv “di dîrokê de kurd” – bi kurdî “kurd di dîrokê de”)
- Birinci Dünya Savaşından sonra Kürdistan (li gor qalibê tirkî “Piştî cenga cîhanî ya yekem Kurdistan” – bi kurdî “Kurdistan piştî cenga cîhanî ya yekem”)
- Kürtçede ilgeç (li gor qalibê tirkî “di kurdî de daçek” – bi kurdî “daçek di kurdî de”)

Behskirina peyvrêziya tirkî û çend zimanên din li vê derê bi nisbî bi berfirehî ji ber wê ye ku ev peyvrêziya tirkî van salên dawiyê bi hêzeke mezin derbazî kurdî jî dibe. Ev tesîr wisa xurt e ku ne tenê di “tirkmancî” de, di devê kurdên kurdîkêzman de lê heta di rêzimannameyên kurdî de cihê xwe qayim kiriye û dike ku peyvrêziya eslî ya kurmancî hilweşîne.

Kerem bikin em li naveroka “Rêzimana Kurmancî”<sup>68</sup> ya Samî Tan binêrin ku ji aliyê gelek kesan ve niha wek berhemeke otorîter ya rêzimana kurmancî tê hesabandin:

Samî Tan	Li ber peyvrêziya tirkî	Eslê peyvrêziyê bi kurdî
Ji aliyê binyad ve kurdî	Köken tarafından Kürtçe	Kurdî ji aliyê binyatê ve
Ji aliyê teşe û dirûv ve kurdî	Biçim tarafından Kürtçe	Kurdî ji aliyê teşe û dirûvê ve

<sup>68</sup> Dikare li vê derê were barkirin û dîtin: <http://zanin.ir/795.html>

Di kurdî de qertaf	Kürtçede ek(ler)	Qertaf di kurdî de
Di kurmancî de bêjeyên nû û bêjesazî	Kurmanççada yeni sözcükler ve sözcük yapımı	Bêjeyên nû û bêjesazî di kurmancî de
Ji aliyê sazûnê ve cureyên bêjeyan	Yapım tarafından sözcük çeşitleri	Cureyên bêjeyan ji aliyê sazûnê ve
Di peyvan de kirpandin	Kelimelerde vurgu	Kirpandin di peyvan de

Heta tenê di lîsteya naverokê de ne tenê ev lê careke din jî bi qasî van komikên li gor peyvrêziya tirkî hene. Lê dîsa jî ev awa bi rastî vê dawiyê ji tirkî hatiye neqilkirin. Ne ew berê di kurmancî û zazakî de hebû û ne jî ev awa niha di gelek zimanên din de (bo nimûne inglîzî, fransî, farisî, erebî, soranî... de peyda dibe).

### 13. RASTNIVÎSÎNA DAÇEKAN

Du mijarên serekî di rastnivîsîna daçekan di kurmancî de hene:

- nivîsîna paşdaçekên bingehîn wek "de, re, ve" yan "da, ra, va"
- nivîsîna paşdaçekan bi peyva berî wan ve yan jî jê cuda

#### 13.1. Paşdaçek wek "de, re, ve" yan "da, ra, va" bî nivîsîn?

Li jor hatiye behskirin ku formên "da, ra" (lê ne "va") di zimanê piraniya devokan de formên serdest in lê dîsa jî formên "de, re, ve" di nivîsînê de zal in tevî ku formên "da, ra, va" jî hê jî di nivîsînê de li kar in. Tevî serdestiya formên "da, ra" di devokan de hevberî "de, re" jî, dîsa nivîserê vê vekolînê jî formên bi E (anku "de, re, ve") tercîh û pêşniyaz dike:

- Di kurmanciya nivîskî de formên "de, re, ve" serdest in, ne "da, ra, va"
- Di piraniya devokan de jî forma "ve" serdest e, ne forma "va"
- Di zazakî de ev paşdaçek bi formên "de" û "ra" ne lê ji aliyê peydabûnê ve "de" ji "ra" zêdetir di pratîkê de peyda dibe loma mirov dikare bibêje ku "de" ji "ra" girîngtir e.
- Di soranî de "da" û bi devokî herwiha "ra" jî hene lê hem "ra" di hemû devokan de nîne û hem jî "da" gelek caran dibe "-a" loma ew nikarin ji formên kurmancî re baş bibin rêber

- Ji aliyê etîmolojî ve forma “de” eslîtir e ji ber ku ji peyva “de-r” e ku hê jî di zazakî de li gel formên “de, di” û di farisî de jî wek tek alternatîva vê peyvê maye.
- Forma “ve” di piraniya kurmancî de serdest e, di soranî de bi awayê “-ewe” û di kurdiya başûrî de jî bi awayên “-ewe, -we, -ew” peyda dibe ku di hemûyan de E heye, ne A.

### 13.2. Veqetandin an zeliqandina daçekan?

Vê dawiyê di nivîsîna kurmancî ya bi alfabeya latînî de lihevkerineke hema-hema tevayî peyda bûye ku daçek ji peyva piştî xwe û berî xwe cuda tê nivîsîn<sup>69</sup>. Bo nimûne:

- li Ewropayê
- di rojnameyê de
- ji niha ve
- bi me re

Lê ev lihevkerin ne bi temamî ye û ne jî herdem hebûye. Mirov dikare lihevkerin yan lihevnekirina di warê nivîsîna cuda yan girêdayî li ser çend mijaran parve bike:

- nivîsîna pêşdaçekan
- nivîsîna paşdaçekan
- nivîsîna dordaçekên serbixwe

Herwiha mirov dikare lihev(ne)kirina di warê nivîsîna cuda yan girêdayî de ji du aliyan ve nêzîkî mijarê bibe:

- lihevnekirinên dîrokî
- lihevnekirinên niha

### 13.3. Veqetandina pêşdaçekan

<sup>69</sup> Ji bilî rewşên ku hemû peyvên biwêjekê anku îdyomekê bi hev ve tên nivîsîn, bo nimûne “**bikaranîna** kompûterê”, “**lihev**kirina wan”, “dest**pê**kerên xwandina kurdî” û hwd.

Wek prensîp, ne niha û ne jî berê ti lihevnekirineke cidî di nivîsîna pêşdaçekan de ji navdêr, rengdêr<sup>70</sup> û hokerên pey wan de tine bûye<sup>71</sup>:

- bi tirimpêlê (ne “\*bitirimpêlê”)
- di defterê de (ne “\*didefterê de” yan “\*didefterêde”)
- ji wan (ne “\*jiwan”)
- li nêzîk (ne “\*linêzîk”)
- heta niha (ne “\*hetaniha”)

Lê hinek lihevnekirin di nivîsîna beşên daçekên aloz bi hev re de yan jî ji hev cuda de peyda dibe:

- li ser / liser
- ji ber / jiber
- li gel / ligel, di gel / digel

Awayê serdest yê piraniya van peyvan şeweyê ji hev cuda ye: “li ser, ji ber”, ne “liser, liber”. Ev awayekî beaqil, maqûl û lojîk e ji ber ku “ser” û “ber” jî bi eslê xwe navdêr in: çawa ku em dinivîsin “li malê” yan “ji kitêbê”, wisa rast e ku em binivîsin “li ser, ji ber” jî.

Hin kes idia dikin ku gotinên wek “li ser, ji ber” maneyên cuda wergirtine, bûne biwêjên serbixwe û divê bi hev re bên nivîsîn. Lê rastnivîsîn nikare bi hêsanî li gor watenasiyê (manenasiyê, semantîkê) were eyarkirin ji ber ku watenasî ne herdem xwedî sinorên zelal e. Rast e ku “li ser” yan “ji ber” hin erkên ji peyvên xwerû “li” û “ser” yan “ji” û “ber” wergirtine lê li aliyekî hin ji wê wateya bingehîn parastiyê û li aliyekî din ji xwe peyvên “li, ser, ji, ber” her yekê çend wateyên taybet yên ji wateya xwe bingehîn wergirtine.

Di kurmancî de nivîsîna her beşa daçekên aloz ji yên din cuda pratîkeke serdest e û baştir e ku wisa bimîne. Di vî warî de rastnivîsîna kurmancî gelek ji ya soranî zêdetir standard bûye. Di soranî de lihevnekirineke berçav di vî warî de heye. Pratîka serdest ew e ku daçekên aloz bi hev ve tînin nivîsîn lê ti lihevnekirineke berçav peyda nebûye. Wek din jî, di soranî de nivîsîna bi hev re yan ji hev cuda gelek caran ne li ser bingehê taybetmendiyên kurdî lê li gor hevwaterên wan peyvan di hin zîmanên din de (adeten erebî yan inglîzî) bi hev re yan ji hev cuda tînin nivîsîn.

<sup>70</sup> Wek awarteyekê mirov dikare peyva “tenê” bide ku hin kes li gel daçeka “bi” wê bi hev ve wek “bitenê” dinivîsin lê forma serdest û pêşniyazkirî “bi tenê” ye anku daçek û rengdêr ji hev cuda tînin nivîsîn.

<sup>71</sup> Bo bikaranîna daçekan li gel cînavan û herwiha di lêkerên biwêjî de, li jêrtir binêrin.



Bo nimûne, hevwatera “li ser” ya kurmançî di soranî de jî ji du peyvên “le” û “ser” pêk tê. Lê ji ber ku di erebî de û di inglîzî de hevwatera vê daçekê yekpeyvî ye, bi erebî ‘ela û bi inglîzî on, li ber modela wan di soranî de jî gelek caran ev daçek wek “leser” tê nivîsîn.

Lê cudahiya “leser” ji ‘ela û on ew e ku ‘ela û on nikarin zêdetir bînan parvekirin ji ber ku ew bi rastî jî tenê ji peyvekê pêk hatine. Nivîsîna “le ser” bi waterê “leser” herwiha bêmentiqî û nelojîkiyê peyda dike ji ber ku peyva ji du peyvan pêkhatî bi hev re tê nivîsîn “leser” lê peyva dîsa ji du peyvan pêkhatî “le ma” (li malê) adeten wek “lema” nayê nivîsîn.

Di erebî de jî piraniya pêşdaçekan ji peyva pey xwe cuda tên nivîsîn:

- min Kurdistan (ji Kurdistanê)
- fî Kurdistan (li Kurdistan)

Lê daçeka “bi-” (hevwatera “bi” ya kurmançî) di rastnivîsîna erebî de bi peyva piştî xwe ve tê nivîsîn:

- bisseyare (bi tirimpêlê)

Berê tesîra vê girêdana daçeka erebî herwiha li ser nivîsîna hevwaterên wê bi kurdî û farisî (bi farisî “bi”, bi soranî “be”) jî hebû lê kêr bûye. Dîsa jî ew gelek caran di soranî û di kurmançiya bi alfabeya erebî de tê dîtin.

“Bi-” niha jî di gelek waran de di kurmançî de wek pêşgir heye û hem navdêran digire û dike û rengdêr û hem jî li gel lêkeran peyda dibe:

- bihêz, binamûs, binanûxwê (dilsoz, ne nankor)...
- bike, bidin, biçim, bipêjî...

Di soranî de li gel navdêran di vê rewşê de “be-” heye ku hevdenga daçeka soranî “be” (bi kurmançî “bi”) ye: behêz, benamûs. Li gel lêkeran di vê rewşê de di soranî de wek di kurmançî de “bi-” li kar e, ne “be-”. Lê ev di kurmançî û soranî de pêşgir in (prefîks in), ne pêşdaçek in (ne prepozisyon in) loma bi peyva pey xwe ve tên girêdan.<sup>72</sup>

<sup>72</sup> Di çend berheman de pêşgirên lêkeran “bi-” û “di-” jî jê cuda hatine nivîsîn. Bo nimûne “di bêjim, bi kin” li cihê “dibêjim, bikin” yê standard. Belkî giringtirin berhema li gor vî awayê nivîsînê *Ferhenga Kamêran* e (çapa Dihokê, 2006, binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2016/03/26/ferhenga-kameran-kurdi-kurdi/>) e. Lê ev awayê nivîsînê nadir e û roj bi roj jî kêmtir dibe.

### 13.4. Nivîsîna pêşdaçekên berî cînavan

Wek qeydeke giştî, pêşdaçek ji cînavên pey xwe jî cuda tên nivîsîn:

- bi te (ne \*bite)
- ji min (ne \*jimin)
- di wê de, di wî de (ne “\*diwê de, \*diwî de” yan “\*diwêde, \*diwîde”)
- li we (ne \*liwe)
- ji me (ne \*jime)
- li wan (ne \*liwan)

Li ser van di pratîkê de ti lihevnekirineke cidî nîne. Lê hinek lihevnekirin di nivîsîna pêşdaçekan li gel cînavên “xwe” û “hev” (li gel varyantên “hevdu, hevûdu, hevdi, hevûdi”) heye.

Du nimûne ji “xwe”:

- bi xwe, bixwe
- ji xwe, jixwe (bi taybetî gava ku bi maneya “actually” ya inglîzî yan “zaten, artık” yê tirkî tê bikaranîn)

Li vê derê mirov dikare bi hêsaniyê formên ji hev cuda “bi xwe, ji xwe” pêşniyaz bike ji ber ku her yek ji wan ji du peyvên serbixwe pêk tê û ji aliyê avaniyê û struktura zimanî ve ti cudahiya “bi xwe, ji xwe” ji “bi min, ji min” yan “bi wê, ji wê” nîne. Bi taybetî jî nivîsîna “bi xwe” wek “bixwe” dikare tevliheviyê peyda bike ji ber ku “bixwe” forma fermanî ji lêkera “xwarin” e.

### 13.5. Daçek-cînavên hev, pev, tev, jêk, pêk, têk, lêk

Daçekên “bi, di, ji” û heta carinan daçeka “li” jî li gel cînavê “hev” tên kurtkirin û wiha tên nivîsîn:

- hev (ji hev), pev (bi hev), tev (di hev), lev (li hev)

Adeten ev awa wek formên ne-standard yan nîv-standard tên dîtin û di nivîsînê de kêmtir tînin bikaranîn. Lê di çend biwêjan anku îdyoman de wan bi temamiyê xwe girîngî û carinan heta tek alternatîv in jî:

- “pevçûn” (bi maneya “lihevdan, lihevistin, şerkirin”) ku bi awayê “bihevçûn” hema-hema qet peyda nabe.

Hevwateyên “jev, pev, tev, lev” di kurmaciya rojhilatî de bi awayê “jêk, pêk, têk, lêk” in ku ji “ji yek/êk, bi yek/êk, di yek/êk, li yek/êk” pêk hatine<sup>73</sup>. Di soranî de jî ew bi awayên “pêk, têk, lêk” (“lêk” di soranî de cihê “jêk” ya kurmancî jî digire). Hem di kurmanciya rojhilatî û hem jî di soranî de ew formên standard in û di nivîsînê de jî tên bikaranîn. Ew di çend biwêjan de di kurmanciya giştî de jî tên bikaranîn:

- pêkanîn, pêkhatin, têkçûn...

### 13.6. Daçek di lêkerên biwêjî de

Di kurdî de hejmareke pir mezin ya lêkerên biwêjî heye ku tê ji du yan zêdetir peyvan pêk hatine. Li gor rastnivîsîna serdest ya kurmancî, her beşek ji wan serbixwe tê bikaranîn gava ku ew wek lêker tên bikaranîn. Bo nimûne:

- mezin bûn, hez kirin, dest pê kirin, bi kar anîn: *Ew mezin bûne. Ez hez dikim te bibînim. Min dest bi xwandinê kir. Gelo te ew bi kar aniye?*

Lê gava ku ew wek navdêr an rengdêr bînin xebitandin, hingê hemû beş bi hev ve tên nivîsîn:

- **nimûne ji bikaranîna wek navdêr:** mezinbûna wê, hezkirineke bihêz, destpêkirina xwandinê, bikaranîna kompûterê...
- **nimûne ji bikaranîna wek rengdêr:** ya mezinbûyî, stranbêjeke hezkirî, kursa destpêkirî, kompûtereke bikarînayî...

Di Bikaranîna wek lêker de, daçek jî ji beşên din yê peyvê cuda tên nivîsîn. Bo nimûne\_

- bi kar anîn, bi cih kirin, bi nav kirin, ji dest çûn (ne “\*bikar anîn, bicih kirin, binav kirin, birêve birin” û ne jî “\*bi karanîn, bi cihkirin, bi navkirin, bi rê vebirin”)
- lê dan, pê ketin, tê xistin (ne “\*lêdan, pêketin”, “tê xistin”)
- dev jê berdan, ser jê kirin
- bi rê ve birin (ne “\*birê ve birin” yan “bi rêve birin” yan “bi rê vebirin” yan “birêve birin”)

Lê wek navdêr û rengdêr, ew jî li gel hemû beşên din yê biwêjê bi hev re tên nivîsîn:

<sup>73</sup> Di piraniya devokên kurmanciya rojhilatî de navê hejmarê 1 “êk” yan “yêk” e.

- **wek navdêrkirî:** bikaranîn, bicihkirin, binavkirin, birêveçûn, jidestçûn, devjêberdan, serjêkirin, lêdan, pêketin, têxistin...
- **wek navdêrên biker:** bikaranîner, bicihker, binavker, birêveber, devjêberder, serjêker...
- **wek rengdêrkirî:** bikarînayî, bicihkirî, binavkirî, birêvebirî, jidestçûyî, devjêberdayî, serjêkirî, lêdayî, pêketî, têxistî, serjêkirî, devjêberdayî...

### 13.7. Veqetandin û girêdana paşdaçekan

Eger di veqetandina pêşdaçekan ji peyva pey wan ve de lihevkirineke hema-temam hebe jî, di veqetandin an zeliqandina (bihevvekirina) paşdaçekan de mesele pir aloztir e.

Ti caran hemû paşdaçekên kurdî ji her peyva berî xwe ve nehatine veqetandin. Anku hin paşdaçek bi peyva pêş xwe ve tîn nivîsîn. Lê lihevnekirin li ser wê ya ka kîjan û kengî paşdaçek bi peyva beriya xwe ve zeliqandî û kîjan û kengî jî ji peyva berî xwe veqetandî bîn bikaranîn.

Di tarîxa nivîsîna kurmançî de mirov dikare bibêje ku tendensa giştî ji zeliqandinê ber bi veqetandinê ye:

- Di kurdiya bi alfabeya erebî – ku klasîkên kurdî û yekem kovar û rojnameyên kurmançî pê hatine nivîsîn de – paşdaçekên /de, ra/re, va/ve” adeten bi peyva berî xwe ve dihatin nivîsîn. Ev awayê nivîsînê di soranî de hê jî serdest e: hevrehê “ve / va” ya kurmançî anku “-ewe” ya soranî bi zerûrî bi peyva berî xwe ve tê nivîsîn û qet jê cuda nayê nivîsîn. Paşdaçeka “da” (hevrehê “de, da” yên kurmançî) bi piranî – lê ne herdem – bi peyva berî xwe ve girêdan. Varyanta wê ya sivikkirî “-a” bi zerûrî bi peyva berî xwe ve tê nivîsîn û veqetandina wê ne mimkin e.
- Di kurmançiya berî çend dehsalan li Bakurê Kurdistanê dihat nivîsîn de, li ber modela halên rêzimanî (*grammatical cases*) yên tirkî paşdaçek adeten bi peyva berî xwe ve dihatin zeliqandin: “di kitêbêda/kitêbêde” (bidin ber tirkî “kitapta” ji “kitap-ta”).
- Di kurdiya bi alfabeya krîlî de li ber modela halên rêzimanî yên rûsî, paşdaçekên kurdî jî bi peyva berî xwe ve dihatin girêdan.
- Herwiha tesîra zîmanê devkî jî dikare li ser bijartina awayê zeliqandinê hevberî veqetandinê dikare hebe ji ber ku di axiftinê de gelek caran daçek tîn kurtkirin, xaseten bi cînavan re: bo nimûne “ji mer, bi mir” (ji me re, bi min re).

Lê dîsa jî niha di kurmancî (û ekola Vateyê ya zazakî jî lê ne zazakînivîsên ku zazakî beşek ji zîmanê kurdî nahesibînin) veqetandin û cudanivîsîna paşdaçekan ji navdêr, rengdêr, cînav, hejmaran (lê ne herdem ji hokeran – li jêtir binêrin) serdest e:

- di kitêbê de (ne “di kitêbêde”)
- ji nêzîk ve (ne “ji nêzîkve”)
- ji wan re (ne “ji wanre”)

Ev awa ne tenê serdest e lê herwiha hêjayî pesindanê ye jî ji ber ku ew hem ji aliyê rêzîmanî ve bi mentiqî û lojîkî peyvên ji birrên cuda ji hev cuda dike û hem jî rê li ber dirêjbûna peyvên û dijwarbûna xwandin û zehmetbûna fehmkirina wan digire.

Çûna li pey tirkî yan rûsî – wek ku berê dihat kirin – ji binî ve şaş e ji ber ku di rûsî û tirkî de mesele ne daçek in lê halên rêzîmanî ne. Çawa ku di kurdî de jî mirov paşgirên çemandinê bi peyvê ve girê dide (bo nimûne: kitêb-ê / kitêb-an), halên rêzîmanî yên rûsî û tirkî jî wek wan in. Di tirkî û rûsî de ew halên rêzîmanî dikarin hevwaterên hin paşdaçekên kurdî bin lê hin caran ew hevwaterên pêşdaçekên kurdî ne jî lê em hingê pêşdaçekan jî bi peyva serekî ve girê nadin. Bo nimûne:

- tirkî: kitaptan (kitap-tan, peyv bi peyv: kitêb-ji)
- bi kurmancî: ji kitêbê

Di tirkî de jî paşdaçekên rastîn bi peyva berî xwe ve nayên girêdan. Bo nimûne (di nimûneyan de paşdaçek bi *xwehrî* hatine nivîsîn:

- sizin *için* (“bo we, ji bo we”, peyv bi peyv: “we bo, we ji bo”)
- masanın *üstünde* (“li ser maseyê”, peyv bi peyv: “maseyê li ser”)

Loma gotinên wek “bila mîna tirkî be, hêsantir e” jî pere nakin ji ber ku tirkî bi xwe jî paşdaçek bi peyvê ve girê nade. Yê ku tirkî bi peyvê ve girê dide, halên rêzîmanî ne. Cudahiya kurdî û tirkî di vî warî de ew e ku kurdî gelek tiştan bi daçekan îfade dike ku tirkî bi halên rêzîmanî diyar dike.

Lê bi çendîn hokeran re adeten paşdaçek tî zeliqandin:

- pêşve, paşve, pêşde, paşde (kêmtir bi awayê: pêş ve, paş ve,
- pişt → piştire (kêmtir “pişt re” lê bidin ber “di piştê re, di piştî xanî re”)
- dûvre, dûre, dûvra, dûra (herwiha “dûv re, dû re, dûv ra, dû ra”)
- virve / virde, wirve / wirde (kêmtir: vir ve, vir de, wir ve, wir de)

Herwiha li gel çend cînavên ne-kesî re jî paşgir tîr girêdan:

- çira, çire, çima (ji ber çi, bo çi, ji bo çi, sebeb çi ye ku), ne “çi ra, çi re, çi ma, çime”
- lewre, lewra, lewma, loma, ne “lew re, lew ma, lo ma”

### 13.8. Nivîsîna daçekên aloz

Beşên cuda yên pêşdaçekên pêkhatî her yek cuda tê nivîsîn:

- ji bo, ji ber, ji nav... (ne “jibo, jiber, jina...”)
- li ser, li dor, li ber, li nav, li gel, li gor... (ne “liser, lidor, liber, linav, ligor...”)
- di nav ... re, di ber ... re, di ser ... re (ne “dinav ... re, diber ... re, diser ... re”)
- bi nav, bi ser, bi ber... (ne “binav, biser, biber...#”)
- ber bi ... ve (ne “berbi ... ve”)

Di çend daçekên ji farisî wergirtî de pêşdaçeka “der-“ li gel beşa din tê nivîsîn ji ber ku “der-“ wek daçek bi maneya “di ... de” wek peyveke serbixwe di kurdî de peyda nabe:

- derheqê, derbarê... (kêm caran “der heqê, der barê”)

Dordaçekên bi awayê pêşdaçek-cînav + paşdaçek carinan bi hev ve nivîsandî tîr dîtin, wek “têde, pêre, jêre”. Lê awayê serdest yê rastnivîsîna wan nivîsîna ji hev cuda ye:

- tê de, tê re, tê ve
- jê ve, jê re, jê de
- pê re, pê de, pê ve

Lê hind dordaçekên wiha paşgira “-tir” werdigirin û hingê hemû bi hev ve tê nivîsîn:

- pê ve → pêvetir (ne “pê vetir” yan “pê ve tir”)

Herwiha li gel cînava “wê” jî:

- wê ve / wê de → wêvetir / wêdetir

## 14. DAÇEK Î GIRANÎ

Pêşdaçek û paşdaçekên bingehîn bêyî giranî (kirp, stress) in. Bo nimûne (kîteyên kirpandî/giran hatine qelewkirin):

- li **malê**
- **pêşve**

Herwiha dordaçekên ji pêşdaçêkek û paşdaçêkekê pêkhatî de jî bê giranî ne:

- di **kitêbê** de

Di dordaçekên ji pêşdaçêkeke serbixwe û paşdaçêkeke bingehîn pêkhatî de pêşdaçêka serbixwe girankirî ye anku kirpandî ye:

- **pê** ve, **tê** de, **jê** re

Di paşdaçekên pêkhatî anku aloz de, daçêka ne-bingehîn girankirî ye:

- ji **ber**, ji **bo**, ji **nav**...
- li **dor**, li **ber**, li **ser**...
- di **nav** de, di **ber** re, di **navberê** de...

Di komika bi daçêka aloz ya girankirî de, giraniya pêşîn (serekî, prîmer, *primary*) li ser berkara daçêkê ye (di nimûneyan de **qelewkirî**) û giraniya duyîn (duyem, seknder, *secondary*) li ser beşa girankirî ya daçêkê ye (di nimûneyan de *xwehrkirî*):

- li *ser* mal**perekê**
- ji *nav* **wan**
- li kêleka **gundî**

## 15. KURDÎ WEK ZIMANEKÎ SERSINOR

Yek ji taybetmendiyên herî kurdî, bi taybetî kurmancî û ji devokên kurmancî jî nemaze kurmanciya nivîskî û devokên kurmanciya navendî – ku heta kêma hatiye behskirin yan qet nehatiye qalkirin – ew e ku bi awayekî pir berfireh dordaçekan bi kar tîne. Di vê beşa vekolîna xwe de em ê hewl bidin diyar bikin ka ev xusûsiyet çî ye, çawa ye û çima wisa ye.

Helbet di gelek zimanan de hin dordaçek hene. Bo nimûne, li vê mînaka inglîzî binêrin:

- from now on (ji niha pêve, ji niha şûnde)

Wek ku tê dîtîn, di inglîzî de jî bi dordaçek peyda dibin. Lê cudahiya kurdî û inglîzî yan kurdî û gelek zimanên din ew e ku di zimanên din de dordaçek xwedî roleke marjinal, parawêz û bisinor in lê di kurdî de (xaseten di kurmanciya navendî û nivîskî de) dordaçêke beşeke serekî û pir berbelav di nav daçekan de digêrin. Bo nimûne, li cihê her yek ji van van pêşdaçekên bingehîn yên inglîzî di kurdî de dordaçek hene:

inglîzî: pêşdaçek	kurdî (kurmanciya navendî): dordaçek
in ... (in the book)	di ... de (di kitêbê de)
for ... (for you)	ji ... re (ji te re)
with ... (with us)	bi ... re (bi me re)
via ... (via Kurdistan)	di ... re (di Kurdistanê re)
on ... (on the wall)	bi ... ve (bi dîwar/dîwêr/dîwarî ve)

Bikaranîna dordaçekên wiha giran û qurs bi merema diyarkirina têkiliyên bingehîn (daçekên bi wateyên bingehîn) wek “tê de, jê re, pê re” di nav zimanên dinyayê de diyardeyeke nadir, ecêb û heta belkî xerîb e jî. Di piraniya zimanan de pêşdaçek an paşdaçek an halên rêzimanî (ku dişibin paşdaçekan) serdest in lê ne wek kurdî herdu di heman demê de.

Ji zimanên cîranên kurdî, di erebî û farisî de pêşdaçek bi temamî zal in û hema-hema paşdaçek peyda nabin. Di ermenî de hem pêşdaçek û hem jî paşdaçek (lê ne wek kurdî dordaçek) peyda dibin lê paşdaçek bi zelalî zal in. Di tirkî de pêşdaçek qet peyda nabin: hemû diyarkirina têkiliyê bi paşdaçekan û xaseten jî bi halên rêzimanî yên paşgir tê encamdan.

Eger em li tevahiya zimanên îranî binêrin, em ê bibînin ku li hem li sinorê rojava yê zimanên îranî anku di kurdî de û hem jî li sinorê rojhilat yê zimanên îranî, di peştûyî de dordaçek bi berfirehî tên bikaranîn. Ji ber ku têkiliya cografî ya kurdî û peştûyî kêma yan tine ye û ji ber ku wek din jî kurdî û peştûyî di nav zimanên îranî de ne zêde nêzîkî hev in, ne mimkin e ku van sedsalên dawiyê yekê ji wan ev diyarde ji yê din wergirtibe.

Lê madem ku li herdu nuqteyên ji hev dûr yên erdnigariya zimanên îranî ev diyarde peyda dibe, pîrsek peyda dibe: gelo dordaçek taybetmendiyeke kevnar ya zimanên îranî ye ku di van herdu zimanên sersinor de maye lê di zimanê din yê mezin yê navendê anku ji farisî ketiye?



Eger em tenê li kurdî, peştûyî û farisî binêrin, bi rastî jî ew qenaet dê li ba mirovî xurt bibe. Lê eger em bergeha vekolîna xwe firehtir bikin û li dîrok û cografyayê binêrin, em ê bibînin ku di rastiyê de serdestiya dordaçekan di zimanên îranî de ne diyardeyeke tev-îranî ya qedîm bû lê bi ihtimaleke pir mezin di van hezarsalên borî de peydabûye.

Ji aliyê dîrokî û tarîxî ve: ne di zimanên kevn (avestayî, hexamenişi) û ne jî yên navîn (pehlewî, partî, sogdî) de dordaçekan ti roleke giring tine bûye. Anku zaliya dordaçekan diyardeyeke paşî-peydabûyî ye.

Lê madem ku dordaçek di îraniya kevn û navîn de tine bûn û di zimanê farisî yê ji aliyê cografî ve di navbera kurdî û peştûyî de jî peyda nabin, gelo çawa heman tişt ji nişkê ve bi heman awayî di du zimanên îranî yên ji hev dûr û bêyî ti têkiliya bi hev re peyda bûye?

Bo fehmkirina diyardeya dordaçekan di kurdî û peştûyî de, ne bes e ku mirov tenê li zimanên îranî binêre. Divê mirov bergehê hê jî firehtir bike û li rewşa zimanên cîran yên ne-îranî binêre.

Hem kurdî û hem jî peştûyî ji aliyê cografî ve zimanên sersinor in: li başûr û rojhilata devera peştûyîxiv zimanên ne-îranî hene. Li rojava, bakur û başûrê devera kurdîxiv jî zimanên ne-îranî hene. Li başûrê devera peştûyîxiv zimanên hindûarî (zimanên indoewropî yên Hindistanê) hene ku tê de paşdaçek serdest in. Li bakurê deverên kurdîxiv heta destpêka sedsala bîstem ermenî berbelav bû ku tê de paşdaçek serdest in. Niha li rojava bakurê deverên kurdîxiv tirkî serdest e ku dîsa di wê de jî paşdaçek û halên rêzimanî yên mîna paşdaçekan serdest in.

Bi qenaeta min, peydabûna serdestiya dordaçekan di kurdî û peştûyî de ji kêşmekêş û hevrikiya navbera pêşdaçekiya zimanên îranî û paşdaçekiya zimanên cîran in. Ti ji herduyan bi temamî nikariye di kurdî yan peştûyî de bi ser bikeve loma hem pêşdaçek mane û hem jî paşdaçek lê zêde bûne û wek encam dordaçek berbelav bûne. Berbelavbûna paşdaçek û dordaçekan di van zimanan de illeh wê maneyê nade ku paşdaçek bi xwe ji zimanên cîran hatibin wergirtin. Tenê cihê bikaranîna wan jî dikare ji zimanên cîran hatibe wergirtin. Di zimannasiyê de diyardeyeke berbelav û bernas e ku zimanên cîran tesîreke berçav li ser peyvîziya hev heye: dora peyvî di zimanekî de dikare biguhere û bibe mîna dora peyvî di zimanekî cîran de bêyî ku illeh zimanê berguher ji zimanê tesîrker gelek peyv wergirtibin.

Di kurdî de rêje û nisbeta pêşdaçek, paşdaçek û dordaçekan di hemû lehce, devok û deveran ne eynî ye:

- Di kurdiya başûrî de ank di devokên feylî, kelhurî, kirmaşanî de paşdaçek pir kêmtir e bikaranîn, tenê paşdaçeka “-ewe, -ew, -we” (hevreha paşdaçeka “ve” ya kurmancî). Di zîmanên nêzîkî wan devokan anku wek farisî û erebî hema-hema paşdaçek qet peyda nabin.
- Di soranî de bikaranîna paşdaçekan ji kurdiya başûrî zêdetir e lê ji kurmancî kêmtir e.
- Di kurmanciya rojhilatî de (bo nimûne Behdînan û Hekariyan) jî her sê paşdaçekên bingehîn yê kurmanciya giştî “de, re, ve” (di piraniya devokên kurmanciya rojhilatî de bi awayên “da, ra, ve”) hene lê dîsa jî bikaranîna wan ji pêşdaçekan kêmtir e.
- Di kurmanciya navendî de (bo nimûne Mêrdîn, Qamişlo, Şingal) hê jî bikaranîna pêşdaçekan hinekî ji ya paşdaçekan zêdetir e lê rêjeya bikaranîna paşdaçekan jî nêzîkî wê dibe. Kurmanciya ji hemû devokên kurmancî, lehceyên din yê kurdî û zîmanên cîran zêdetir pêşdaçek û paşdaçekan bi hev re anku dordaçekan bi kar tîne. Ji ber rola girîng ya kurmanciya navendî di kurmanciya nivîskî de, dordaçekan di kurmanciya nivîskî de jî roleke bingehîn heye.
- Di kurmanciya rojavayî (ji Diyarbekirê rojavatir) û ya bakurî (Serhedê) de rola pêşdaçekan kêmtir dibe û bikaranîna paşdaçekan zal e (ji ber tesîra zîmanên nêzîk anku tirkî û ermenî ku di herduyan de jî paşdaçek – di tirkî de herwiha halên rêzîmanî yê paşgirî yê mîna paşdaçekan – zal in.)

Mirov dikare bi tabloyeke wiha rêjeya **texmînî** ya bikaranîna pêşdaçek û paşdaçekan pêşkêş bike. Her dordaçek wek pêşdaçêkek û paşdaçêkek hatiye hesabandin.

zîman, zarava yan devok	pêşdaçek	paşdaçek
erebî	100 %	0 %
farisî	100 %	0 %
kurdiya başûrî	90 %	10 %
soranî	80 %	20 %
kurmanciya rojhilatî	70 %	30 %
kurmanciya navendî	60 %	40 %
kurmanciya rojavayî û bakurî	20 – 30 %	70 – 80 %
zazakî	10 – 20 %	80 – 90 %
ermenî	10 %	90 %
tirkî, azerî	0 %	100 %

Mirov dikare vê rastiyê bi çend nimûneyan destnîşan bike:

ziman yan lehce	nimûne	nimûne	nimûne	nimûne
erebî	me'e ...	li ...	bidûne ...	qidd ...
farisî	ba ...	berayê ...	bî ...	zid ...
kurdiya başûrî	wegerd ...	we ...	bî/bê ...	dij we...
soranî	leget ...	bo ...	bê ...	dij be ...
kurmanciya rojhilatî	li gel ...	bo ...	bê ...	dijî ...
kurmanciya navendî	bi ... ra/re	ji ... ra/re, ji bo ...	bê/bêyî ...	dijî ...
kurmanciya rojavayî û bakurî	... ra	... ra	bê ...	dijî/qarşiyê <sup>74</sup> ...
zazakî	bi ... a	... rê	bê ...	duştê / qarşiyê...
ermenî	... hêt	... hamar	aranç ...	... dêm
tirkî	... ile, ...le/la	...a	...-siz	...a karşı

## 16. PÊŞDAÇEKKIRINA PAŞDAÇEKÊN WERGIRTÎ

Lehceyên kurdî hin paşdaçek ji tirkî û ermenî wergirtine û kirine pêşdaçek. Bo nimûne, di tirkî de "göre" paşdaçek e lê ew ketiye kurdî û di kurdî de bûye pêşdaçek:

- tirkî: ona göre (peyv bi peyv: wê/wî li gor)
- kurmancî: li gor wê/wî
- soranî: be gwêrey ew (peyv bi peyv: bi gora wê/wî)

Zazakî paşdaçeka ermenî "hêt" wergirtiye û hem wek paşdaçek parastiye û hem jî kiriye pêşdaçek. Bo nimûne, di ermenî û zazakî de mirov wiha dibêje "li gel me" yan "bi me re":

- ermenî: mêz hêt (peyv bi peyv: me li.gel)

<sup>74</sup> Ji paşdaçeka tirkî "karşı" hatiye wergirtin û bûye pêşdaçek. Binêrin beşa "Pêşdaçekkirina paşdaçekên wergirtî".

- zazakî: ma het (peyv bi peyv: me li.ba) → hetê ma ("aliyê me, rexê me")

Dîsa paşdaçeka tirkî "karşî" (dijî, zidî) wek "qarşî, qarşiyê" ketiye hem zazakî û hem jî hin devokên kurmançî (bi taybetî kurmançiya rojavayî û bakurî) lê cihê wê ji paşdaçekiyê neqil bûye pêşdaçekiyê. Bo nimûne, gotina "dijî me" di tirkî û lehceyên kurdî de bidin ber hev:

- tirkî: bize karşı (peyv bi peyv: me dijî)
- zazakî: qarşiyê ma<sup>75</sup> (peyv bi peyv: dijî me)
- kurmançiya bakurî û rojavayî: qarşiyê me<sup>76</sup> (peyv bi peyv: dijî me)

Hem di "hetê ma" û hem jî di "qarşiyê ma/me" de hem di zazakî û hem jî di kurmançî de daçek bi raveka xwemalî "-ê" bi komika xwe ve (di nimûneyên me de "ma/me" de) hatiye girêdan

Hêjayî gotinê ye ku "qarşî, qarşiyê" ne vê dawiyê ketiye kurmançî û zazakî lê demeke dirêj e ku di kurdî de cih girtiye. Ev rastî hem ji stranên folklorî û hem jî ji axiftina kurdên Ermenistanê diyar e.<sup>77</sup>

## 17. DAÇEKÊN DÎROKÎ?

Çend paşgir hene ku ji aliyê wateya xwe pir dişibin. Bo nimûne:

- **-ma:** çima, loma/lewma/lema, hema (bidin ber: çî-ra, bo çî, ji ber çî, ji ber wê, bo wê)
- **-lo:** çilo (= çawa) (bidin ber "bi wî awayî")
- **-sa:** wisa, hosa / usa, kusa (= çawa) (bidin ber "bi çî awayî, bi vî awayî, bi çî awayî")
- **-to:** çito (çawa, bi çî awayî), weto (wisa, bi wî awayî)

<sup>75</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva "qarşiyê" di zazakî de: "Ma şenê vacê ke Amerîka qarşiyê Iraq de teniya menda." (Em dişên/dikarin bibêjin ku Amerîka dijî Iraqê bi tenê ma." – kurmançikirina min. HM)"

[http://165725.forumromanum.com/member/forum/forum.php?action=std\\_show&entryid=1048958279&USER=user\\_165725&threadid=2](http://165725.forumromanum.com/member/forum/forum.php?action=std_show&entryid=1048958279&USER=user_165725&threadid=2)

<sup>76</sup> Bo nimûneyekê ji bikaranîna peyva "qarşiyê" di folklorê kurdî de, binêrin kitêba li ser Filîtê Quto bi amadekariya Salihê Kevirbirî: "Metran Îsa ji wî zemanî heya vî zemanî, nav û dengê xwe deranî / Metran Îsa li qarşiyê Waliyê Wanê / di bin dêra Axtermanê hêja şerek danî".

[https://books.google.fi/books?id=CR8CAwAAQBAJ&pg=PT19&lpg=PT19&dq=qar%C5%9Fiy%C3%AA+xwe&source=bl&ots=ThUI5gM321&sig=qb0xQIp29\\_0HL6r48-B-Wa\\_VJr4&hl=fi&sa=X&ved=0ahUKEwidzfPcy-LKAhXBGCwKHSw4D\\_wQ6AEIHDA#v=onepage&q=qar%C5%9Fiy%C3%AA%20xwe&f=false](https://books.google.fi/books?id=CR8CAwAAQBAJ&pg=PT19&lpg=PT19&dq=qar%C5%9Fiy%C3%AA+xwe&source=bl&ots=ThUI5gM321&sig=qb0xQIp29_0HL6r48-B-Wa_VJr4&hl=fi&sa=X&ved=0ahUKEwidzfPcy-LKAhXBGCwKHSw4D_wQ6AEIHDA#v=onepage&q=qar%C5%9Fiy%C3%AA%20xwe&f=false)

<sup>77</sup> Binêrin bo nimûne: <http://www.tirsik.net/index.php?mijarid=938&d=cpk>

Ji van serekaniya “-ma” ne diyar e. ”-sa” ne daçek e lê peyveke îranî ya bi şiklê “san, sen” ya bi maneya “wek, mîna” ye. “-lo” kurtkirina “-lon” e ku ji peyva “lewn” (reng, awa) ya bi eslê xwe ji erebî ye. “-to” ji peyva “tor, tewr” (awa, şêwe, terz) e û ew jî ne daçek e.

Bi gotineke din, berevajî “-ra, -re” yên di peyvên wek “çi-ra, çi-re” de, paşgirên “-lo, -sa, -to” bi eslê xwe ne daçek in. “-ma” mimkin e ku bi eslê xwe daçek be lê bi esehî nayê zanîn.

## 18. DAÇEKA VEŞARTÎ

Carinan ji aliyê hevoksazî ve mirov dizane ku têkiliyeke wisa heye ku adeten bi daçekan tê diyarkirin lê dîsa jî ti daçek di hevokê de nehatine bikaranîn. Di kurmancî de xaseten di rewşa livîna yan livandin ber bi cihekî ve yan heta cihekî de bi piranî ti daçek nayên bikaranîn:

- Ew hat/çû malê.

Kerem bikin em hevoka li jor bidin ber hevokên daçekdar yên wek:

- Ew ji malê hat/çû.
- Ew li malê ye.

Ji van herdu hevokên dawiyê wisa dixuye, heçku daçek ji hevoka “Ew hat/çû malê” kêmbê. Herwiha rast e ku li cihê “ew çû malê” yan “ew hat malê” mirov dikare wiha jî bibêje:

- Ew ber bi malê ve çû/hat.
- Ew heta malê çû/hat.

Di zazakî û farisî de di vê rewşê de daçeka “bi” tê bikaranîn:

- zazakî: O ame/şi bi keye.
- farisî: Ê amed/reft bi xanê.

Di soranî de jî daçeka “bo” gelek caran bi vê meremê tê bikaranîn:

- Ew hat/çû bo ma.

Di kurmanciya rojhilatî de jî carinan “bo” bi heman awayî tê xebitandin:

- Ew hat/çû bo malê.

Di kurmanciya rojavayî de jî bikaranîna “bi” di vî haletî de mimkin e:

- Ew bi malê çû/hat.

Herwiha bikaranîna daçeka paşlêkerî jî di gelek devokên kurmancî de di vê zerûfê de mimkin e:

- Ew hat-e malê.
- Ew çû-ye malê.

Lê piraniya kurmancîaxivan di vê rewşê de ti daçekan bi kar naînin û vî qalibî diemilînin:

- Ew çû/hat malê.

Hevokên di kurmancî de berbelav in û ti şaşî tê de nînin. Mirov dikare bibêje ku daçek di wan de “veşartî” ye. Heman diyarde bo nimûne di inglîzî de jî heye. Bo nimûne:

- He went/came home. (Ew çû/hat malê.)

Adeten daçeka ku di inglîzî de liva ber bi cihekî ve diyar dike “to” ye, wek:

- He went/came to London. (Ew çû/hat Londonê.)

Dîsa li vê hevokê binêrin:

- He gave her a gift. (Wî diyariyek da wê.)

Dîsa ti daçek nehatine bikaranîn. Heman tişt dikare bi alîkariya daçekê jî were gotin:

- He gave a gift to her. (Wî diyariyek da *bi/bo* wê. Wî diyariyek *ji* wê *re* da.)

Eger em herdu hevokên inglîzî bidin hev, em ê bibînin ku gotinên “her” (wê) û “a gift” (diyariyek) di hevokan de cihên xwe bi hev veguhastin e: di hevoka yekem de “her” berî “a gift” e lê di hevoka duyem de rewş berevajî bûye.

Heman tişt di kurdî de jî tê dîtin:

- Ew ji malê çû.
- Ew çû malê.

Wek ku tê dîtin, cihê peyvên “malê” û “çû” bi hev diguherin.

Adeten di kurdî de lêker (di herdu nimûneyên me yê vê dawiyê de “çû”) li dawiya hevokê ye. Lê di “ew çû malê” de ne wisa ye. Sebeb ew e ku li şûna bikaranîna daçekan, nemana daçekê bi guherandina peyvêziya hevokê anku rêz û siraya peyvên di hevokê de hatiye qerebû- û tezmînkirin.

Bi gotineke din, gava ku di kurmancî de liva ber bi cihekî yan tiştêkî ve hebe lê daçek di hevokê de neyê bikaranîn, hingê ne lêker lê hokera neyekser (cihê yan tiştê ku armanca livê ye) dikeve dawiya

hevokê. Loma bi me hevoka “ew çû malê” rêzîmanî û rast e lê “ew malê çû” bi heman maneyê di kurmançiya giştî de ne mimkin e.

## 19. KURTBÛNA DAÇEKAN

Di axiftinê de daçekên kurmançî gelek caran kurt dibin. Kurtbûn li gor devokan diguhere.

Di kurmançiya navendî û rojavayî de gelek caran ji paşdaçekên bingehîn tenê consonant dimîne û E/A dikeve:

- nimûne ji kurtbûna paşdaçekan: ji me’r, jê’r (ji me re, jê re)

Di kurmançiya rojhilatî de di rastiyê de dengê “i” hema-hema qet li pey daçekên bingehîn “di, ji, li” nayê bilêvkirin. Ew yan wek “j / ş, l, b/p/v/f, d/t” bi peyva piştî xwe ve tîr girêdan yan jî bi awayê “-j / -ş, -l, -b/-p/-v/-f, -d/-t” (li pey vokalan) yan jî “-ij / -iş, -il, -ib/-ip/-iv/-if, -id/-it” (li dûv konsonantan) tîr gotin:

- ş’malê (ji male), p’tê (bi te), ez-iş malê hatim (ez ji malê hatim)

Di soranî de jî E-ya daçekên bingehîn dikare ji pey hokeran were kurtkirin:

- le + êre (li + vir) → lêre (li vir)
- le ewê (li + wir) → lewê (li wir)

Lê ev kurtkirin li gel navdêran ne mimkin e:

- le + Êran (li + Îran) → le Êran (li Îranê), ne “\*l’Êran”
- le + Ełmanya (li + Almanya) → le Ełmanya (li Almanyayê), ne “\*l’Ełmanya”

Di soranî de herwiha dengê D dikare ji paşdaçeka “da” (de, da) were xistin:

- le + kitêb + da (di + kitêb + de) → “le kitêbda” yan “le kitêba”

Sebebên serekî yê kurtkirina daçekên bingehîn bêgiraniya wan (tinebûna giraniya / kirpandina dengî di wan de) û herwiha bernasiya wan e anku ew tîr nasîn û hêsanî tîr fehmkirin tevî ku ew bi zelalî neyên artîkulekirin jî.

## 20. KETINA DAÇEKAN

Daçek ne tenê dikarin bên kurtkirin an sivikkirin lê ew herwiha gelek caran dikevin jî yan tên avêtin jî. Mirov dikare çendîn awayên ketina yan avêtina daçekan destnîşan bike:

- bikarneanîna pêşdaçekan di gelek devokan de (xaseten kurmanciya rojavayî û bakurî:
  - o mi ra (“bi min re” yan “ji min re”)
  - o ”mal de” (“di malê de, di mal de, li malê”)
  - o ez [ji] malê hatim
  - o ez [li] malê bûm
- livîna ber bi cihekî ve dikare bêyî daçeka paşlêkerî “-e” jî were bikaranîn:
  - o ew hat[e] malê.
- xistina ji biwêjan:
  - o biserke(f)tin → serke(f)tin
  - o birêvebirin → rêvebirin
  - o xaseten gava ku lêker dibin navdêr(ên biker): bi rê ve birin → [bi]rêveber, bi serke(f)tin → Serkeft
- xistina paşdaçekan di helbestan de
  - o Bo nimûne, di helbesta “Şeva Hicran” ya li destpêka vekolîna me de, paşdaçek li gelek cihên wisa nehatine bikaranîn ku di zimanê normal de divê hebûna. Bo zelalkirina meselê, em dikarin çend rêzikan ji helbestê li vê derê dubare bikin û bi paşdaçekan [...] “temam” bikin:

*Di tarîka şeva hicran [de] çiraxek sîfet im ya Reb*

...

*Şikestî rengê dal im ez, di halê hirqet [de] im ya Reb*

*Di kûra 'eşqê [re] borî me, yeqîn ez pîrê torî me*

*Di "lailma" derûrî [de] me, di qeyda hicret [de] im ya Reb*

...

*Cegerxwîn im siyahçerd im di kunca xelwet [de] im ya Reb*

## 21. DAÇEK JI LÊKERAN



Çend lêker jî bi erkê paşdaçekan dikarin bên bikaranîn:

- ji par were (“ji par ve”, “ji par heta niha”)
- ji îro bigire heta sibê (ji îro ve heta sibê)

## 22. DAÇEK Û KOMIKÊN DEMÎ

Heta niha me di piraniya nimûneyên xwe de daçek di komikên cihê û amûrê de bi kar anîne:

- di kitêbê de
- li Kurdistanê
- ji malê
- bi kêrê

Lê daçek bi berfirehî herwiha bi bêje û biwêjên demî re jî tên bikaranîn. Bo nimûne:

- heta sibê
- ji niha ve
- roj bi roj
- ji sala 1980 ve (ji hingê heta niha – û belkî ji niha pê ve jî)
- ji sala 1950 heta 1970
- di du salan de

Lê hokerên demî adeten bê daçeka “di ... de” yan “li ...” tên bikaranîn:

- îro (ne “\*di îro de” û ne “\*li îro”)
- par (ne “\*di par de” yan “\*li par”)
- pêr (ne “\*di pêr de” yan “\*li par”)

Lê diyarkirina dema “livok” (ji, heta, ji ... ve) de, daçek li gel hokerên demî jî tên bikaranîn:

- ji îro ve
- ji pêr heta niha
- ji kengî ve?

Bi navên rojên hefteyê û navên mehan re û li gel navên demsalan û hejmarên salan jî adeten daçeka “di ... de” nayê bikaranîn [beşên di kevankên kujîdar de ne hewce ne]:

- ez ê [roja] duşemê biçim (adeten ne "di [roja] duşemê de" yan "li [roja] duşemê")
- [meha] hezîranê havîn dest pê dike (adeten ne "di [meha] hezîranê de" yan "li [meha] hezîranê")
- biharê kulîlk vedidin (adeten ne "li biharê" û bi taybetî jî ne "\*di biharê de")
- ez [sala] 1980 ji hatime dinyayê (adeten ne "di [sala] 1980 de" yan "li [sala] 1980")

Bikaranîna "di ... de" yan "li ..." di rewşên wiha de bi hokerên demî re mimkin û gengaz e lê ne zerûrî û hewce ye. Bo rêgirtina li ber giranbûna avaniya hevokê û nivîsê bi giştî, çêtir e ku "di ... de" û "li ..." di vê rewşê de neyên bikaranîn.

### 23. PAŞDAÇEKÊN –E Û –Î

Yek ji mijarên rêzimana kurdî ku pir kêr li ser hatiye nivîsîn yan hema-hema qet nehatine vekolîn, paşdaçekên –e û –î ne. Kerem bikin em pêşî di çend nimûneyan de li wan binêrin û paşî her yekê ji wan şirove bikin:

- ew hate malê, wan gote min, ez ê biçime bajarî
- nîşanî min da, nêzîkî min bû, berî te hatin, ne dijî hev in.

Paşdaçekên –e û –î temamkerên hev in: -e li pey lêkeran tê bikaranîn, -î li peyv birrên din yê peyvan: navdêr, rengdêr, cînavan, hoker, daçek.

#### 23.1. PAŞDAÇEKA -E

Pasdaçeka –E li gel hin peyvên liv û hereketê tê bikaranîn û maneya "ber bi filan tiştî/kesî ve" yan "bo, ji bo, jê re" dide:

- hate malê (ber bi malê ve hat, heta malê hat)
- gote min
- hinek avê bidine wê (ji wê re, bo wê)

Tarîxiyên paşdaçeka –e hevrehê pêşdaçeka "bi" (tarîxiyên û di lehceyên din de "be, we, ve, -ev/-ef, -ew") û paşdaçeka "ve" ye:

Bo nimûne:

- kurmancî: bidine min, bidin **bi** min<sup>78</sup>
- soranî: bîden **be** min

Bikaranîna paşdaçeka –e di kurmancî de ne zerûrî ye anku ew dikare bikeve:

- hate malê = hat malê
- bidine min = bidin min

Gelek caran paşdaçeka –e û li gel herfa –e ya di paşgirên demên borî yên dûdar de têkil dibe yan dikeve ser hev:

- dema borî ya sade: hatin, da → hatin(e) malê, da(ye) min
- dema borî ya dûdar: hatine, daye → hatine malê, daye min

### 23.2. PAŞDAÇEKA -Î

Paşdaçeka –î dikare li pey navdêran, rengdêran, hokeran û daçekan were bikaranîn. Bo nimûne:

- li peyv navdêran: bangî wan kir, êrişî me nekin, nîşanî wê da
- li pey rengdêran: hat nêzîkî min, hûn dûrî wan in
- li pey cînavan: hindî wan, (bi) qasî wan
- li pey hokeran: zêdeyî du saetan
- li pey daçeka: li dijî wan, tevî me (bi me re, li gel me)

Eger em nimûneyên li jor em bi hin awayên din bibêjin, em dikarin bibînin ku paşdaçeka –î cihê çendîn pêşdaçekên ji hev cuda digire:

- bangî min kir = bang li min kir
- hat nêzîkî min = li min nêzîk bû, ber bi min ve nêzîk bû
- dûrî wan in = ji wan dûr in
- zêdeyî du saetan = ji du saetan zêdetir
- dijî wan = (soranî) dij be ewan

Hin caran li cihê –î, varyanta –ê tê bikaranîn:

<sup>78</sup> Bi devokî herwiha bo nimûne: bidin-ev min, bidin-ef min, bidin-iv/bidin-if min.

- bangê me kir, nêzîkê wan, zêdeyê bîst kesan

Anku –î carinan cihê daçeka “li”, hin caran cihê “ji”, geh-geh cihê “bi” (bi soranî “be”) digire û heta dikare cihê hin daçekên pêkhatî yan aloz yê wêk “ber bi ... ve” jî bigire.

Berevajî paşdaçeka “-e”, paşdaçeka “-î” di kurdî de axlebe zerûrî ye. Mirov nikare wê ji peyvê biavêje û hevokê wê berê bidomîne. Lê mirov dikare paşdaçeka “-î” bi hin paşdaçekên wêk “li, ji, bi...” li gor devokê veguhêze. Alternatîva bikêrhatî li gor peyvên din diguhere. Bo nimûne:

- bangî wî kir → bang **li** wî kir
- dûrî wî ye → **ji** wî dûr e

Hin caran mirov hevokên wêk “bang min kir” bibîne jî, bi piranî ew wêk “bangî min kir” yan jî “bang li min kir” in.

Carinan paşdaçeka –î di heman demê de li gel pêşdaçeka hevate tê bikaranîn:

- li dijî wan = dijî wan
- li beramberî mala me = beramberî mala me

Mirov dikare bibêje ku bikaranîna awayê “li dijî wan” totolojî (*tautology*) anku dubarekirina ne hewce ye. Loma em dikarin awayê “dijî wan” pêşniyaz û tercîh bikin.

Paşdaçeka –î bi hin peyvên ve zeliqiyê û peyvên ferhengîbûyî anku leksîkalîze jê çêkirine:

- berî (ber+î – bidin ber soranî “ber le ...” yan kurdiya başûrî “ber je, wer je”)
- pêşî (pêş+î)
- paşî (paş+î)

Ji aliyê etîmolojî ve çavkaniya paşdaçeka –î ne bi temamî zelal e. Ihtimalen ew ji pêşdaçeka “li” ye. Bo ketina vokala pêşîn bidin ber paşdaçeka –e ji “be” (bi). Ji xwe paşdaçeka –î bi piranî li cihê pêşdaçeka “li” tê bikaranîn jî. Lê ji ber ku paşdaçeka –î gelek caran maneya “ji” û hin caran ya “bi” jî dide, mimkin e ku ev kî xwedî çend rehên etîmolojîk be anku hem “li” (tarîxiyên “le, ne”) bûbe “î” û hem jî bo nimûne “ji” (tarîxiyên “je, ej”).

**Dê bidome.**

## XALBENDÎ

**Mehmet Özer**



### Pêşgotin

Me di vê nivîsê de mijara bikaranîna xalbendiyê ya di **zaravayê kurmancî** de esas girtiye.

Berî ravekirina taybetmendiyên her xalbendikekê, me di sê zaravayên kurdî (kurmancî, kirmancî\*<sup>79</sup> û soranî), sê zimanên cînar (tirkî, farisî û erebî) û zimanekî sereke yê ku di Cîhanê de herî zêde tê bikaranîn, îngilizî de navê wan nivîsiye.

---

<sup>79</sup> Me di vê nivîsê de peyva “kirmancî” di wateya zaravayêkî kurdî bi kar aniye ku li hinek deveran de wekî “dimilî”, “kirdî” û “zazayî” jî tê binavkirin. Bi gotineke din, bi peyva “kirmancî” mexseda me diyarkirina wateya hevbeş ya peyvên “dimilî”, “kirdî” û “zazayî” ye. Ev navê “kirmancî”, me wek navê hevbeş yê peyvên “dimilî”, “kirdî” û “zazayî” ji endamekî “Grûba Xebate ya Vateyî” rêzdar Deniz Gündüz girtiye.

Di zaravayê kirmancî de kurtenivîsên li jêr;

zh: pirjimar,

m: makî, zayenda mê,

n: nêr zayenda nêr,

nişan dide.

Wek tê zanîn bikaranîna nîşaneyên xalbendiyê; bi piranî û bi awayekî berbelav, di zimanên bi tîpên latinî têne nivîsandin de xuya dibe. Ji ber vê sedemê, hinek nişane, sembol û karakter di zarava û zimanên bi tîpên aramî têne nivîsandin de peyda nebûn. Ew ên peydanebûyî jixwe di wan zimanan de bi awayekî berbelav nayên bikaranîn.

Bi nirxandin, rexne, pêşniyar û şîroveya xwe di amadekirina vê nivîsê de keda heval û hogirên li dewerên cuda de dijîn jî heye. Bi taybetî peydakirina berdêla peyvên di zarava û zimanên cuda de...

Ew kes û saziyên ku berî me di heman mijarê de kedeke bêhempa dane û her yek wekî kulîlkeke baxçê zimanê kurdî; pirtûk, kovar û meqaleyên em gihîştinê û me jê sûd girtine jî di rupelên dawî de amadene.

Wek her karî di vê nivîsê de jî lewazî, kêmasî û çewtîyên ku em tenegehîştine jî hene niha.

Em hêvîdarin ku bi nirxandin, rexne, pêşniyar û şîroveya we xwendevanên hêja, em ê nexşandina zimanê xwe bigihînine qonaxeke geştir.

## **XALBENDIK Û XALBENDÎ DI NIVÎSÊ DE**

Wek tê zanîn nivîs, bi şikl û rêbazan nîşandana gotinê ye. Ji bo xwendin û jêfemkirin hêsantir bibe, ragihandina nivîskî sererast bibe, digel tîpên alfabeyê hewcedarî bi hinek nîşaneyan jî heye; ji her yek van re **xalbendik** tê gotin. Di nivîsê de bikaranîna xalbendikan re jî **xalbendî** tê gotin.

Xalbendî; rastnivîsandin, rastxwendin û têgihîştina wateya hevokan hêsantir dike. Digel rêbazên rêziman û rastnivîsê, bi saya xalbendiyê, nivîskar; raman û nêrînên xwe pêşkêşî xwendevanan dike.

Di dema xwendinê de jî bi saya nîşaneyên xalbendiyê, ji bo xwendevan; rastxwendin û têgihîştina wateya nivîsê hêsantir dibe. Her wiha cihên bêhnberdan, rawestin û peyvên kirpandinê jî diyar dibin.

Dîroka nivîsê, bi hezaran salên bihurî digihêje nivîsên xêzekî (hieroglyph) û mixî. Ragihandina nivîskî, dema ku bi tîpan dest pê dike, di pey de pêwîstiya xalbendikan jî derdikeve holê. Tîp û xalbendik tev,

şeklên peyv û hevokên nivîsandinê ne. Xuya ye ku afirandina tîp û xalbendikan, di heman demê de nebe jî, li pey hev e.

Di navbera wan de her çi cudahî hebin jî, temamê zîmanan ji bo ragihandin û jihev fehmkirinê ne. Di nivîsa bi alfabeya latînî de bikaranîna xalbendikan, ji bo hemî zîmanan kêr-zêde wekî hev e. Bi gotineke din nîşaneyên xalbendikî û bikaranîna wan, rewşeke gerdûnî ye.

Di nivîsê de bikaranîna xalbendikan;

bi kurmancî “xalbendî”,

bi kirmancî “nîşanê nuqtayan (zh)”,

bi soranî “xalbendî” (بەندیخال),

bi tirkî “noktalama”,

bi îngilizî “punctuation”,

bi farisî “nişan guzari” (گذاری نشان),

bi erebî “terqim” (ترقیم)

tê binavkirin.

#### ÇEND XALBENDIKÊN NIVÎSÊ

• xal

, bêhnok

‘ dabir

; xalebêhnok

: xalecot

... sêxal

..... rêzexal

! baneşan

? pirsnîşan

" " dunik

« » koşedunik?

' ' yeknik

" dubarek

^ kumik

/ dabeş/xwarxêzek



\ dabeşa çep

() kevanek

{ } kemerkevanek

[ ] koşekevanek

- bendik

— xêzek (xêzeka axaftinê)

binxet binxet

· xalxêzek

~ kevanxêzek/tîlde

∞ bêdawînek

& û (gîhaneka û)

% sedek

‰ hezarek

§ çengel

. çengelok (cedilla)

\* stêrk

# çarxêzek

@ et

½ nîv

¼ çaryek, (ji çaran yek)

¾ çarsê, (ji çara sê)

= yeksan

≠ neyeksan

+ zêdek

- kêmek

± kêmezêde

÷ dabeş

x *caran*

√ reha duyem

∅ çap

> *mezintir e ji ...*

< *biçûktir e ji ...*

≤ *ne yeksan be jê mezintir e*

≥ *ne yeksan be jê biçûktir e*

€ ewro, yûro

\$ dolarê amerîkî

¥ yen

£ paûnd

¢ sent (cent)

© mafê jibergirtinê

® mafê tomarkirinê

♀ mê

♂ nêr

°C radek (paye, derece)

¶ bendek, (pilcrow)

0,1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9 jimarnav

1, 3, 46, 576, 3452691 jimare

$M^2$  jorenivîs,

$H_2O$  jêrenivîs,

### **Bikaranîna Xalbendikan Di Nivîsê De**

Di nivîsê de bikaranîna xalbendikan damezirandina hevokê hêsantir dike.

Di nivîsandin û xwendinê de, ji bo rê li tevlihevîyê venebe, xwendin û jêfemkirin hêsantir bibe û lihevistina hevokan sererast bibe; di xwendinê de cihên rawestin, bêhndan û kirpandinê (accentuate) diyar bibin, pêwîstî bi xalbendiyê heye.

Di hevokê de, cih û cureyê nîşaneyên xalbendikî, li ser wateya nivîsê xwedan bandoreke sereke ne. Bi guherîna cih û cureyê nîşaneyên xalbendikî di heman hevokê de wate jî diguhere.

Mînak a: **Mamoste Zana spartek da**

**Ev, hevokeke bêxalbendik e.**

Dibe ku xwendevan bi çend awayên cuda têbigihêje wateya wê. Bi saya bikaranîna nîşaneyên xalbendikî û bi guherîna cihê wan; ji heman hevokê, wateyên jihevçuda peyda kirin pêkane ye.

Mînak b: **Mamoste, Zana spartek da.**

**Ev, bû hevokeke ragihandinê.**

Bi saya bikaranîna nîşaneyê bêhnok û xalê, wateya hevokê diyar bû.

Di vê hevokê de, yê ku agahiyê didinê **Mamoste** ye, yê ku **spartek da Zana** ye.

*Kirde, Zana ye.*

Mînak c: **Mamoste Zana, spartek da.**

**Ev jî hevokeke ragihandinê ye.**

Bi saya guherîna cihê nîşaneyê bêhnokê wateya hevokê jî guheriye.

Di vê hevokê de yê ku **spartek da, Mamoste Zana** ye. *Kirde, Mamoste Zana ye.*

Mînak d: **Mamoste, Zana spartek da?**

**Ev, bû hevokeke pirsyarî.**

Bi saya bikaranîna nîşaneyê pirsnîşanê, wateya hevokê jî guheriye.

Di vê hevokê de; kesek ji **Mamoste** dipirse, **Zana spartek da?** *Kirde, Zana ye.*

Mînak e: **Mamoste Zana, spartek da?**

**Ev, jî hevokeke pirsyarî ye.**

Bi saya guherîna cihê nîşaneyê bêhnokê wateya hevokê jî guheriye.

Di vê hevokê de; kesek ji kesekî dipirse, **Mamoste Zana, spartek da?** *Kirde, Mamoste Zana ye.*

Mînak ê: **Mamoste, Zana spartek da!**

**Ev, bû hevokeke baneşanî.**

Bi saya nîşaneyê baneşanê, wateya hevokê jî guheriye.

Di vê hevokê de kesek, heyrîna xwe li Zana radigihîne **Mamoste**. Wekî ku ne dema spartek dayîne ye lê **Zana spartek da!** Yê ku lê diheyirin Zana ye. *Kirde, Zana ye.*

Mînak f: **“Mamoste Zana, spartek da!”**

**Ev jî bû hevokeke baneşanî.**

Bi saya guherîna cihê nîşaneyê bêhnokê wateya hevokê jî guheriye.

Di vê hevokê de kesek lê diheyire ku **Mamoste Zana, spartek da!** Yê ku kesek lê diheyire, Mamoste Zana ye. *Kirde, Mamoste Zana ye.*

**Di Nivîsê De Cih û Girîngiya Valahiyê:**

Me peyva valahiyê bi wateya “boşluk” a tirkî û “blank/space character” a îngilizî de nivîsiye. Di kurmançî de jê re **navber** jî tê gotin. Em pirî caran dibêjin ku “Navberê dayne nav herdu peyvan”. Bi gotineka din, **valahî** jî karaktereke nivîsê ye.

Di nivîsê de hecmê yek valahiyê bi qasî hecmê yek tîpê ye.

Di nivîsê de rista valahiyê, ji ya nîşaneyên xalbendikan kêmtir nîn e. Ji bo ku tîp, jimarnav, jimare, peyv û hevokên jihev cûda; tevlihev nebin, destpêk û dawîya her yek ji wan diyar bibe, di navbera wan de valahiyek tê danîn.

Di navbera hêmanên hevokan de divê bi qasî hecmê tîpekê valahî hebe ku peyv jihev bîn vebijartin û xwendina sererast pêk bê.

Nivîsandin û xwendineke bêyî nîşaneyê valahiyê nabe.

Wek tê zanîn, xwendevan peyvan ne yeko yeko bi tîpan lê bi hev re wek şekilekî dibine. Ji bo ku ev şekilan bi hêsanî jihev bêne vebijartin, hewcedarî bi danîna valahiyê heye.

## **VALAHÎ**

Ev karaktera;

bi kurmancî “karakter a valahî”,

bi kirmancî “karakter a vengîye/talîye (m)”

bi soranî “boşayî” (بۆشایی)

bi tirkî “boşluk karakteri”,

bi îngilizî “blank /space character”,

bi farisî “nîşanê fasilê” (نشان فاصله),

bi erebî “al-mesafe/elfera” (الفراع/المسافة)

tê binavkirin.

**Di nivîsê de bikaranîna karakter a valahiyê li gorî hinek rêbazan dibe:**

1- Di navbera peyv û hevokên jihev cuda de tenê yek karakter a valahiyê tê danîn, ji yekê zêdetir an jî kêmtir nabe.

Mînak:

*Ya qadirê erd û asîman!*



*Ez evdekî Te î ji axê, Ahmedê Xanî,*

*ji cenabê Te î zulcelal lava dikim ku bi destûr û fermana Te, ji îro pê ve her sêsed û sê salan carekê  
Bekoyê Ewan bi rûyê vê dunyayê bikevit.*

*Qest û meqêda ji evê lavayê ne ew e ku bêmarîfetiyekek bibit, na û bîlekis, belbî jî mebest ew bit ku ev  
hîkmet mislî lutfeye Yezdanê erş-î ala bibit îbret-î mîlet.*

*Hurmetkarê cenabê Te î Mezin,*

*Ahmedê Xanî,*

*21ê meha muharremê 1695. \**

*(Tofan, Hesene Metê, r. 41)*

*\*Di mînakên jêgirtî de xalbendî û rastnivîs, ya nivîskaran bixwe ye, me lê guhertin nekiriye.*

*2- Ji peyvê şunde ku xalbendikek hebe valahî nakeve pêşiya xalbendikê lê divê ji xalbendikê şun de  
teqez yek valahî bê danîn.*

*Mînak:*

*"Tîştên herî şîrîn, welat û al in lê welat û al; bê zîman, ker û lal in!"*

*- Serçavan... Fincano!*

*Min nizanibû xwediyê min dizane ku ev navê wî ye. Fincan ji destê wî girt, qehwe kir qurtek û got :*

*- Nimreya lingê te çi qas e?*

*- Ez nizanîm.*

*(Mêrê Avis, Helîm Yûsiv)*

3- Di dawîya hevokê de di navbera peyva dawî û xalbendikê de valahî nayê danîn.

Mînak:

*Raweste! Ew çi ye?*

*Zîmanê me, rûmeta me ye.*

*“Dujminê bavan; nabe dostê lawan!”*

4- Eger di paş xalbendikê de peyv an jî hevokek were, ji xalbendikê şûn de valahiyek tê danîn.

Mînak:

*Raweste! Ne be, ez ê vegerim!..*

*Ev çi ye, ma tu yê me rehet bernedî?*

*1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9 û 0; jimarnav in.*

*Muzîk , sewta xwezayê ye; helbest, gotina dil û hestan e.*

5- Li pêş û paş; peyv, hevok û jimareyên di nava kevan û dunikan de valahî nayê danîn.

Mînak:

*Musade (destûr)*

(134)

“feraset”

“Cejna Tawisê Melek”

“Miletekî dîl ku zimanê xwe winda nekiriye, wekî girtiyekî mifteya zindana wî, bixwe re hılanî ye.”

(1930 K. Alî Bedirxan)

. XAL

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî “nîşaneyê xalê”,

bi kirmancî “nuqta”

bi soranî “xal” (خال),

bi tirkî “nokta işareti”,

bi îngilizî “**full stop**”,

bi farisî “nuqte” (نقطه),

bi erebî “nuqte el nihayet” (النهاية نقطة)

tê binavkirin.

Di dawiya hevokê de nîşaneyê xalê, rawesteke bi qasî nefesekê jî îşaret dike. Divê xwendevan, di pey nîşaneyê xalê de bi qasî nefesekê raweste û şun de xwendinê bidomîne.

Peyva di pey xalê de tê, bi tîpa girdek dest pê dike.

Di nivîsê de cihên ku nîşaneyê xalê tê bikaranîn û nayê bikaranîn hene.

**Di nivîsê de cihên ku nîşaneyê xalê tê bikaranîn jê hinek ev in:**

1- Di dawiya her hevokên ragihandinê de nîşaneyê xalê tê danîn.

Mînak:

*Îro baran dibare.*

*Xezal diçe dibistanê.*

*Ez kurd im, bi kurdbûna xwe serbilind im.*

2- Di paş jimareyên rêzîn de nîşaneyê xalê tê bikaranîn.

Mînak:

3. (*sêyemîn*)

17. (*hevdemîn*)

104. (*sed û çaremin*)

Di kurmancî de, ku jimareya rêzîn di hevokê de yek tenê be, ne bi jimare û xal; bi jimare û qertafa -emîn/ -yêmîn, wek peyvekê nivîsandin tê tercîh kirin.

Mînak:

*Di pêşbirkê de Sîdar, di asta 2. û Pelda di asta 3. de bu.*

(Bi piranî ev terz nayê tercîh kirin.)

*Di pêşbirkê de Sîdar, di asta 2'yemîn û Pelda di asta 3'yemîn de bu.*

(Bi piranî ev terz tê tercîh kirin.)

Hinek nivîskar jî, li paş jimareyên rêzîn de, şuna qertafa -emîn/ -yêmîn; qertafa -em/-yem datînin.

Mînak:

*sêyem (3.)*

*hevdem (17.)*

*sed û çarem (104.)*

Eger ji yekê zêdetir, jimareyên rêzîn; di heman hevokê de, li pey hev rêz kirî bin, di navbera wan de nîşaneyê bêhnokê tê danîn û tene li paş a dawî qertafa -emîn/-yemîn tê danîn.

Mînak:

*Pirsên 7, 8 û 9'emîn ên ku bersivandî ne.*

*Pirsên 10, 11, 12 û 13'yemîn nebersivandî ne.*

3- Di kurtkirina bi tîpên hûrdek de li paş tîpa dawî nîşaneyê xalê tê danîn.

Tîpa despêkê ya kurtkirinê tîkelî navdêran bi tîpa girdek, yê mayîn bi tîpa hûrdek dibe.

Mînak:

*Dr. (doxtor)*

*Prof. (profesör)*

*hwd. (her wekî din)*

*bnr. (bînerin)*

*r. 20 (rûpel 20)*

4- Di hinek nivîsan de ji bo nîşandan û jihev veqetandina saet û xulekan jî nîşaneyê xalê tê bikartînin.

Mînak:

*Destpêka civînê di saet **08.30** de ye.*

*Zelal, wê di saet **08.10** de were dibistanê.*

Bi piranî ev terz nayê tercih kirin.

Ji bo nîşandan û jihev veqetandina saet û xulekan, ya guncan, nîşaneyê xalecotê ye.

Mînak:

*Destpêka civînê saet **08:30** ye.*

*Zelal, wê di saet **08:10'an** de were dibistanê.*

5- Di tarîh avîtinan de, ji bo veqetandina roj, meh û salan, hinek nivîskar nîşaneyê xalê bikartînin.

Mînak:

*Jidayikbûna min, di roja 01.01.1984'an de ye.*

*Panela, bibîranîna Apê Mûsa, di roja 10.09.2012'yan de ye.*

Hinek nivîskar jî ji bo heman mexsedê nîşaneyên dine bikartînin.

*Me mijara tarîh avîtinê di beşeke din de bi berfirehî û bi mînakan cur be cur rave kiriye.*

*(Bnr. beşa, Di nivîsê Tarîh Avîtin, r. ).*

6- Di matematîkê de nîşaneya xalê, wek nîşaneya carandinê tê bikaranîn.

Mînak:

$$2 \cdot 2 = 4$$

$$3 \cdot 8 = 24$$

7- Ku jimareyek ji penc û zêdetir jimarnavan pêk hatibe, ji bo ku xwêndina wan hêsantir bibe, ji rastê berve çepê, sêyek sêyek tên pêlandin û di navbera wan de nîşaneya xalê tê danîn.

Mînak:

$$34.287$$



453.000.654

4.000.000.000

Hinek nivîskar jî di heman rewşê de û bi heman mexsedê, ji rastê berve çepê, jimareyê sêyek sêyek dipêllînin û di navbera wan de nîşaneyê xalê danaynin û vala dihêlin.

Mînak:

34 287

453 000 654

4 000 000 000

**Di nivîsê de cihên ku nîşaneyê xalê nayê bikaranîn jê hinek ev in:**

1- Di dawîya sernavê; rojname, kovar, pirtûk, helbest û nivîsan de nîşaneyê xalê nayê bikaranîn. Di vê rewşê de hinek nivîskar temamê peyvê bi tîpên girdek dinivîsin. Hinek jî her tîpa di serê peyvê de bi tîpên girdek dinivîsin.

Mînak:

*SIYA DEMA BORÎ*

*(FÊRGÎN MELÎK AYKOÇ)*

*KESANDINA LÊKERÊN KURMANCÎ*

*(AYNUR BOZKURT)*

*Azadiya Welat*

*(rojname)*

*Min Qeyd Rizandin Di Hesreta Te De*

*(Ehmed Arif)*

*Tewlo (Kovar a pêkenokî û qerfî)*

2- Di dawiya rêzikên tabela û levheyên de nîşaneyên xalê nayê bikaranîn.

Mînak:

*Kolana Binevşê*

*Akademîya Ehmedê Xanî*

*Dibistana Seretayî Ya Bazîdê*

3- Di kurtkirina bi tîpên girdek de, nîşaneyê xalê nayê bikaranîn.

Heta salên dawî, di kurtkirina bi tîpên girdek de di paş tîpan de nîşaneyê xalê (.) bi kardianîn lê ev rêbaz bi piranî terikandî ye.

Mînak:

YE (Yekîtiya Ewrûpayê)

WKD (Wezaretê Karên Derveyîn)

DYA (Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê)

NY (Neteweyên Yekbûyî)

4- Hinek nivîskar di helbest û gotinên stranên de carinan xal û xalbendikên din bikarnaynin.

Mînak:

Şivanê Kurd

Çiya har in

Bineyar in

Bêxedar in

Bêmecal in

Ji bo te birîndar in

Bêhawer in

Sedem te ye em dinalin.

(...)

(Ereb Şemo)

(Feqî Huseyîn Sağniç, Dîroka Wêjeya Kurdî, r. 525)

## , BÊHNOK

Ev nîşaneyên;

bi kurmancî “nîşaneyên bêhnokê”,

bi kirmancî “vîrgul (n)”,

bi soranî “koma/bend” (ندبه / کوما)

bi tirkî “virgöl işareti”,

bi îngilizî “**comma**”,

bi farisî “virgule” (ویرگول),

bi erebî “al-farîze/al-fasileb” (الفارزة/لفاصلة)

tê binavkirin.

Bêhnok, di xwendinê de nîşaneyên rawestekê bi qasî niv nefesê ye jî. Ji bêhnokê şun de divê valahîyêk bê danîn.

Mînak:

– *Bila serê we, serê me, serê kurdan sax be. Rehma xwedê lê be, Ali Şamîl Paşa, lawê mîrê me yê mezin î gorbehîşt çûye rehmetê, lê ruhê wî yê şad bijî.\**

(Ji Bîra Qederê, Mehmed Uzun, r 83)

\*Di mînakên jêgirtî de xalbendî û rastnivîs, ya nivîskaran bixwe ye, me lê guhertin nekiriye.

**Di nivîsê de cihên ku nîşaneyê bêhnokê tê bikaranîn jê hinek ev in:**

1- Nîşaneyê bêhnokê, di nivîsê de carinan di şûna gihaneka **û'** yê de tê bikaranîn.

Mînak:

*Derzîlok û bûkik û lavlavk û pîvong û sosin; navê hinek kulîlkan e.*

*Derzîlok, bûkik, lavlavk, pîvong û sosin; navê hinek kulîlkan e.*

2- Di rêzkirina peyvên hempeyvir de nîşaneyê bêhnokê datînin navbera peyvan.

Mînak:

*Qaz, elok, wardek, keleşêr û mirîşk, bi per û bask in lê ne firinde ne, nafirin.*

*Hinek navên balindeyan ev in: baz,  
bersork, beytik, bilbil, bûm û hwd.*

3- Di dawiya peyvên denglêkirinê de nîşaneyên bêhnokê tê bikaranîn.

Mînak:

*Hevalê hêja,*

*Birêz Ehmed,*

*Gelî welatiyan,*

4- Di bersivandina pirsan de, di dawiya peyvên wek belê, na, erê de nîşaneyên bêhnokê tê bikaranîn.

Mînak:

*Belê, ev rast e.*

*Na, tu car nabe.*

*Erê, hûn hatin.*

5- Di hevokê de, peyva ku ji bo baldarî tê kirpandin di pey de nîşaneyên bêhnokê tê danîn.

Mînak:

**Rûkenê**, serkeftin bi dest xist, ji bo **Rûkenê**, çepikên xurt!

Ne ku em bi sere xwe hatin; **mamoste**, em serbest berdan.

Bajarê **Agirî**, bajarekî Serhedê ye.

**Ziman**, navgîna ragihandinê ye. **Ziman**, dergûşa hemû afirandinên civakî ye. **Ziman**, nîşaneya nasnameya hevpar e.

6- Di nivîsandina **jimareyên pareyi** de; ji bo veqetandina jimareyên komekên wan newekhev (kêmdêhî, kêmsedî û kêmhezari) de nîşaneya bêhnokê tê bikaranîn.

Mînak:

5,4 (pênc û ji dehî çar)

4,25 (çar û ji sedî bîst û penc)

1 DA: 1.975 LT (Yek Dolarê Amerîkî: Yek û ji hezarî nehsed û heftê û pênc lîrayê tirkî ye)

7- Di hin hevokên têkel de li pêş kirdeyan de nîşaneya bêhnokê tê bikaranîn.

Mînak:

*Wê, çi digo ji dil digo, dudevî (riyakarî) nedizanî.*

*Ew, ne kesekî çalak e.*

8- Di navnîşanên, çavkaniyî (biblografîkî) de nîşaneyê bêhnokê tê bikaranîn.

Mînak:

*Tan, Samî; Rêzimana Kurmancî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2011*

*Yusif, Helîm; Mêrê Avis, Avesta Basın Yayın, İstanbul, 1993*

9- Nîşaneyê bêhnokê, nayê navbera peyvên dubarekar.

Mînak:

*Darekî xaro maro ye.*

*Mirovekî tewşo mewşo bû.*



*Lûr lûr lûr şivano.*

10- Di hevokan de li pêş û li paş peyvên gihaneke nîşaneyê bêhnokê nayê danîn.

Mînak:

Ez **û** tu.

*Ku jêhatî be **çî jin çî mêr!***

*Çawa hat **wisa jî çû.***

*Xwest **ku** li bajêr bimîne lê bele çû gund.*

***Yan** were hindur **yan** ber derî neseke!*

11- Di hevokan de li paş peyvên daçekî nîşaneyê bêhnokê nayê danîn.

Minak:

*Pirtûkên min **li** mal in. Birê min wê **li dûv** min bîne fêrgehê.*

*Ez **li ber** malê rûniştim. Arî jî hat **li kêleka** min rûnişt.*

**Li pey mala wan dêrek heye. Ew ligel me heta dêrê hat.**

**Ez di ser pirê re derbas bûm. Nûrî di pêş de dimeşiya.**

**Jinek ji bo serdana lawê xwe çû bajêr.**

**Ehmed ji hêla çepê ve lê xist.**

**Av di bin qeşayê re diherike.**

**Min tu dîtî lê mixabin em ji hev dûrbûn.**

**Carinan ew tê ba me carinan jî em diçine serdana wan.**

**Hem kor e hem jî kulek!**

**‘ DABIR**

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî “nîşaneyê dabirê”,

bi kirmancî “apostrof (n)”

bi soranî “wîrgolî serewe” (سه روێرگولی هوه),

bi tirkî “kesme işareti”,  
bi îngilizî “apostrophe”,  
bi farisî “apastrof” (آپاستروف),  
bi erebî “elfasîletul ulya” (العليا الفاصلة)  
tê binavkirin.

Di kurdî de ji nîşaneyê dabirê re “jorebêhnok” jî tê gotin.

Nîşaneyê dabirê; bi tîp, jimarnav an peyva beriya xwe ve, tê nivîsandin û jê şun de jî valahî nayê danîn. Bi gotineke din, di herdu aliyên îşareta dabirê de karakê valahiyê nayê danîn.

**Di nivîsê de cihên ku nîşaneyê dabirê tê bikaranîn jê hinek ev in:**

1- Di navbera jimare û tîpên bihev re nivîsandî de nîşaneyê dabirê tê danîn.

Mînak:

*Di pêşbirkê de, ez yê 2'yemîn im.*

*34'emîn salvegera jidayikbûna wî, di 25'ê meha gulanê de ye.*

2- Hinek nivîskar vê nîşaneyê dabirê, ji bo nîşandana dengê “eyna (ع) erebî” bi kar tînin:

Mînak:

*Rûm û 'Ereb û 'Ecem di ferman*

*Meşhûri bi navê Mîrê Bohtan*

*Aba'ê 'uzam û cedd û walid*

*Mensûb û muselselê di Xalid*

(Mem û Zîn, Ehmedê Xanî

Amadekar H. Şimrexî, r. 55)

3- Di kilasîkên kurdî yê helbestkî de, ji bo hevgirtina hejmara kîteyên rêzikan di cihê hinek tîpên dengdêr de nîşaneyên dabirê tê bikaranîn.

Mînak:

*Ya l'gerdana reng 'ac bibêm*

*Ya l'kofiya zer tac bibêm*

*Hindî metha b'dîbac bibêm*

*Nakim xilas vê qissetê..*

Feqiyê Teyran, Jiyan, berhem û Helbestên Wî

M. Xalid Sadinî, r.372)

4- Ku kurtenivîs û qertaf bihev re bin, nîşaneyên dabirê dikeve navberê.

Mînak:

Rêvebirê BDP'ê daxuyanî da.

YE'yê xwedan bandor e.

Çend endamên NATO'yê hene?

**; XALEBÊHNOK**

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî “nîşaneyê xalebêhnokê”,

bi kirmancî “nuqta-vîrgul (n)”,

bi soranî “wêrgûlî xaldar” (خالداری ویرگولی),

bi tirkî “noktali virgöl işareti”,

bi îngilizî “semicolon”,

bi farisî “nuqte vîrgule” (ویرگول نقطه),

bi erebî “al-fasile al-menqûte”

(المنقوطة الفاصلة)

tê binavkirin.

Di xwendinê de, rawesta di pey nîşaneyê xalebêhnokê, bi qasî nefeseke normal e.

Di hevokê de peyva ji nîşaneyê xalebêhnokê şunde tê bi tîpa hûrdek destpê dîke.

**Di nivîsê de cihên ku nîşaneyê xalebêhnokê tê bikaranîn jê hinek ev in:**

1- Nîşaneyê xalebêhnokê, dikeve navbera hevokên bi hev ve girêdayî.

Mînak:

*Nan pîr, pîvaz pîr; gelo ew çima mir!*

*Elegez birinc be, Erez jî rûn be; heke bergîdan tune be, dîsan dê pûç be!*

*Biharê pez, payîzê rez, zivistanê; ez û ez!*

2- Di ferhengên de, ji bo veqetandina peyvên wateyek, nîşaneyê bêhnokê; ji bo veqetandina peyvên watecuda nîşaneyê xalbêhnokê tê bikaranîn.

Minak:

*Teşe: awa, cure, dirûv; şêwe; terz*

*Bûjen: madde, materyal; malzeme, amûrîn, kerese*

3- Jihev veqetandina komepeyvên di heman hevokê de bi nîşaneyê xalebêhnokê dibe.

Mînak:

*Di pola yekem de Azad û Arî; di pola duyem de Nur, Zelal û Agir; di pola sêyem de Zerdeşt, Arî û Zal serkeftî ne.*

*Buhayê kartol, tivir û gizêra erzan; sêv, porteqal û mandalînaya zêde ye.*

**: XALECOT**

Ev nîşaneya;

bi kurmancî “nîşaneya xalecotê”,

bi kirmancî “di nuqtayî (zh)”

bi soranî “du xal” (طه خال),

bi tirkî: “iki nokta üst üste”,

bi îngilizî “colon”,

bi farisî “do nuqte” (دونقطه),

bi erebî “al nuqtetan” (النقطة)

tê binavkirin.

Di xwendinê de nîşaneya xalecotê, seknekê ya bi qasî nefeseke tam nîşan dide.

Ji nîşaneya xalecotê şunde karakterekî valahiyê tê danîn.

**Di nivîsê de cihên ku nîşaneya xalêcotê tê bikaranîn jê hinek ev in:**

1- Di dawîya peyv û hevokê de ku peyvên diyarkirin, ravekirin û mînak hebin; nîşaneyên xalecotê tê danîn.

Mînak:

*Gelş: Zîlên ji rêwekan nû derketî re “gelş” tê gotin.*

*Bira: Ji kesê, dê û bav yek û zayend nêr re “bira” tê gotin.*

*Pênc: Jimareya di pey çara tê, ji çara yek zede re “pênc” tê gotin.*

2- Di nav hevokê de ku nîşaneyên xalecotê hebe, peyva di pey de tê, bi tîpa hûrdek dest pê dibe.

Mînak:

*Navê çend pincaran rêz dikim: sêbiske, selmask, gezgezk, pûng, cetirî û hwd.*

*Tîştên ku zîman, dîkin zîman evin: alfabe, rêzîman, rastnivîs û ferheng.*

3- Di nivîsê de ku nivîs û gotinên kesên din hebin di paş navên wan de nîşaneyên xalecotê tê danîn û peyva di pey de tê, bi tîpa girdek dest pê dibe.

Mînak:



*Ehmedê Xanî:*

*Ez mame di hîkmeta Xwedê da*

*Kurmanc di dewleta dinê da*

*Aya bi çi wechê mane mehrûm?*

*Bîlcumle ji bo çi bûne mehkûm?*

*Zahirî, gasî kir: "Hevalno, bisekinin, ez ê jî werim."*

4- Li pey nîşaneyê xalecotê ku hevokeke serbixwe hebe, bi tîpa girdek destpê dike.

Mînak:

*Hevenav: Navdêrên ku tiştên wekî hev tînin zimên ji wan re hevenav tê gotin.*

5- Li pey nîşaneyê xalecotê ku rêzepeyv werin, peyv bi tîpa hûrdek dest pê dike.

Mînak:

axaftin: peyvîn, qisekirin, xebirdan, gotûbêj, guftugo, şorkirin ...

6- Nîşaneyê xalecotê di navnîşanên malperên înternetê de jî wek hêmanekî tê bikaranîn.

Mînak:

<http://www.tzpk.com>

<http://www.enstituyakurdi.org>

7- Di nîşandana saet, xulek û çikeyan de nîşaneyê xalecotê tê bikaranîn.

Mînak:

10:20:30

08:45:15

8- Nîşaneyê xalecotê di matematîkê de wek nîşaneyê dabeşê tê bikaranîn.

Mînak:

$4:2=2$

$24:8=3$

... SÊXAL

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî “nîşaneyê sêxalê”,

bi kirmancî “hîrê nuqtayî (zh)”,

bi soranî “sê xal” (سێ خا),

bi tirkî: “üç nokta”,

bi îngilizî “ellipsis”,

bi farisî “sê noqte” (نقطه سه),

bi erebî “selas nuqat” (نقاط ثلاث),

tê binavkirin.

Nîşaneyê sêxalê di nivîsê de bi piranî di cihê peyv û hevokên nenivîsandî dê tê bikaranîn.

Ku di nava hevokê de nîşaneyê sêxalê bê danîn divê di serî û dawiyê de valahîyek bê danîn ji ber ku ew di cihê hêmaneke hevokê de hatiye danîn.

**Di nivîsê de cihên ku nîşaneyê sêxalê tê bikaranîn jê hinek ev in:**

1- Dema hevok ji ber sedemekê bi dawî nebe, hinek peyv neyên nivîsandin di şûna wan de nîşaneyê sêxalê tê danîn.

Mînak:

*Ez dizanim ez ê çî bikim ...*

*Ku min zanîngeh bi dawî kir ...*

*Naxwazim gilî bikim lê rewşeke ...*

2- Di nava nivîsê de tiştên nenivîsî bi sêxalê tîn nişandan.

Mînak:

*Îro yeke bi navê ... hat.*

*Ji bajarê ... ê çar kes beşdar bûn.*

3- Nivîs an gotinên ji derekê vergirtî, eger bi temamî neyên nivîsîn; ew yên nenivîsî bi nîşaneyê sêxalê tîn nişandan.

Mînak:

...

*Zîman, bêguman ji bo derbirin, danasîn û binavkirina hemû heyîn û heyberên xwezayê hîm û hêmaneke pir girîng û watedar ya bivênevê ye.*

...

Zîman û Wêje, Adar Jiyan, Zend 16, r. 67

4- Hinek nivîskar di nivîsan de nîşaneyê sêxalê di şûna kurtenivîsa “hwd” de datînin.

Mînak:

*Di çentê wî de pêûs, jêbir, lînûs ... pêdiviyên nivîsandinê hebûn.*

5- Di gotebêjan de di dewsa bersivên nedayî de nîşaneyê sêxalê tê bikaranîn.

Mînak:

– *tu kî yî?*

– ...

– *çima deng nadî?*

– *ditirsim...*

– *Ji kê ditirsî?*

– ...

6- Di nivîsê de peyvên (deredepe, nebaş, ne hêjayî gotinê) bi nîşaneyê sêxalê tên nişandan.

Mînak:

*Ji te tu ... dernakeve!*

*Ew gotênên wî ... ne hêjayî gotinê ne.*

Ez pir bi hêrs bûm, ... çî hate zimanê min mê jê re rêz kir.

7- Ji bo wate xurtkirinê di pey nîşaneyên baneşan û pirsnîşanê de tê bikaranîn.

Mînak:

Di pey derî de dengê hat.

– Tu kî yî?...

– Ez Elî...

– Dibe tu Elo yê Huso yî!...

– Belê, ez im...

..... **RÊZEXAL**

Ev nîşaneya;

bi kurmancî “nîşaneya rêzexalê”,

bi kirmancî “rêzenuqtayî (zh)”,

bi soranî “rêzexal” (رێزخال),

bi tirkî “sıra noktalar”,

bi îngilizî “ ”,

bi farisî “noqte çîn” (نقطه چین),

bi erebî “ ( )

tê binavkirin.

**Di nivîsê de cihên ku nîşaneyê rêzexalê tê bikaranîn jê hinek ev in:**

1- Di nivîsan de rêzîkên nenivîsî bi nîşaneyê rêzexalê tîn nîşandan.

Mînak:

***Ey Heval Robson***

.....

*Ey heval Pol Robson,*

*Derdê min û te, ev derdê giran,*

*Zordestiya ku kete nav cîhan,*

*Hin mezin, bilind,dehqan, xanedan,*

*Hin reben, bindest, mane perişan.*

.....

*Karker û rênçber, cotyar şiyar bûn,*

*Reben, perişan bi hev re rabûn,*

*Bi tang û top diçin şer û ceng,*

*Li her der Qêrîn, li her der Hawar,*

*Li hawîr bû deng,*

*Dixwazin azadî, serbestî, wekhevî.*

.....

.....

(Cegerxwîn, Tarîxa Edebiyata Kurdî, Prof. Qanatê Kurdo, r. 201)

2- Di ezmûnan de, di nivîsên hînkirinê de; cihên vala mayî, bi nîşaneyên rêzaxalê tê nîşandan.

Mînak:

*Kovara ..... di sala 1937'an de li Şamê, bi zimanê kurdî, dest bi weşanê kir.*

*Meriv dikare bibêje ku bingeha zimên alfabe, ....., ....., ..... e.*

## **! BANEŞAN**

Ev nîşaneyên;

bi kurmancî “nîşaneyên baneşanê”,

bi kirmancî “înterjeksîyon (n)”,

bi soranî “sersurman” (نسر سورما), (sersurman),

bi tirkî “ünlem işareti”,

bi îngilizî “**exclamation mark**”

bi farisî “‘elamtê te’ecob” (تعجب بعلامت),

bi erebî “‘elame al-ta'ecub” (التعجب علامة)

tê binavkirin.



Nîşaneyê baneşanê, di nivêse de ji bo baldariyê/bal kişandinê tê bikaranîn.

Eger di pey nîşaneyê baneşanê peyveke din bê divê ji baneşanê şun de valahiyek bê danîn.

Di xwendinê de nîşaneyê baneşanê rawestekê ya bi qasî nefeseke normal jî nîşan dide.

**Di nivêse de cihên ku nîşaneyê baneşanê tê bikaranîn jê hinek ev in:**

1- Di pey peyv û hevokên ku hestekê; bangê, tirsê, hêviyê, şaşwaziyê, nifirê û hwd diyar dikin; di dawiya wan de nîşaneyê baneşanê tê danîn.

*Mînak:*

*Ax!*

*Eywax!*

*Hewar!*

*Gelî birano!*

*Na lo! Nabe tiştê wisa!*

*Ev çî bextewariye!*

*Gulê por kûr ê!*

*Birevin hurç tê!*

*Tû yê mala me wêran bikî!*

*Xwedê misteheqê te bide!*

2- Di pey peyv an hevokên hişyariyê de nîşaneyên baneşanê tê danîn.

Mînak:

*Hevalno!*

*Guhdarbin!*

*Ji xew ra neçin!*

3- Ji bo diyarkirina tirane, biçûkxistin û qerfê di pey peyv an hevokên têkildar de baneşan di nava kevanê de tê danîn.

Mînak:

*Pir welatparêz e (!) bi kurdî napeyive.*

Ev kesê zane (!) tu pirtûkek nexwendîye.

Camêr (!) bi xiyanetê temijî ye .

Dibêje 100 mêtroyî ez di 2 (!) kêliyan de direvim.

4- Ji bo xurtkirina wateya baneşanî carinan du (!!), carinan sê (!!!) nîşaneyên baneşanê di pey hev de tê danin.

Mînak:

– Tu bi aqilî, xuya ye!!

– Ez dibêjim, tu bi aqilî!!

– Ji meleyê sibehê de erd cot dîke.

– Erdê kê?

– Erdê wan.

– Haaa!!!

(Mêrê Avis, Helîm Yûsiv)

Heeeeeeeeeey

!!!

Lingan patipat

e, mal

diheje

hêhêêy

!!!

Wey

Zerê

zer

Zerê

zer

Zivistan e har û der....

(Marîne Siyabend, Rojnameya Zagros, Ermenistan)

## ? PIRSÎŞAN

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî “nîşaneyê pirsîşanê”,

bi kirmancî “nîşanê perse (n)”,

bi soranî “Hêmay Pirsyar” (هیمای پرسیار)

bi tirkî “soru işareti”,

bi îngilizî “**question mark**”,

bi farisî “elametê Soal” (علامت سوال),

bi erebî “elame al-istifham”

(علامة الاستفهام)

tê binavkirin.

Nîşaneyê pirsîşanê, di dawiyê hevokên pirsyarî de tê bikaranîn. Carinan bi wateya “*bi guman bûn*”, “*ne mîsogerî*”, “*ne diyarî*” û hwd di nav kevanan de dikeve nav hevokê jî.

Di xwendinê de ji nîşaneyê pirsîşanê şunde rawestinke bi qasî nefeseke normal pêwîst e.

Ku di pey pirsîşanê de peyvek an hevokê hebe, divê ji pirsîşanê şunde valahiyek bê danîn.

**Di nivîsê de cihên ku nîşaneyê pirsîşanê tê bikaranîn jê hinek ev in:**

1- Di dawiyê hevokên pirsyarî de nîşaneyê pirsîşanê tê danîn.

Mînak:

*Çi ye?*

*Kingê?*

*Ma tu nehatî malê?*

*Tê kingê derkevî betlanê?*

2- Di pey peyv û jimareyên nemîsoger, nediya û biguman de nîşaneyên pirsnîşanê di nava kevanê de dikeve nava hevokê jî.

Mînak:

*Jidayikbûna wî 1407 (?), mirina wî 1472 ye.*

*Lêkolînên heyî sedsala 16'an (?) destnîşan dikin.*

*Dibêjin mirina wî li bajarê Efrînê (?) ye.*

3- Di dawiya hevokên ku bersiva xwe di nav xwe de digirin jî nîşaneyên pirsnîşanê tê danîn.

Mînak:

*Ne jixwe berxwedan, jîyan e?*

*Ji mezinan re rêzgirtin, ma ne karekî bi rûmet e?*

4- Di hinek hevokan de peyvên pirsê hebin lê ew ne hewokên pirsê bin, di dawîya wan de nîşaneyên pirsnîşanê nayê danîn.

Mînak:

*Çima çû, ez nizanim.*

*Ew ê çî bêje, ne diyar e.*

*Ew ê bike an neke, ez nizanim.*

*Min bi çendan kirî, nayê bi bîra min.*

5- Carinan di hevokên kumancî de bi derbgotinê jî hevoka pirsyarî çêdibe, di nivîsê de divê di dawîya wan de jî nîşaneyên pirsnîşanê bê danîn.

Mînak:

*Navê te?*

*Te dît?*

*Ev pênusa te ye?*

5- Di nav heman hevokê de, peyv û hevokên pirsyarî, di pey hev de rêzkiî bin; di navbera wan de nîşaneyên bêhnokê tê danîn û tenê yek nîşaneyên pirsnîşanê tê herî dawiyê.

Mînak:

*Ev hingiv; ji Agirî, ji Qersê yan ji Erzînganê ye?*

*Tu li ku dimeşî; kolanan, sikakan an serê çiyên?*

6- Nîşaneyên pirsnîşanê ku di nava kevanê de tê nişandan, ew wateya tirane û biçûkxistinê dide peyv û hevokên beriya xwe.

Mînak:

*Çi xweşmêr e (?)*.

*Camêr, rast (?) dibêje.*

*Çi mêrxas e (?)*

7- Ku di hevokê de, nîşaneyê pirsnîşanê û nîşaneyê baneşanê di pey hev de bèn danîn ya di pêş de tê nivîsandin nîşaneyê pirsnîşanê ye.

Mînak:

- *Lê ez bextreşê Xwedê çi bikim, Nûrî?! Riya din ew e ku ez wê bişînim mala bavê wê.*

(Çîrokên Hejdeh Salan, Şahîne Bekirê Sorekî, r. 98)

*Bi lîstikên hijmendî (!?) berevajî kirina rastiyan, gelo karekî baş e?*

(" ") DUNIK

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî "nîşaneyê dunikê",

bi kirmancî "citenênûg (n)",

bi soranî

bi tirkî "çift tırnak işareti",

bi îngilizî "duble **question mark**"

bi farisî "elameti neqli qul" (علامة نقل قول),

bi erebî "elamet al-iqtibas" (علامة الاقتباس)



tê binavkirin.

**Di nivîsê de cihên ku nîşaneyê dunikê tê bikaranîn jê hinek ev in:**

1- Di nivîsê de, peyv û hevokên jibergirtî, di nava dunikê de tîpên nişandan.

Mînak:

*Celadet Bedirxanî, nêzî sed sal berê dibêje ku: "Şerma mezin ew e ku meriv nezanê xwendin û nivîsandina zîmanê xwe be!"*

*Xanî, dibêje ku: "Vî wextî herkes mîmarê dîwarê xwe ye"*

*Şêx Seîd digot: "Rojekê wê zaroyên kurdan rabin û pirsyara min bikin." Ev rastî pey çend salan derket holê...*

2- Ji bo cihêkirinê; tîp, peyv û hevokên cihêreng di nava dunikê de tîpên nişandan.

Mînak:

*"jin", "jîn" û "jan" bi tîpa navîn jihev diqetin, herdu tîpên din wekhev in.*

*Peyva "serxwebûn" ji sê kêteyan pêkhati ye.*

*Meta min, ji min re digot "berxa min".*

3- Di navnîşanên, çavkaniyê (biblografîkî) de ku çavkanî pirtûkeka serbixwe nebe, meqale be di nava dunikê de tên nişandan.

Mînak:

*Jiyan, Adar; "Ziman û Wêje", Zend Rêzepirtûk, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Zizistan 2011, Hejmar 15, r. 67-71*

4- Nîşaneyên; wekî xal, bêhnok, pirsnîşan, baneşan hwd. ku têne **dawiya peyv û hevokên di nav dunikan de nîşankirî**, divê ew jî di nav dunikan de bimînin.

Mînak:

*Mêvan: "Tu mêvana qebûl dikî?"*

*Mazuwan: "Çawa mêvana qebûl nekim, ma em ne camêr in?!"*

‘ ‘ **YEKNIK**

Ev nîşaneyên;

bi kurmancî "yeknik",

bi kirmancî "nênûg (n)",

bi soranî “ ( ),

bi tirkî “tek tirnak îşareti”,

bi îngilizî “single quotation mark”

bi farisî

bi erebî “ ( )

tê binavkirin.

**Di nivîsê de cihên ku nîşaneyê yeknikê tê bikaranîn jê hinek ev in:**

Gotinên di nav gotinan de carinan di nav yeknikan de tê nîşandan.

Mînak:

*Pirsek jî ev bû: “Di nav helbestên Cegerxûn de girîngiya helbesta ‘Kî Me Ez`çi ye?”*

*Ew dibêje ku Azadî “ji min re gotiye `ez ê werim` lê nehatiye.”*

“ “ **DUBAREK**

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî “dubarek”,

bi kirmancî “nîşaneya dubarek (n)”,

bi soranî “ “ ( ),

bi tirkî “den den işareti”,

bi îngilizî “duble quotation mark”

bi farisî “ “ ( ),

bi erebî “ “ ( )

tê binavkirin.

Di nivîsên li bin hev rêzkerî de ji bo heman peyv dubare neyê nivîsandin şûna wan peyvan nîşaneya dubarekê tê danîn.

Mînak:

*Pêşgirên ku navdêran pêk tînin*

*Navgirên “ “ “ “*

*Bergirên “ “ “ “*

**^ KUMIK**

Ev nîşaneya;

bi kurmancî “kumik”,

bi kirmancî “kumik (n)”,

bi soranî “elamet sekun” (علامت سکون),

bi tirkî “düzeltme işareti”,

bi îngilizî “caret”

bi farisî “Elmeti sokon” (علامت سکون),

bi erebî “elamet elskun (علامة السكون)

tê binavkirin.

Nîşaneyê kumikê, di hinek zîmanan de bi wateyên cûda têne bikaranîn.

Celadet Elî Bedirxanî bi saya nîşaneyê kumikê di alfabeya kurdî de sê tîpên nû çêkirine.

Mînak:

Ji “E e” yê Ê ê, ji “I i” yê Î î,

ji “U u” yê “Û û” çêkirî ye.

**/ DABEŞ**

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî “dabeş”,

bi kirmancî “nîşanê cîyakerdişî (n)”,

bi soranî “dabeş” (دابەش),

bi tirkî “taksim işareti”,

bi îngilizî “**slash mark**”,

bi farisî “xetê mowerem” (خط مورم),

bi erebî “xet al-mail” (خط المائل)

tê binavkirin.

Ji vê nîşaneyê re bi kurmancî “xwarxêzek” jî tê gotin.

**Di nivîsê de cihên ku nîşaneya dabeşê tê bikaranîn jê hinek ev in:**

1- Nîşaneya dabeşê, di nivîsê de carinan cihê “an”, “yan” û “an jî”yê digire.

Mînak:

*Ewî/ê got.*

*Sax/mirî*

*Rast/nerast*

2- Nîşaneya dabeşê, di nivîsê de carinan wateya “her”ê digire.

Mînak:

*60km/saet (di her saetê de 60 km)*

*5 car/ (di her rojê de 5 car)*

3- Nîşaneyê dabeşê, di nivîsê de carinan wateya "dabeş"ê digire.

Mînak:

*3/4 (ji çarê sê)*

*7/25 (ji pîstûpêncê heft)*

4- Rêzikên helbestê dema li cem hev tên nivîsîn, di navbera rêzikan de nîşaneyê dabeşê tê danîn.

Mînak:

*Min hêvî heye ji ehlê halan / Teqbîhi ne kin evan tîfalan / Ev mewe eger ne abîdar e / Kurmanci  
ye ew qeder li kar e / Ev tîfle eger ne nazenîn e / Nûbar e bi min qewî şîrîn e / Ev mêwe eger ne  
pîr lezîz e / Ev tîfle bi min qewî 'ezîz e*

(Ji Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Amadekar: Huseyn Şemrexî, r: 52-53)

Wek li jor jî xuya ye di vî têşeyî de divê li her aliyên dabeşê de valahiyek bê danîn.

5- Nîşaneyê dabeşê, di nîşandana dem, serdem û vedoran (perîyot) de tê bikaranîn.

Mînak:

10/01/2009

*Di avrêl/gulanê de*

*Bernameya dorsala 2008/2009'an*

6- Nîşaneyê dabeşê, di navnîşanên înternetê de tê bikaranîn.

Mînak:

<http://www.ferheng.org/>

<http://www.google.com.tr/>

\ DABEŞA ÇEP

Ev nîşaneyê;



bi kurmancî “nîşaneyê dabeşa çep”,  
bi kirmancî “nîşanê cîyakerdişê yo çep (n)”,  
bi soranî “ “ ( ),  
bi tirkî “ters taksim işareti”,  
bi îngilizî “backslash”  
bi farisî “ “ ( )  
bi erebî “ “ ( )  
tê binavkirin.

Nîşaneyê dabeşa çepê bi pîranî di bernameyê nivîsbarî ya kompîturê de tê bikaranîn.

Mînak:

C:\Dos>MD \Play

## **( ) KEVANEK**

Ev nîşaneyê;  
bi kurmancî “kevanek”,  
bi kirmancî “parantez (n)”,  
bi soranî “kewan” (كهوان)  
bi tirkî “yay ayraç/parantez”,

bi îngilizî “round brackets/parentheses”,

bi farisî “perantêz” (پرانتز)

bi erebî “qews” (قوس)

tê binavkirin.

Ji du kevanan pêk tê: kevaneka çepê û kevaneka rastê. Her yek bi sere xwe wek “çepkevanek (“ û “rastkevanek)” tê binavkirin.

**Di nivîsê de cihên ku nîşaneyê kevanekê tê bikaranîn jê hinek ev in:**

1- Di heman hevokê de ku ravekirina hinek peyvan hewce dike, bi piranî di nav kevanekan de tê nivîsîn.

Mînak:

*Alfabe, rêziman (grammer) û ferheng bi hev re zimên ava dikin.*

*Sê kes (ên ji pola 2’yemîn) û çar kes (ên ji pola 3’yemîn) bi temamî heft kes neserkeftî ne.*

2- Bîçima dirêj ya kurtenivîsan di nav kevanekan de tên ravekirin.

Mînak:

*DYA (Devletên Yekbûyî yên Amerîkayê)*

YE (Yekîtiya Evrupayê)

3- Carinan di pey tîp an jimareyên rêzîn de kevaneke rastê tê danîn.

Mînak:

A), B), C), D)

1), 2), 3), 4)

{ } KEMBERKEVANEK

Ev nîşaneyên;

bi kurmancî “nîşaneyên kember kevaneke”,

bi kirmancî “Parentezo hewqîn (n)”,

bi soranî “ ( ) ”

bi tirkî “ayraç”,

bi îngilizî “brackets”,

bi farisî “ ( ) ”

bi erebî “ ( ) ”

tê binavkirin.

Nîşaneyê kemberkevanekê, bi piranî ji bo bi hev re nişandana komên peyv, hevok an jî jimareyan tê bikaranîn. Di vegotinên dersan de bi piranî di mijarên matematîk, kîmya, fizîk û hwd. de tê bikaranîn. Di nav nîşaneyên nivîsê de ya ku herî bout guherok e. Goreyî mijaran dirêjaya wê tê guhert in.

## [ ] KOŞEKEVANEK

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî “nîşaneyê koşe kevanek”,

bi kirmancî “parentezo goşeyin (n)”,

bi soranî “ “ ( )

bi tirkî “köşeli ayrıç”,

bi îngilizî “curly brackets”,

bi soranî “ “ ( )

bi erebî “ “ ( )

tê binavkirin.

1- Carinan ku hewce dibe di hevokê de kevan di nav kevanan de tê bikaranîn. Di vê rewşê de kevanek û koşekevanek bihevre tê bikaranîn.

Her tim di hundir de *kevanek* di derve de *koşekevanek* tê bikaranîn.

Mînak:

*Mîrata bêjeya kurdî a nivîskî pir dewlemend e. [Di nav mîrata bêjeya kurdî de paya herî bilind a (klasîkan) e].*

2- Kemberkevanek û koşekevanek bi piranî di matematîk û geometriyê de tèn bikaranîn.

Mînak:

$$[(2 \times 3) + (9 - 3) \cdot 7] = ?$$

3- Nîşaneyên kevanek, kemberkevanek û koşekevanekê di zimanê bername sazkirina komputeran de jî tê bikaranîn.

Mînak:

PHP: `function (& $veri ) { for( $i = 0 ; $i < count ( $veri [ 0 ] ); $i ++ ) &n.`

- **BENDIK**

Ev nîşaneyên;

bi kurmancî “nîşaneyên bendik”,

bi kirmancî “hezika kilme (n)”,

bi soranî “ “ ( )”,

bi tirkî “kısa çizgi”,

bi îngilizî “en dash”,

bi farisî “ “ ( )”,

bi erebî “ “ ( )

tê binavkirin.

**Di nivîsê de cihên ku nîşaneyê bendikê tê bikaranîn jê hinek ev in:**

1- Carinan di pey tîp û jimareyên rêzkirinê de nîşaneyê bendikê tê danîn:

Mînak:

*a- pêşgir*

*b- navgir*

*c- paşgir*

*1- kirde*

*2- bireser*

*3- lêker*

2- Di kîtandina peyvê de nîşaneyê bendikê datînin navbera kîteyan.

Mînak:

*Sazûmankirin, sa-zû-man-ki-rin*

*Kemberkevanek, kem-ber-ke-va-nek*

3- Di nivîsê de ku peyvek di dawiya rêzikê de hilneyê, ew peyv tê veqetandin, bendikek tê navbera kîteyan, yên mayî di rêzika jêrîn de tînin nivîsandin. Di vê rewşê de bendik wek *xêzika kîtebir* tê bikaranîn.

Mînak:

*Çûye dibistana seretayî lê di nivî de teri-kandiyê.*

*Mamoste dersa xwe baş dibe lê ku xwen-dekar guhnedinê jêşûdgirtin nabe.*

4- Di nav hevokê de peyv û jimareyên tîkildar hebin navbera wan de bendikêk tê danîn.

Mînak:

*Kurdî zimanekî Hînd-Ewropî ye.*

*Du-sê kilo bes e.*

*Ehmedê Xanî (1651-1707)*

*Feqiyê Teyran (1590-1660)*

5- Di nivîsê de tiştên bi hûrgilî carinan di nava du bendikan de tê nîşandan.

Mînak:

Çiyayê Agirî, bi bilindahî û heybeta xwe ve -ji Bazîd, Îdir, Erîvan, Naxçivan û Maku yê tê xuya- li ber çavê me bû.

6- Di daxuyaniyên rêzimanî de, di nîşandana paşgir û paşgiran de nîşaneyên bendikê tê bikaranîn.

Mînak:

în- *havîn, zêrîn, germîn*

dar- *sîwan, sîdar, dengdar*

bi- *bikir, bikuj, bivir*

-ayî *şînayî, keskayî, berdayî*

-çe *baxçe, navçe, xaliçe*

-ik *berik, kurik, sorik*

7- Carinan bendik di wateya gihanekî de tê danîn.



Mînak:

*Ferhenga kurdî-tirkî (Ferhenga kurdî û tirkî)*

*Rêya Amed-Mêrdînê (Rêya Amed û êrdînê)*

8- Di matematîkê de wekî nîşaneyê (-) kêmekê tê bikaranîn.

Mînak:

$4-2=2$  (çar kêmek du yeksan du)

$34-12=22$  (sîh û çar kêmek dazdeh yeksan bîst û du)

#### — XÊZEKA AXAFTINÊ

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî "xêzika axaftinê"

bi kirmancî "xêzika qîseykerdişî (m)"

bi soranî " ( ) "

bi tirkî "konuşma çizgisi"

bi îngilizî "em dash"

bi farisî " ( ) "

bi erebî “ ( )

tê binavkirin.

Jê re "xêzika axaftinê" û "xêzika dirêj" jî tê gotin. Bi piranî di çîrok û gotebêjan de tê bikaranîn.

1- Di vegotinê de, ji bo diyarkirina axaftina kesan nîşaneyê xêzekê tê serê axaftinan.

Mînak:

*Masî got:*

— *Xwe li nezaniyê daneyîne.*

*Kevcarê got:*

— *Ha! Te beq dît tu lewma wisa difikirî?*

*(Masîreşê Biçûk, Samed Behrengî, Amedekar: Mihemed Ronahî, r: 16)*

Nîşe: Ku axaftin, di nav dunikan (“”) de nîşandayî be nîşaneyê xêzekê (—) nayê sere gotinê.

Mînak:

Masî got: “Xwe li nezaniyê daneyîne”.

Kevcarê got: “Ha! Te beq dît tu lewma wisa difikirî?”

*(Masîreşê Biçûk, Samed Behrengî, Amedekar: Mihemed Ronahî, r: 16)*

**BINXET**

Ev nişane;

bi kurmancî “binxet”,

bi kirmancî “binxet”,

bi soranî “ ( )

bi tirkî “altı çizili”,

bi îngilizî “underline”

bi farisî “ ( )

bi erebî “ ( )

tê binavkirin.

Ji vê nîşaneyê re "xêzeka binî" jî tê gotin. Ji bo nîşandana girîngî û balkişandinê carinan binê hinek peyv an hevokan tê xetkirin.

Mînak:

*Ew ê ku malê xwe winda kiriye tişte winda kiriye*

*Ew ê ku rûmeta xwe winda kiriye pir tişt winda kirine*

*Ew ê ku wêrekiya xwe winda kiriye her tişt winda kiriye*

## .\_ XALXÊZEK

Ev nişane;

bi kurmancî “xalxêzek”,

bi kirmancî “xezika nuqtayine (m)”,

bi soranî “ ( )

bi tirkî “noktalı uzun çizgi”,

bi îngilizî “dot-dash”

bi farisî “ ( )

bi erebî “ ( )

tê binavkirin.

1- Nîşaneyê xalxêzekê, carinan di rêzkirina beşên mijaran de, di sere beşan de tê bikaranîn.

Mînak:

*Hêmanên hevokê:*

.\_ *kirde: kirar, peyvên kirarê kar nîşan didin.*

.\_ *rengdêr: hevalnav, peyvên ku rewşa heyberan diyar dikin.*

.\_ *cînavk: peyvên ku li şûna navdêran tên bikaranîn.*

.\_ *hoker: peyvên ku rewş û mercên pêkhatina lêkeran nîşan didin.*

.\_ *lêker: peyvên ku karê di hevokê de tê kirin nîşan didin.*

1- Şûna parjimarên nediyarkirî de nîşaneyê xalxêzekê tê danîn:

Mînak:

8.\_ *lira*

23.\_ lîra

(~) KEVANXÊZIK

Ev nişaneya;

bi kurmancî “nîşaneya kevanxêzikê”,

bi kirmancî “nîşanê tîldeyî (n)”,

bi soranî “ “ ( ),

bi tirkî “tilde işareti”,

bi îngilizî “swung dush/tilde”

bi farisî “ “ ( )

bi erebî “ “ ( )

tê binavkirin.

1- Nîşaneya xwarxêzekê, bi piranî di ferheng û ansîklopediyên da tê bikaranîn. Di ber “Peyva sereke” nîşaneya kevanxêzikê tê danîn.

Mînak:

*Pispor: nd/rd zanayê pişeyekî, babetekî, ~ê hîndekariyê, ~ê hesaban, ~ê hunerê*

2- Di hinek zimanên de bi saya nîşaneya xwarxêzekê hinek tîpên nû/cüda çêkirine.

Mînak:

Ãã, Õõ, ƦƦ, Ûû, Ññ

Ev û hineke din yên bi saya wan tîpên nû/cûda tên çêkirin wek **nîşaneyên dîakrîtîk** (pathognomonic) têne bi navkirin.

Di alfabeya kurdî ya bi tîpên latînî de bisaya nîşaneyên dîakrîtîk ev tîpên li jêrê hatine çêkirin:

Çç, Êê, Îî, Ûû, Şş,

Di alfabeya tirkî ya bi tîpên latînî de bisaya nîşaneyên dîakrîtîk ev tîpana hatine çêkirin:

Çç, Şş, Ğğ, Üü, Öö, â, û, ı, î ve I

Ji bo agahiyên zede, binere:

<http://en.wikipedia.org/wiki/Diacritic>

û

[http://tr.wikipedia.org/wiki/Diyakritik\\_i%C5%9Faretler#.28\\_.7E\\_.29\\_tilde](http://tr.wikipedia.org/wiki/Diyakritik_i%C5%9Faretler#.28_.7E_.29_tilde)

**Ji îşaretên dîakrîtîk hinek**

(<sup>ˆ</sup>) jorexal (superdot)

Çç Ğğ Žž I

(. ) subdot (altnokta)

ƘƘ Mm Rr

( , ) cedilla (çengel)

Çç Şş Țț Țț Țț Țț Țț Țț

( , ) çengeloka çep (ogonek)

Ąą Ęę ǐǐ ǓǓ ǒǒ

( ° ) helqe (ring)

Åå Ůů

( ~ ) Kumikê bervajkî (breve)

Ăă Ěě Ĭĭ Ŏŏ Ūū

( ^ ) jorexêzek (macron)

Āā Ēē Ōō Īī Ūū

(¨) jorecotxal (diaeresis)

Öö Üü Ää Ęę Ĭĭ

Ñ N ya bi tîlde

( ` ) grave (aksan imi)

Àà Èè Òò Ìì Ùù

( ´ ) nîşaneyê tundî (acute accent )

Áá Éé Íí Óó Úú

( ^ ) kumik (circumflex)

Ââ Êê Îî Ôô Ûû Ĵĵ Śś Ğğ Ćć

( ˇ ) kumikê berevajî (caron)

Řř Čč Šš Žž

“ dunik

Ŕŕ Úú

~ kevanxêzek (tilde)

Ăă Őő Ŧŧ Ūū Ńń

°C            **RADEK**

Ev nişane;

bi kurmancî “radek”,

bi kirmancî “derece”,

bi soranî î (راده) (rade)

bi tirkî “derece”,

bi îngilizî “degree symbol”

bi farisî “derece” (درجه),

bi erebî “derece” (درجه)

tê binavkirin.

∞

**BÊDAWÎNEK**

Ev nişane;



bi kurmancî “nîşaneyê bêdawînekê”,

bi kirmancî “karaktera vengîye (m)”,

bi soranî “ ( ) ”

bi tirkî “boşluk karakteri”,

bi îngilizî “blank/space character”

bi farisî “ ( ) ”

bi erebî “ ( ) ”

tê binavkirin.

## & û

Ev nişane;

bi kurmancî “sembola û”,

bi kirmancî “sembola û (m)”,

bi soranî “remzî û” (مزیره و)

bi tirkî “ve işareti”,

bi îngilizî “ampersand”

bi farisî “ve”(و),

bi erebî “elamet-el-waw” (الواو علامة)

tê binavkirin.

Ev nişane, bi heman wateyê carinan li şûna “û”yê tê bikaranîn. Nîşaneyê “&” despêke de di zimanê îngilizî de ji bo kurtnivîsîna peyva “and” hatiye bikaranîn. Ji bihevre nivîsandina tîpên “E” û “t”, “Et”ê çêkirine. Bi piranî kesên sêwirîner vê nîşaneyê di dawetiyê û lewheyên reklaman de bikaranîn.

Mînak:

*Evîn & Emîn*

*Zelal & Egît*

*D & G*

*Elektrîk & Elektronîk*

2- Di zîmanê bernamesazkirina komputira de jî ev nîşane tê bikaranîn.

Mînak:

*PHP: function (& \$veri ) { for( \$i = 0 ; \$i < count ( \$veri [ 0 ]); \$i ++ ) &n.*

(%)

**SEDEK**

Ev

nişaneyê;

bi kurmancî “nîşaneyê sedekê”,

bi	kurmancî	“nîşaneyê	sedîye	(n)”,
bi	soranî	“rêjey	sedî”	(سەدی),
bi	tirkî	“yüzde		işareti”,
bi	îngilizî	“percent		sign”

bi farisî “ ( )  
bi erebî “nisbe mîewîye” (نسبة مئوية)  
tê binavkirin.

Di nivîsê da jimareyên sedekî bi nîşaneyê sedekê (%) tî nîvîsandin.

Mînak:

%10 (Ji sedî deh)

%95 (Ji sedî nehwêd û penc)

### (‰) HEZAREK

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî “nîşaneyê hezarek”,

bi kirmancî “nîşanê hezarî (n)”,

bi soranî “rêjey hezarî” (هزارى رێژەى),

bi tirkî “binde işareti”,

bi îngilizî “permille/per thousand sign”

bi farisî “ ( )

bi erebî “nisbe alfîye” (الالفية نسبة)

tê binavkirin.

Di nivîsê de jimareyên hezarekî bi nîşaneyê hezarekê tê nişandan.

Mînak:

*%10 (Ji hezarê deh)*

*%95 (Ji hezarê nod û penc)*

## **Ş ÇENGEL**

Ev nişaneyê;

bi kurmancî “nîşaneyê çengelê”,

bi kirmancî “nîşanê gaçikî (n)”,

bi soranî “ “ ( )

bi tirkî “çengel işareti”,

bi îngilizî “section sign”

bi farisî “ “ ( )

bi erebî “ “ ( )

tê binavkirin.

Ji çengelê re nîşaneyê bendê (paragrafê) jî tê gotin.

Di nişandana xalên yasa, peyman, protokol û hwd tê bikaranîn.

Mînak:

§ 4 (benda çarî)

§ 8 (benda heyştî)

• ÇENGELOK (cedilla)

Ev nîşaneyê, di zimanên cuda de bi mexsedên cuda bikaranîne.

Di alfebeyê kurdî ya bi tîpên latînî de bi lêzêdekirina nîşaneyê çengelokê; ji tîpên “S” û “C” yê tîpên “Ş” û “Ç” çêkirine.

© SEMBOLA MAFÊ XWEYÎ

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî “sembola mafê xweyî”,

bi kirmancî “nîşanê heqê kopyakerdişî (n)”,

bi soranî “ ( ) ”

bi tirkî: “telif hakkı”,

bi îngilizî: “copyright symbol”,

bi farisî: “است محفوظ حقوق همه”

(hemiyê hoqûq mehfûz est),

bi erebî “حقوق الطبع محفوظة”

(huqûq -el tab’ mehfûza)

tê binavkirin.

Nîşaneyê © yê, ji ber tîpa serî ya peyva *Copyright* ya îngilizî hatiye girtin.

Ev nîşaneyê li ser her çi wêne, vîdyo, film û pirtûk hwd. yê berhem û medyayan be; diyar dike ku “her mafê xweyî parastî ye”. Jibergirtin û jêzêdekirin bêdestura xwedî wan nabe, yanî bi rê ya yasa yê, mafê xwedî yê berhemê parastîye.

Mînak:

*Rêzimana Kurmancî*

*Samî Tan*

*ISBN 978-975-6282-54-0*

© *Enstituya Kurdî Ya Stenbolê*

Masîreşê Biçûk

Samed Behrengî

Amedekar: Mihemed Ronahî

*ISBN 978-975-6282-54-0*

© *Ji bilî danasînê bêyî destura nivîskêr û weşanxaneyê bi tu awayî nayê kopîkirin.*

(Masîreşê Biçûk, Samed Behrengî, Amedekar: Mihemed Ronahî, r. 2)

© **MARKEYA TOMARKIRÎ**

Ev nîşaneyê;

- bi kurmancî “nîşaneyê markeya tomarkirî”,
- bi kirmancî “markaya bazirganîye ya tescîlkerdeye (m)”,
- bi soranî “ ( )
- bi tirkî “tescilli ticaret markası”,
- bi îngilizî: “registered trade mark”,
- bi farisî “elametê ticariyê sebtşodê”  
(شد ثبت تجاری علامت)
- bi erebî “elame tîcarîyê musecele qanûnen”  
(قانون مسجلة تجارية علامة)
- tê binavkirin.

Vê nîşaneyê datînine ser “malen ticarî yê tescîlkirî”. Ev sembola li ser her çi malê ticarî hebe “tescilkirî bûyîna” wî malî îşaret dike. Bi gotineke din ev sembola li ser her çi malê ticarî hebe, jibergirtin û jêzêdekirina wî qedexe ye.

Nîşaneyê ® yê ji ber peyva “registered” ya îngilizî girtine.

## TM MARKEYA TICARÎ

- Ev nîşaneyê;
- bi kurmancî “nîşaneyê markeya ticarî”,
- bi kirmancî “markaya ticarî (m)”,
- bi soranî “ ( )
- bi tirkî “ticaret markası/alameti farika”,
- bi îngilizî “trade mark”,

bi farisî “nişaniyê tîcarîyê sebt şodê”

(شده ثبت تجاری نشانه),

bi erebî “elame tîcarîye xêr musecele”

(مسجل غیر تجاریه علامه)

tê binavkirin.

Vê nîşaneyê datînine ser “malên ticarî”.

Nîşaneyê TM’yê, ji ber tîpên serî yê “Trade Mark” a îngilîzî girtine. Ev nîşaneyê li ser her çi malî be, diyarîke ku “ev malî ticarî ye lê hîna bi tescilkirî nîn e”.

@ A YA BIDÛVIK

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî “nîşaneyê a ya bidûvik”,

bi kirmancî “nîşanê etî (n)”,

bi soranî “ ” ( )

bi tirkî “kuyruklu a”,

bi îngilîzî “at sign”

bi farisî “ ” ( )

bi erebî “ ” ( )

tê binavkirin.

@ “et”, sîmgeyêke înternetê ye. Ji alfabeya fransîzî tê lê bilêvkin (telefuz) bi îngilîzî ye, wek “et” e.

Ev nîşaneyê di navnîşanên înternetê de, e-postayê de tê bikaranîn.



Di tîpdanka (kilavyeya) Q yê de, ku tuşa Q û tuşa *alt gr* yê bihev re tê tikandin nîşaneya @ peyda dibe. Di tîpdanka F de, ku tuşa F û tuşa *alt gr* yê bihev re tê tikandin nîşaneya @ ê peyda dibe. Di tîpdanka *numerik* de jî ku 64 dinivîsî nîşaneya @ ê peyda dibe.

Mînak:

[bedirxan@hotmail.com](mailto:bedirxan@hotmail.com)

[bawer@yahoo.com](mailto:bawer@yahoo.com)

[suleyman@gmail.com](mailto:suleyman@gmail.com)

# ÇARXÊZEK

Ev nîşaneya;

bi kurmancî “nîşaneya çarxêzekê”,

bi kirmancî “çarxêzik (n)”,

bi soranî “ ( )”,

bi tirkî “kare/diyez işareti”,

bi îngilizî “number sign”

bi farisî “ ( )”

bi erebî “ ( )”

tê binavkirin.

Ev nîşaneya bi piranî di zimanên Ewropî wek îngilizî, fransizî, almanî, îtalî di wateyên cihê reng tê bikaranîn. Li ser telefonan û dîpdankan (keyboard) de ketiye piraniyê zimanan. Li programên komputeran de jî tê bikaranîn.

**\* STÊRK**

Ev nîşaneya;

bi kurmancî “nîşaneya stêrkê”,

bi kirmancî “astarek (n)”,

bi soranî “estere” (ئەستێرە),

bi tirkî “yıldız imi”,

bi îngilizî “asterisk”,

bi farisî “sitare” (ستاره),

bi erebî “el-necme” (النجمة)

tê binavkirin.

Nîşaneya “stêrk”ê navê xwe ji şexle xwe yê wek stêrkê bûnê digire. Nîşaneya stêrkê bi piranî ji bo nîşe nivîsandinan tê bikaranîn. Di dawiya peyv an hevoka ku derheqê de nîşe danîn hewceye nîşaneya stêrkê tê danîn. Şun de di bin heman rûpelî de pêş de nîşaneya stêrkê tê danîn û berdewamê de daxuyanî tê nivîsîn.

Mînak:

\* *Şerefname, Şerefxanê Bedlisî, r. 423.*

\*\* Mêjûyî Edebî Kurdî, r. 189-213, Elaedîn Secadî, Bexda.

## x<sup>2</sup> JORENIVÎS

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî “jorenivîs”,

bi kirmancî “nîşanê cornuşteyî (n)”,

bi soranî “jornûs” (ژۆرنووس),

bi tirkî “üst simge”,

bi îngilizî “superscript”,

bi farisî “balanivîs” (بالانویس),

bi erebî “murtefe’ “ (مرتفع)

tê binavkirin.

Di hinek nivîsan de ku hewce dike, li jora heman tîp, jimare û peyvan de hinek sembol tên nivîsîn, ji vana re “jorenivîs” tê gotin.

Mînak:

*Germahî 30<sup>0</sup>C ye.*

Baxçeyê malê, wekî 400 m<sup>2</sup> ye.

5 m<sup>3</sup> av, 30 lîra ye.

$$12(5^{-x}+5^{-x})= 13(5^{-x}+5^{-x})$$

## x<sub>2</sub> JÊRENIVÎS

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî “jêrenivîs”,

bi kirmancî “nîşanê cêrnuştevî”,

bi soranî “jêrnûs” (ژێرنووس),

bi tirkî “alt simge”,

bi îngilizî “subscript”,

bi farisî “zîrnivîs” (زیرنویس),

bi erebî “minxfed” (منخفض)

tê binavkirin.


Di hinek nivîsan de ku hewce dike, li jêra heman tîp, jimare û peyvan de hinek sembol tên nivîsîn, ji vana re “jorenivîs” tê gotin.

Mînak:

Formula avê: H<sub>2</sub>O ye.

H<sub>2</sub>O<sub>2</sub> (Hidrogen peroxide)

CA(OH)<sub>2</sub> Calcium hydroxide



(Kimya, Karekök yayınları, r. 111)

<sup>1</sup>Durkheim, p 249

<sup>3</sup>Durkheim, p 256

<sup>4</sup>Durkheim, p 259

(How To Write And Speak Better r. 459)

#### ✓ REHA DUYEM

Ev nîşaneyê;

bi kurmancî "reha duyem",

bi kirmancî "nîşanê kokkare (n)",

bi soranî "rega ducaî" (دوجایی رهگی),

dî tirkî: "karekök",

bi îngilizî "square root",

bi farisî "rîşê düvem" (دوم ریشه),

bi erebî "elcezer elterbî" (التربيعي الجذر)

tê binavkirin.

Di pirtûka Matematîk de wek li jêr binavkirî ye:

"reha çarçik", "reha ducar", "reha du".

(Matematîk, weşana Enstituya Kurdî ya Amedê, r. 78)

"rayê ducar", "rehê duyem" yê hejmara  $n$  ew hejmar  $e$  ku dema li xwe were carandin, hingê dibe  $n$ , nîşana wê  $\sqrt[n]{e}$ .

Mînak:

rehê duyem yê "n"  $\sqrt[n]{n}$  ye

rehê duyem yê  $9^{\wedge} 3$  ye ( $= 3^3$ )

rehê duyem yê  $4^{\wedge} 2$  ye ( $= 2^2$ )

([http://ku.wiktionary.org/wiki/reh%C3%AA\\_duyem](http://ku.wiktionary.org/wiki/reh%C3%AA_duyem))

**Di Xalbendiyê de rewşen awarte jî hene:**

1- Dema ku nîşaneyên xal, bêhnok, xalecot, dabir, dabeş, yeknik û bendik; dikevîna nava jimare, peyv û peyvên hevedudanî de; di pêş û paş van de valahî nayê bikaranîn.

Mînak:

3/4

Saet 05:30

Buha 4,50 lîra ye.

Pîvana nexşeyê 1:500 e.

Ez di riza 3'yemîn de me.

Kurdî zimanekî Hind-Ewropî ye.

2- Dabeş (!) û dabir (') ne tê de, temamê xalbandikan; bi peyva berî xwe ve bihevre tê nivîsandin, ji xalbandikan şunde valahiyek tê danîn.

a- Ji bilî danîna navbera rêzikên helbestan, yê wê wê pexşanê di pey hev de nivîsandî di herdu aliyên nîşaneyê dabeşê de valahî nayê danîn.

*(Ji bo mînak li beşa dabeşê binere).*

b- Nîşaneyê dabeşê (/) ku datînine navbera rêzikên helbestan, yê wê wê pexşanê di pey hev de nivîsandî di herdu aliyên nîşaneyê dabeşê de valahiyek tê danîn.

Mînak:

*Kurd in serbilind in / Naxwazin bindestî / Em dixwazin serbestî / Doza me serbestî / Îdî em hestan / Nîne rawestan / Xencer bi destan / Divên Kurdistan.*

*(Cegerxwîn, ji helbesta Em Azadîxwaz in)*

c- Nîşaneyê dabirê; bi tîp, jimarnav an peyva beriya xwe ve tê nivîsandin û jê şun de jî valahî nayê danîn.

(Ji bo mînakan li beşa nîşaneyê dabirê binere).

4- Hênek nişane û sembol hene ku di nava hevokê de dewsa peyvekê digirin di pêş û paş van de valahî nayê bikaranîn. Ji wan an hinek ev in:

% (sedek), & (û), ‰ (hezarek), Ø (çap), ¼ (çarsê), € (ewro/yûro), \$ (dolarê amerîkî), ¥ (yen), £ (paûnd), ¢ (sent), © (mafê jibergerîtinê), ® (mafê tomarkirinê), ♀ (mê), ♂ (nêr) û hwd.

#### ÇAVKANÎ:

**Alan, Remezan; *Bendname*, Avesta Basın Yayın, İstanbul, 2009**

Aslanoğlu, Osman; *Kolay Farsça*, Kent Yayınları, İstanbul, 2008

**Balpınar, Zülal – Smith, Michael, *English I*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2004**

Balpınar, Zülal – Smith, Michael, *English II*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2004

**Bedirxan, Celadet Alî - Lescot, Roger; *Kürtçe Gramer*, Avesta Basın Yayın, İstanbul, 2009**

Behrengî, Samed; *Masîreşê Biçûk*, Amedekar: Mihemed Ronahî, Weşanên Ronahî, Diyarbakır, 2009

Botî, Kamêran; *Ferheng (Kurdî-Kurdî)*, weşanên Do, İstanbul, 2007

**Bozkurt, Aynur; *Kesandina Lêkerên Kurmancî*, Do Yayınları, İstanbul, 2008**

Bulut, Faik; *Kürt Dilinin Tarihçesi*, Berfîn Yayınları, İstanbul, 2002

**Demîrhan, Umîd; *Ferhenga Destî Kurdî Bi Kurdî*, Weşanên Sewad, Bazîd 2007**

Denîz, Hesen Huseyîn; *Rênîşanêra Vegotina Kurdî*, Doz Yayıncılık, İstanbul, 2008

**Dost, Jan; *Mîrname*, Avesta Basın Yayın, İstanbul, 2008**



Ehmedê Xanî; Mem û Zîn, Amadekar Huseyn Şemrexî, Weşanên Nûbihar Stenbol, 2010

**Ebdulfettah, Deham; *Nav Di Zîmanê Kurdîde Kurmanciya Jorîn, Weşanên Spîrêz, Hewler, 2006***

Farqînî, Zana; *Kürtçe-Türkçe Sözlük*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2000

**Farqînî, Zana; *Ferhenga Kurdî- Tirkî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2004***

Farqînî, Zana; *"Bidestxistina Rayeka Lêkeran"* Zend Rêzepirtûk, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Zivistan 2006 r. 42-63

**Ferho, Medenî; *Rewşa Romana Kurdî, weşanên Do, Istanbul, 2011***

Feqiyê Teyran; *Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, Amadekar M. Xalid Sadînî, Weşanên Nûbihar Stenbol, 2010

**Gundî; *Di Siya Duriye Da, Wesanen Rewşen, Stenbol, 1992***

Guneylî, Hesen; *Matematîk*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Stenbol, 2009

**Incekan, Abdullah, *Ez Kurdî Hîndibim, Weşanên Nûbihar Stenbol, 2009***

*Ingilizce Dilbilgisi*, Fono Yayınları, Istanbul, 1990

**Jiyan, Adar; *"Girîngiya Xalbendiyê"*, Zend Rêzepirtûk, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Havîn 2005, Hejmar 2, r. 21-25**

Jiyan, Adar; *"Zîman û Wêje"*, Zend Rêzepirtûk, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Zizistan 2011, Hejmar 15, r. 67-71

**Jiyan, Adar; *Zîman û Jiyan*, Peri Yayınları, Istanbul, 2008**

John Ellison Kahn, Dphil (editör); *How To Write And Speak Better*, Pulpished by The Reader's Digest, London, 1991

**Kitêba Pîroz, werger: Said Alpaslan û Resul Yıldırım, Gerçeğe Doğru Kîtabları, Istanbul, 2008**

Kurdo, Prof. Qanadê; *Tarîxa Edebiyata Kurdî, weşanên Lîs, Amed, 2009*

**Metê, Hesenê; *Tofan*, Avesta Basın Yayın, Istanbul, 2006**

Onen, Ronayî, Tan, Samî; Hînker - Asta Sêyemîn, weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Istanbul, 2009

**Tan, Samî; *Rêzimana Kurmancî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2011***

Uzun Mehmet; *Bîra Qederê*, Avesta Basın Yayın, Istanbul, 2002

**Yusif, Helîm; *Mêrê Avis, Avesta Basın Yayın, Istanbul, 1993***

Zal, Azad; *Zîmanê Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Amed, 2009

***Zend Rêzepirtûk, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 16 hejmar, 2005-2011***

**Zarghamian, Mehdi, *Zebanê Farisî, Tehran, 2009***

Zerevanî, Arif; *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (Kurmancî)*, weşanên Nefel, Stockholm, 1997

**Nîşe:**

**1- Temamê vê nivîsarê, wek 300 rûpelên A4'ê ye, di derbarê rêzîman û rastnivîsê de hinek mijaran dihûrîne.**

## Edebiyata devkî ya kurdî bi kurdî û fransî


Rojhilatnasê fransî Roger Lescot (1914 – 1975) di nav kurdan de herî zêde bi kitêba xwe ya rêzimana kurmançî ya li gel Celadet Bedirxanî nivîsî *Grammaire kurde: dialecte kurmandji* tê nasîn. Heman kitêb li çendîn zimanên din jî hatiye wergerandin, di nav de bi erebî, farisî û tirkî jî.



Lê Lescot çendîn xebatên din jî yên giranbiha li ser zimanê kurdî kirine. Hê li salên 1940î wî hejmareke berhfireh ya çîrok, gotinên, stran, metelok û dastanên kurmançî berhev kirine û kurdiya wan û wergera wan ya fransî bi hev re çap kirine.

Lescot yekem kurdnasê ewropî ye ku di vekolînên xwe yên li ser ziman û edebiyata kurdî de alfabeya Hawarê ya latînî bi kar aniyê tevî ku – texmînen ji ber sebebên teknîkî – li cihê ^ ya li ser Ê, Î, Û, wî adeten ` . Rojhilatnasên berî wî di transkrîpsiyona berhemên kurdî de rastnivîsînên cuda-cuda bi kar anîne ku mirov nikare bibêje biserketî bûne.

Lescot sê dehsal li Kurdistanê û di nav kurdên li welatên din yên li Rojhilata Navîn de borandin daku baş hînî kurdî û edebiyata wan ya devkî bibe. Wî di salên 1930î de dastana Memê Alan ji çendîn dengbêjên navdar qeyd kir. Di kitêbeke xwe de ew hem wê dastanê bi temamî neqil dike ser kaxezê, hem wê werdigerîne fransî û hem jî di pêşgotineke bihagiran de cudahiyên versiyonên dastana *Memê Alan* û herwiha yên wê dastanê û şahesera Ehmedê Xanî *Mem û Zînê* jî dide ber hev.



Yek ji bideskeftiyên wî yên herî mezin ew bû ku wî sala 1945ê li Parîsê *Instituya Vekolînên Kurdî* wek beşek ji *Fêrgeha Neteweyî ya Zimanên Jîndar yên Rojhilatê* (Ecole Nationale des Langues Orientales Vivantes) damezrand û heta demekê wî bi xwe jî serperîştîya wê kir.

Çendîn kitêbên Lescot li ser kurdan, zimanê kurdî û edebiyata kurdî hatine weşandin. Li jêr em ê çend liban ji wan rêz bikin û herwiha hin ji wan diyarî xwandevanên *Kanîzarê* û bloga *Zimannas* bikin:

- *Enquête sur les yezidis de Syrie et du Djebel Sindjar* (Vekolîn li ser êzidiyên Sûriyê û Çiyayê Şingalê) Beyrouth. Imprimerie catholique / Paris, Leroux, 1938.
- *Textes Kurdes* – première partie – contes, proverbes, énigmes (Tekstên kurdî – beşa yekem – çîrok, gotinên pêşîyan û tiştanok). Libraire Orientaliste, Paris 1940.  
<https://zimannas.wordpress.com/2016/03/04/teksten-kurdi-bi-kurdi-u-fransi/>
- *Textes Kurdes* – deuxième partie – *Mamé Alan* (Tekstên Kurdî – beşa duyem – Memê Alan). Institut Français de Damas, Beyrût 1942. Bixwîne:  
<https://zimannas.wordpress.com/2016/03/04/dastana-meme-alan-bi-kurdi-u-fransi/>
- *Littérature Kurde* (Edebîyata Kurdî) di ensîklopediya *Encyclopédie de la Pléiade: Histories des Litteratures* de, Gallimard, Paris 1977.
- *Grammaire kurde: dialecte kurmandji*. (Rêzimana kurdî – zaravaya kurmancî) A. Maisonneuve, Paris 1970. Bi hevkarî li gel Celadet Bedirxan. Bixwînin:  
<https://zimannas.wordpress.com/2015/07/27/c-bedirxan-u-r-lescot-rezimana-kurdi-bi-fransi/>
- *Anthologie de la poésie populaire kurde* (Antolojiya helbestvaniya gelêrî ya kurdî). Stock, Paris 1980. Li gel Gérard Chaliand.

## Kurmancî, soranî, zazakî... zîwan yan dîyalekte?<sup>80</sup>

**Husein Muhammed**

**Kurmancî ra: Hasan Aslan**

Tirêm kurdî zîwanêk a yan zî çend zîwan ê? Tirêm kurmancî, soranî, hewramî, zazakî... heme dîyalektê eynî zîwanî yê yan zî çend zîwanê eynî malbat ê?

Tirêm kurdîya ke bi elifbêya latînî nusîyena bi kurdîya ke bi elifbêya erebî nusîyena ya yan zî bi kurdîya ke bi elifbêya krîlî nusîyayêne ya eynî zîwan ê yan zî çend zîwanê pê ra cîya yê?

Tirêm çi şertan gore merdim vano ke di awayê zîwanî eynî zîwan ê (mîsal kurmancî û soranî) la di awayê bînî zîwanê pê ra cîya yê (mîsal soranî û farisî)?

Tirêm sebeb û faktorê hesibnayîşê di awayanê zîwanî sey di zîwanê xoserî yan zî sey di dîyalektê eynî zîwanî çi yê? Tirêm merdim şeno bi qeyd û bendanê zîwannasî nê tesnîfkerdişî bikero yan zî tirêm tay şert û mercê muhîmêrî estê?

### Mesele çi yo?

No wextêk o ke ser o nîqaş û meseleyî hende bîyê germî ka tirêm zazakî dîyalektêka kurdî ya yan zî zîwanêko xoser a. Eynî pers goranî/hewramî ser o zî esto.

Hema-hema heme kurmancîqiseykerî û soranîqiseykerî û hakeza zafaneyê zazakîqiseyker û hewramîqiseykeran o mutleq zazakî û hewramî/goranî sey dîyalektê zîwanê kurdî û zîwanê nexoserî hesab kenê. Ne nika û ne zî tarîx de çi mîletê/şarê bi nameyê zaza yan hewramî/goran çînê bîyê û ê her wext mîletê kurdî ra beşêk hesibîyayêne. Sey delîlê ney, Vakurê Kurdistanî de serek û rayberanê kurdan ra zaf serekanê serehewadayîşê 1925î ra bigî heta Selahedîn Demîrtaşî xeylî zaza bîyê la verengê sîyasetê kurdî û kurdan bîyê.

<sup>80</sup> Orijînal nivîsarê bi kurmancî: <https://zimannas.wordpress.com/2016/03/09/kurmanci-sorani-zazaki-ziman-an-zarava/>

Naye ra û nezdîyîya bêgumana mabênê zazakî/hewramî/goranî û dîyalektanê kurdî yê bînan de ver, zafaneyo mutleq nê awayanê qiseykerdişî sey beşêkê zîwanê kurdî û qiseykeranê înan zî sey beşêkê milletê kurdî qebûl kenê. Sey nîşanê yewitîya zîwanî ya kurmancî û zazakî, bi desan serran a ke weşananê kurdanê Vakurî de yê zafane bi kurmancî de ca deyeno zazakî zî. Eger zazakî tay kovar û rojnameyanê Vakurî de ca nêgirewto zî, sebeb o nîyo ke nê kovar û rojnameyan berhemê zazakî red kerdî la sebeb o yo ke berhemê bi zazakî înan rê nêameyê çunke heta nê peynîyan hûmara zazakînusan vêşî nêbî.

Hetêko bîn de, nê peynîyan de tay zazakîqiseykerî û tay hewramîqiseykerî vejîyayê vernî û vanê ke zazakî/hewramî zîwanê xoserî yê û dîyalektê kurdî nîyê. Ê îdîa kenê ke xo tenya îsnadê “şertanê ziwannasî” kenê û argumentanê kesê ke zazakî/hewramî sey dîyalektê kurdî hesab kenê bi “sîyaset” yan “hîsdarî” ya sucdar kenê. Ê xo îsnadê çend ziwannasanê ewropayîjan kenê ke vanê zazakî/hewramî kurdî nê la zîwanê xoserî yê.

Seranikê nê “zazacîyanê” ke vanê zazakî dîyalektêka kurdî nîya, Zülfü Selcan û kitabê ey o bi almanî *Grammatik der Zaza-Sprache* (Gramerê Zîwanê Zazakî) yê. Kitab serra 1998î Berlîn de weşaneyayo. Pawitişê xoserîya zazakî ra vêşêrî o êrişkerdişê kurdî ser o.

Selcan îdîayanê çend ziwannas û sosyologanê ewropayîjan keno virare gama ke ê vanê zazakî zîwanêko xoser a. La eynî Selcan êrişê eynî ziwannas û sosyologan keno gama ke ê vanê zazayî hetê etnîkî û tarîxî ra milletêko xoser nîyê la milletê kurdî ra yew beş ê.

Mîsal, Selcan vateyê Martin van Bruinessenê<sup>81</sup>şarnasê (folklornasê) holandayîjî , ke vano zazakî zîwanêko xoser a, bi serfirazî qebûl keno. La eynî Selcan vateyê eynî Bruinessenî, ke vano zazayî kurd, Şêx Seîd(ê zazayî) seba Kurdistanêkê xoserî cehd kerdo û sewbîna zî serehewadayîşê 1925î serehewadayîşê kurdan bi, bi şidet red keno.

Eger zafaneyê ziwannasanê ewropayîjan – êyê ke çîyêk zazakî ser o vato- zazakî sey zîwanêko xoser qebûl bikerê zî, ê eynî wext de red kenê ke kurmancî û soranî di zîwanê pê ra cîya bê. Selcan vateyê înan ê ke kurdî ra cîyayîya zazakî ser o keno virare û nê vateyê înan sey bîngêhêko objektîv û bêteref

<sup>81</sup> Berhemê Martin van Bruinessenî yo sereke yo kurdî û Kurdistanî ser o “Agha, Shaikh and State – The Social and Political Structures of Kurdistan” (Axa, Şêx û Dewlete – Awaniyê Sosyal û Sîyasî yê Kurdistanî) bi inglîzî yo û şeno tîya de biwanîyo:  
[http://www.academia.edu/2521173/Agha\\_Shaikh\\_and\\_State\\_The\\_Social\\_and\\_Political\\_Structures\\_of\\_Kurdistan](http://www.academia.edu/2521173/Agha_Shaikh_and_State_The_Social_and_Political_Structures_of_Kurdistan)

qebûl keno. La eynî Selcan bi şidet êrişê ê eynî ziwannasan keno çunke ê vanê ke kurmancî û soranî dîyalektê eynî ziwani yê.

### Tirêm kurmancî, soranî û zazakî zivan ê yan dîyalektê?

Kesê ke îdîa kenê ke kurmancî, soranî û zazakî zivanê pê ra cîya yê, xêret kenê – hendo ke mimkun o – lîsteyêkê cîyayîyanê înan ê dergî rêz bikerê. Ê seypêyîyanê mabênê kurmancî, soranî û zazakî qet nêbo peygoş kenê û ge ge heta dîrekt zûran zî meseleyî ser o kenê.

Mîsal, Selcan kitabê xo de hûmarêka vengane pê ra cîya yê mabênê kurmancî û zazakî de rêz keno. La Selcan xora vengane kurmancî û zazakî yê sey pê ra bêveng û bêhes o. Rastî de fonemê kurmancî û zazakî 100 % eynî yê herçendo ke elbet ê, ê foneman tam sey pê nêxebitnenê.<sup>82</sup>

O hem zî wazeno eşkera bikero ke kurmancî û soranî zî pê ra zaf dûrî yê û ganî sey dîyalektê eynî ziwani nê la sey zivanê cîyayî bihesibîyê. Seba na îdîaya xo, o mesela eşkera keno ke prefîksê/verîlaweyê berdewamî kurmancî de “di-“ yo (sey “di-çim, di-bêjim, di-kevim”) la soranî de “e-“ yo (“e-kem”) yanî wazeno vajo ke ê qet nêmanenê pê û no zî yew delîl o ke kurmancî û soranî eynî ziwani nîyê. La Selcan na rastî ra xo temamen bêveng û bêhes keno ke soranî de “e-“ tenya prefîksê berdewamî yê “de-“ ra formêko fekkî yo ke zaf maneno “di-“yê kurmancî (de-kem=di-kim).<sup>83</sup> No formê “de-“ hem zafaneyê fekan de hem zî soranîya nuşteki de serdest o herçendo ke formê “e-“ zî tay fekan de esto û tay nuşteyan de aseno. La Selcanî nêwaşt o behsê “de-“ bikero çunke o vêşerî seypêyîya kurmancî û soranî nîşan dano, cîyayîya înan nê.

### Şertê pêfehmkardişî û zeîfiya ey

Bi awayêko pêroyî vajîyeno ke eger qiseykerê di awayanê qiseykerdişî pê ra fehm bikerê, wexta awayê qiseykerdişê înan di zivanê cîyayî nê la di lehceyê eynî ziwani yê. Vereksê ney, eger qiseykerê di awayanê qiseykerdişî pê ra fehm nêkerê, wexta ê di lehceyê eynî ziwani nê la di zivanê pê ra cîya yê.

<sup>82</sup> Seba cîyayîyanê seypêyî û vengnasî kurmancî û zazakî de (û dîyalektanê kurdî yê bînan de), biewnîrê: <https://zimannas.wordpress.com/2016/01/02/cudahiyan-dengnasi-di-lehceyan-kurdi-de/>

<sup>83</sup> Seba “e-“ ra kewtişê D bidê prefîksê demê ameyoxî yê kurmancî ver o: DÊ>Ê (ez dê bikim > ez ê bikim).

Na teorî tesnîfkerdişê zîwan û dîyalektan de xeylî ameya xebitnayîş û hema zî yena xebitnayîş la teorîyêka zeîf a çünke fehmkerdiş çîyêko subjektîv o û bi estbîyayîş yan çînêbîyayîşê tecrubeyanê kesan a girêdaye yo.

Mîsal, eger yew kurmancî zaf soranî yan farisî eşnawita, şeno hêdî-hêdî musayeyê fehmkerdişê înan bo heta bê ke qet xo musayeyê înan bikero zî. La eger reya ewilî bo ke o kurmancîqiseyker farisî yan soranî eşnaweno, bi ihtimalêko zaf gird do zaf tay ci ra fehm bikero yan heta çîyêk ci ra fehm nêkero zî.

Mesele tenya mabênê di zîwananê aqrebeyan de (mîsal kurdî û farisî) nê la heta mabênê fekanê eynî zîwanî yan eynî dîyalekte de zî winî yo. Mîsal, çî ziwannasêkê cidî heta nika nêvato ke kurmancîya Dîyarbekirî û kurmancîya Dihokî di zîwanê pê ra cîya yê û xoser ê. La eger yew kurmancîqiseykero dîyarbekirij û yewo dihokij reya ewilî fekê pê bieşnawê û pîya dest bi suhbet bikerê, ê do fehmkerdişê pê de zehmetî biancê û heta zaf çîyan pê ra fehm nêkerê yan zî heta pê ra şaş fehm bikerê zî. Mîsal, vatişê dîyarbekirijî “karîn/kanîn, hev, tev/giş, li ba/cem” dihokijanê ke fekanê bînan ra nêmusayê rê xerîb ê çünke dihokijî herunda ê vatişan de vatişê sey “şîyan, êkûdu, hemî/xirr, li nik/dev” xebitnenê. La noqor “xirr” (heme) yê dihokijan şeno bi asanî dîyarbekirijan het şaş fehm bibo çünke Dîyarbekir de o manaya endamê cinsî yê nerîyan dano yanî hemmanaya “kîr”ê dihokijan o.

Ney ra cîya, qiseykerdişê dihokijan de xeylî çekuyê erebî û kurmancîya dîyarbekirijan de zî hûmarêka çekuyanê tirkîyan a ne taye estê ke ne dihokijî ê çekuyanê tirkîyan ra fehm kenê û ne zî dîyarbekirijî ê erebîyan ra fehm kenê. La nê heme astengîyan reyde zî, çî ziwannasê cidî îdîa nêkerdo ke dihokijî û dîyarbekirijî bi di zîwananê cîyayan qisey kenê.

Fehmkerdiş hem zî bi zanayîşê babet a girêdaye yo. Kurdêko ke doktor bo û muxetebê ey o kurdo ne-doktor belkî zaf bi zehmetî pê ra fehm bikerê gama ke behsê babetêka tibî kenê. La doktorêko kurd û doktorêko faris belkî kurdêkê doktorî û kurdêkê ne-doktorî yan farisêkê doktorî û farisêkê ne-doktorî ra hîna zaf asan yewbînî ra fehm bikerê. La ancî zî çî ziwannasê cidî îdîa nêkerdo ke kurdî û farisî eynî zîwan ê.

Cografya û têkilî pêfehmkerdişî ser o tesîrêko asanker yan zehmetker kenê. Mîsal, kurmancê Dêrsimî û kurmancê Zaxoyî herdi bi yew zîwan qisey kenê ke ziwannasî de nameyê ey “kurmancî” yan zî “kurdîya vakurî” ya. Zafaneyê kurdanê Hewlêrî/Erbîlî bi yew awa qisey kenê ke ziwannasî de ci rê “soranî” yan zî “kurdîya merkezî” vajîyena. Ziwannasî qiseykerdişê hewlêrijan bi ê zaxoyijan a eynî



lehce ra nê la eynî zîwan ra hesab kenê. Heta kesê sey Zülfü Selcanî weriştê vanê ke ê eynî zîwanî nîyê zî.

La seba ke cografyaya Zaxo-Hewlêrî, Zaxo-Dêrsimî ra nezdîyêrî yo û hem zî têkilîyê mabênê Zaxo û Hewlêrî ê Zaxo-Dêrsimî ra hîna xurt ê, bi ihtimalêko zaf gird zaxoyijî vêşêrî qiseykerdişê soranîya hewlêrijan ra fehm kenê, kurmancîya dêrsimijan ra nê. Sebeb o yo ke zafaneyê zaxoyijan vêşêrî soranîya hewlêrijan eşnawita û heta hewlêrijan reyde qisey kerdo zî la zaxoyijan ra têkilîya nîsbeten tayênan bi dêrsimijan a estîbîya. La ancî zî çî ziwannasêko cidî qebûl nêkeno ke kurmancîya zaxoyijî bi soranîya hewlêrijî ya eynî lehce bo la kurmancîya dêrsimijî ra cîya bo.

Bi eynî awa ya, ihtimalen soranîqiseykerêkê hewlêrijî rê fehmkerdişê kurmancîya zaxoyijî soranîya sineyijî ra zaf asanêrî bo çunke ameyîşûşîyayîşê hewlêrij-zaxoyijî têkilîyanê hewlêrijî-sineyijî ra zaf hîra û xorîyêrî yo.

Fehmkerdiş gegane dihetî yo. Cayo ke dîyalektêk serdeste bo, qiseykerê dîyalekta serdeste îdîa kenê ke dîyalekta ne-serdeste ra fehm nêkenê la qiseykerê dîyalekta ne-serdeste dîyalekta serdeste ra vêşêrî fehm kenê. Mesele o yo ke qiseykerê dîyalekta serdeste mihtacî nîyê ke xêret bikerê la qiseykerê dîyalekta ne-serdeste neçarê îdarekerdişî yê û mecbûr ê xêret bikerê ke fehm bikerê.

Fehmkerdiş şeno bi wext a û bi îmkanan a zî bivurîyo. Mîsal, verê 50 serran tay kurmancîqiseykeran rojane yan heta qet û qet soranî eşnawitêne û qet haya zafaneyê soranîqiseykeran ê mutleqî zî qiseykerdişê kurmancî ra çînê bî. La nika dem û îmkanî cîya yê. Bi raya teknolojiyanê neweyan (TV, Înternet, radyo ûsn.) kurmancîqiseykerî û soranîqiseykerî şenê rojane lehceyanê pê bieşnawê û heta bi “mecbûrî” eşnawenê zî. No biwazo-nêwazo pêfehmkardişê kurmancî û soranî zî qiseykeranê înan mîyan de zêdneno (qet nêbo ê kesan mîyan de ke medyaya kurdî taqîb kenê).

La ancî zî no fehmkerdiş nîno a mana ke cîyayî mabênê kurmancî û soranî de nêmendê yan zî zaf kemî bîyê. Bingehê kurmancî û bingehê soranî sey verê 50 serran o la qiseykerê nê lehceyan hêdî-hêdî musayeyê fehmkerdişê pê benê.

Nê nimûneyanê corênan ra eşkera beno ke pêfehmnêkerdiş sey bingehê tesnîfkardişê zîwan û dîyalektan bi pêroyî munasîb nêbeno yan zî zaf zeîf o. Ey dima şîyayîş şeno bi asanî merdimî biresno tay netîceyanê şaşan.

Tirêmetay metodê ziwannasî yê bînî estê ke ma bişê rindêrî pê eşkera bikerê ka awayêkê qiseykerdişî ziwannêko xoser yan dîyalektêka yew zîwanî yo?

**Pêveronayîşê kurmancî, soranî, zazakî û farisî**

Kerem kerê ma çend qeyd û bendanê fonolojî, morfolojî û sîntaksî gore biewnîrê cîyayî û seypêyîya kurmancî, soranî, zazakî û farisî ra (+ = belê, - = nê):

	kurmancî	soranî	zazakî	farisî
<b>Difonemîya Ç, K, P û T</b>	+	-	+	-
<b>Vurnayîşê M-yê peyvokalî bi V-W</b>	+	+	-	-
<b>Eştişê D R pey ra</b>	+	-	-	-
<b>Eştişê D vokalan pey ra</b>	+	+	+	-
<b>Eştişê X verê W ra</b>	-	-	+	-
<b>Difonemîya L</b>	-	+	-	-
<b>Eştişê T S pey ra</b>	-	+	-	-
<b>Vurnayîşê E bi I</b>	+	+/-	-	-
<b>Vurnayîşê Z bi D</b>	-	-	-	+
<b>Cinso gramerkî bi name û zemîran a</b>	+	-	+	-
<b>Cinso gramerkî bi</b>	-	-	+	-

sifet û fîlan a				
Prefîksê/Verîlaweyê berdewamî	+	+	-	+
Di desteyî zemîrê xoserî	+	-	+	-
Zemîrê pakerdeyî	-	+	-	+
Ergatîvî	+	+	+	-

#### Îzahkerdişê tabloyî

- **Difonemîya Ç, K, P û T:** Kurmancî û zazakî de nê herfan ra di fonemê yanî vengê manavurnayoxî yê pê ra cîyayî vejîyenê, ci ra yew bipif yanî “req” o (bi inglîzî “aspirated”) û oyo bîn zî bêpif yanî “nerm” o (unaspirated). Mîsal, çekuya “par” bi P-yo bipif manaya “parçe, beş, lete, hîse, şîrîkatî” dana la bi P-yo bêpif yanî nerm manaya “serra ravêrdî, serra şîyayî, serra verê emser” dana. No fenomen kurmancî û zazakî de esto la soranî û farisî de peyda nêbeno.
- **Vurnayîşê M-yê peyvokalî bi V/W:** Kurmancî de M-yê mîyan yan peynîya çeku yê vokalan pey de biyo V. Mîsal, “nav” (bi zazakî name) bi kurmancî bi V yo la bi zafaneyê zîwananê hindûewropayîjî yê bînan bi M yo, mîsal: farisî “nam”, inglîzî “name”, fransî “nom” ... Soranî de zî M yê peyvokalî (vokalan pey de, *postvowel*) adeten beno W: naw. Zazakî de M nê rewşan de sey xo maneno.
- **Eştişê D, R pey ra:** Kurmancî zafaneyê çekuyan de D, R pey ra eşto, mîsal: “kirin, birin, xwarin” la bi soranî “kirdin, birdin, xwardin”, bi zazakî “kerdene, berdene, werdene” û farisî “kerden, borden, x(w)arden”.
- **Eştişê D vokalan pey ra:** Ci ra meqsed o yo ke zaf çekuyan de D vokalan pey ra kurmancî, soranî û zazakî de kewto la farisî de mendo, mîsal: kurmancî “ba, bû”, zazakî “va, bi/bî” la farisî “bad, bûd”.

- **Eştişê X verê W ra:** Ci ra meqsed o yo ke zazakî komvengê XW ra vengê X eşto û tenya W verdayo, mîsal kurmancî “xwarin, xweş, xwişk/xweh”, farisî “x(w)arden, xûş, x(w)aher” la zazakî “werdene, weş, waye”.
- **Difonemîya L:** Soranî de di L-yê pê ra cîya estê ke şenê manaya çeku bivurnê eger herunda pê de bêrê xebitnayîş. Ci ra yew L-yo barî yo (sey “lez, law”) û oyo bîn zî qelew o, sey “welat, silaw”. Kurmancî, zazakî û farisî de di vengê L bibê zî, ê fonemî nîyê yanî vurnayîşê înan bi yewbîn nêşeno manaya çeku bivurno.
- **Eştişê T, S pey ra:** Soranî de no fenomenêko eşkera yo, mîsal kurmancî “standin/stendin, dest”, soranî “sendin, des(t)”. La no fenomen kurmancî, farisî û zazakî de peyda nêbeno.
- **Vurnayîşê E bi I:** Kurmancî de no fenomenêko vilabîyaye yo, farisî û zazakî de hema-hema peyda nêbeno. Mîsal, zazakî “kerdene, wesar”, farisî “kerden, behar” la kurmancî “kirin, bihar”. Soranî de zî gegane E beno I (kirdin) la zaf reyan zî sey E maneno (mîsal “behar, le, be” herunda “bihar, li, bi”yê kurmancî).
- **Vurnayîşê Z bi D:** No farisî de fenomenêko vilabîyaye yo, mîsal “dan-“ (zan-ayene), “damad (zama, bi kurmancî zava). Kurmancî, soranî, zazakî û zafaneyê ziwananê îranîyan ê bînan de no vurîyayîş nêbeno.
- **Cinso gramerkî:** Çiyêko eşkera yo ke kurmancî û zazakî de di cinsê gramerkî (makî û nerî) estê û soranîya standarde û farisî de peyda nêbenê. La sîstemê cinsî kurmancî û zazakî de bi tamamî sey pê nîyê. Kurmancî de tenya name û hem zî zemîro yewhûmaro hîrêyin şeno cinsî bigîro la sifet û karî (fîlî) bêcins ê. Mîsal, kurmancî “birayê mezin” û “xwişkê mezin” la bi zazakî “birayo pîl” û “waya pîle”. Cîyayî a ya ke kurmancî de sifet (mezin) sey xo maneno û nerî yan makî gore nênamîyeno la zazakî de çekuya bingehêne “pîl” çekuyanê makîyan reyde bena “pîle”. Hakeza kar (fîil) zî zemîrê yewhûmarê hîrêyinî reyde kurmancî de her wext eynî yo la zazakî de cinsê zemîrê yewhûmarê hîrêyinî gore vurîyeno: “O esto” (nerî) û “a esta” (makî).
- **Prefîksê/Verîlaweyê berdeyamî:** Verîlaweyê berdeyamî ra meqsed “di-“yê kurmancî, “de-“yê soranî û “mî-“yê farisî yo, mîsal kurmancî “di-kim, di-bêjim, di-çim”, soranî “de-kem, de-lêm, de-çim” û farisî “mî-konem, mî-gûyem, mî-revem”. No verîlawe zazakî de çinî yo û herunda ey de peyîlawe yan mîyanîlaweyê -n- / -en- esto: “(ez) ke-n-a, va-n-a, şî-n-a” yanî bi kurmancî “(ez) dikim, dibêjim, diçim”.

- **Di deste zemîrê xoserî:** Kurmancî û zazakî de di desteyê/komê zemîran estê ke înan ra yew sade/nenamite yo û oyo bîn zî oblîk/namite yo, kurmancî zemîrê nenamiteyî “ez, tu, ew, em, hûn, ew” û namiteyî “min, te, wê/wî, me, we, wan” û zazakî nenamiteyî “ez, ti, o/a, ma, şima, ê” û namiteyî “mi, to, ey/aye, ma, şima, înan”. Farisî û soranî de tenya desteyêkê zemîranê xoseran esto la desteyêkê zemîranê pakerdeyan zî estê ke kurmancî û zazakî de peyda nêbenê:
- **Zemîrê pakerdeyî:** Farisî û soranî de (la kurmancî û zazakî de nê) desteyêkê zemîran esto ke soranî de verva zemîranê namiteyan ê kurmancî û zazakî yê. Bi soranî “-im/-m, -it/-t, -î/-y, -man, -tan, -yan” û bi farisî “-em, -et, -iş, -man, -tan, -şan”.
- **Ergatîvî<sup>84</sup>:** Ergatîvî ra meqsed o yo ke kurmancî, soranî û zazakî de tay haletan de kar (fîil) kerdoxî yanî keso ke çîyêk kerdo gore nê la çîyo ke ameyo kerdiş yanî kerdeyî gore namîyeno. Mîsal, “ez sayan wen-a” (karê “werdene”, “ez” gore namîyayo”) la “mi di sayî werd-î” (karê “werdene”, “di sayî” gore namîyayo û merdim nêşeno vajo “ez di sayî werda”). Demo ravêrde de tenya kar kerdeyî gore nênamîyeno la kerdox yanî keso ke çîyêk kerdo bi xo zî namite yo (“mi werd” – “ez werd” nê). Kurmancî û soranî de zî sîstem wina yo la farisî de çîyêko winên çinî yo, kerdox her wext nenamite yo, kerde namite yo û kar zî kerdoxî gore namîyeno: “dû sîb-ra mîxor-em” (ez di sayan wen-a) û “dû sîb-ra xordem” (mi dî sayî werdî).

### Encamê pêveronayîşê kurmancî, soranî, zazakî û farisî

Tabloyo corên de ma xêret kerd hûmarêka babetanê zîwanî de pêveronayîşêk mabênê kurmancî, soranî, zazakî û farisî de bikerê. Helbet merdim şeno çend babetanê bînan zî bizêdno yan tayênan ci ra wedaro. La hedefê ma bi nê tabloyî o yo ke ma seypêyî û cîyayîyanê nê zîwan yan dîyalektan ra wêneyêkê (resimêkê) zafhetî teqdîm bikerê.

Seke aseno, mabênê nê zîwan yan dîyalektan de hem seypêyî û hem zî cîyayî estê. Înan ra çî yewe her babete de yewa bîne ra cîya nîya û çî yewe zî her babete de sey yewa bîne nîya. Wexto ke ma kurmancî û farisî pêvero nê, ma do bivînê ke 15 babetanê vîjnayeyan ra, ê tenya çar babetan de sey pê yê:

- Nêştişê X verê W ra

<sup>84</sup> Nuştoxî tîya kurmancî gore şirove kerdo la mi seba zazakî şirove kerd. (Notê açarnayoxî)

- Yewfonemîya L
- Nêeştişê T, S pey ra
- Çinêbîyayîşê cinsê gramerkî bi sifet û karan a

Wexto ke ma kurmancî û soranî pêvero nê, ma do bivînê ke ê 7 yan 8 babetan de sey pê yê:

- Vurnayîşê M (bi V/W)
- Eştişê D vokalan pey ra
- Verîlaweyê berdewamî
- Nêeştişê X verê W ra
- Nêvurnayîşê Z bi D
- Çinêbîyayîşê cinsê gramerkî bi sifet û karan a
- Ergatîvî
- (Vurnayîşê E bi I)

Wexto ke ma kurmancî û zazakî pêvero nê, ma do bivînê ke ê 8 babetan de sey pê yê:

- Difonemîya Ç, K, P û T
- Eştişê D vokalan pey ra
- Yewfonemîya L
- Nêeştişê T, S pey ra
- Nêvurnayîşê Z bi D
- Cînsê gramerkî bi name û zemîrê yewhûmarê hîrêyinî ya
- Di desteyî zemîrê xoserî
- Ergatîvî

Ancî tabloyê ma ra eşkera beno ke soranî û zazakî tenya 4 yan 5 babetan de sey pê yê. La hetêko bîn de, soranî û farisî 6 yan 7 babetan de pê kenê.

Seke aseno, cîyayîyê kurmancî-soranî û kurmancî-zazakî teqrîben eynî nisbet de yê. Bi ney a zî, zaf ziwannasê rojawanijî îdîa kenê ke zazakî û kurmancî di ziwane pê ra cîya yê la kurmancî û soranî di dîyalektê eynî ziwani yê.

Hetê ziwannasî ra mesele bi rastî zehmet o. Bileksê ke “zazacî” îdîa kenê, diziwanîtîya kurmancî û zazakî bi çî awa çîyêko zelal nîya. La rastî ser o ganî bivajîyo ke hetê gramerî ra çîyêko bêguman nîyo ke kurmancî, soranî û zazakî heme lehceyê eynî ziwani yê.

Mesele o yo ke ziwannasî de çî xetêka eşkera, ya ke lehceyanê eynî ziwani eynî het de verdo û ziwananê eqrebeyanê xoseran cê ra abirrno, çinî ya. Gama ke ma ewnîyenê tabloyo corên ra, ma vînenê ke kurmancî bi soranî û zazakî ya, muqeyseyê kurmancî-farisî ra vêşêrî babetan de pê kenê. La ancî zî tay babetan de kurmancî û farisî pê kenê ke kurmancî û soranî yan kurmancî û zazakî pê nêkenê.

Rastî de çî qeyd û bendêkê ziwannasî yo mutleq yan heta tenya meqbûl zî çinî yo ke merdim xo îsnad bikero ta ke eşkera bikero ka di awayê qiseykerdişanê aqrebeyan bi rastî tenya lehce yê yan zî ziwane xoserî yê.

Bira (Qerarê) lehceyîti yan zî ziwani tiya di awayanê aqrebayan ê qiseykerdişî bi qeyd û bendanê ziwannasî nê la bi şert û mercanê sosyal, sîyasî, tîcarîyan yan zî bi hîskerdiş a:

Mîsal, ziwananê Îskandinavya ra bi taybetî swêdî û norwecî zaf nezdîyê pê yê. Ê normal pîya qisey kenê û nadîren fehmkerdiş de zehmetî vînenê. Cîyayîyê înan bi zor hendê cîyayîyanê kurmancîya Mêrdînî û kurmancîya Hekarîyan bê. La semedo ke înan ra her yewe hetê yew dewlete ra ameya resmîkerdiş, çî ziwannasî nêwerzenê û îdîa nêkenê ke ê herdi rastî de dîyalektê eynî ziwani yê.

Hindî û urdûyî bi qiseykerdiş eynî ziwani ê la her yewe bi elifbêyêka cîya nusîyena û yewe hetê Hindistanî ra û yewe zî hetê Pakistanî ra ameya fermîkerdiş. Ziwannasî nê parekerdişê bi temami sîyasî winî qebûl kenê. Hetêko bîn de, Çin de xeylî dîyalektê pê ra zaf cîyayî û qiseykeranê pê rê fehmnebarî estê la hetê sîyasî û tîcarî ra sey eynî ziwani qebûl benê.

Erebîya Îraqî û erebîya Mexribî qiseykeranê pê rê bi asanî fehmbarî nîyê la herdi awayanê qiseykerdişê xo rê vanê “erebî”. Portugaliya (portegîzîya) Portugal û Brezîlya pê rê bi asanî fehmbarî nîyê la ancî zî herdi “portugalî” yê. Çî ziwannas nêwerzeno înan ra yewe rê nêvano, “nê, ziwane şima o ziwano ke şima texmîn kenê nîyo”.

Ziwannasî ne vengê xo hemverê nê parekerdişan de û ne zî nê yewkerdişan ver o kenê.

Kurdî wayîra çend lehceyan a ke qiseykeranê pê rê bi asanî fehmbarî nîyê. Lehceyê kurdî heta bi çend elifbêyan zî nusîyenê. La hetê sîyasî ra kurdî eynî ziwani a. Mîsal, gama ke xebitnayîşê kurdî Tirkîya de qedexe bî, tirkan nêva “zazakî kurdî nîya, wa a serbest bo.” Neheqîya ke no seserrêk o

ziwanê kurdî rê yena kerdiş, kurmancî, soranî, hewramî, zazakî – heme lehceyanê kurdî rê yena kerdiş.

Naye ra muhîmêrî: kurdî bi hîskerdiş a eynî ziwana a çunke zafaneyê qiseykeranê lehceyanê kurdî yê cîyayan o mutleq nê heme lehceyan sey eynî ziwana ra beşêk hesabnenê.

Ne ziwannasî û ne zî sîyaset şeno nê hîskerdişî ra xurtêrî û çaresazêrî bo.

www.arasivakurdî.org



## The effect of orthographic depth on reading acquisition

*Rizgar Behadur*



### Abstract

This article addresses orthographic differences and its effect on literacy acquisition, especially reading acquisition. In considering reading acquisition the most remarkable feature of difference between orthographies is related to orthographic depth, which depends on the degree of regularity of grapheme-phoneme (G-P) relationship. The degree of orthographic depth has a major effect on reading acquisition.

Keywords: orthography, orthographic depth, phonological recoding, reading acquisition

---

### Introduction

Orthography is a method for writing the sounds of a language. Orthographic strengths or weakness has a great effect on learning how to read and write a language. When there is no rule to use written symbols there is a lot of problem especially for children to read and write correctly. For example there are four different letters in Persian alphabet just for the sound /z/, i.e. /ذ/, /ز/, /ض/ and /ظ/. Because there is no difference in pronunciation of these letters, children cannot differentiate among them, and when they have to use them in different words they become confused. So it raises the question of whether the difficulty of reading acquisition in alphabetic orthographies is related to the features of particular orthographies or not. This question has been investigated by a number of researchers (e.g. Burt 2006, Thorstad 1991, Cahill& Karan 2008) and suggests that there is a considerable variation in the rate of reading acquisition between orthographies, and that this variation is related to orthographic depth. The concept of orthographic depth refers to the degree of regularity of grapheme-phoneme (G-P) relationship. In shallow (regular) orthographies, such as Kurdish, the correspondences are direct

and clear, whereas in deep orthographies, such as English, the relation between phonemes and graphemes is more ambiguous and difficult.

### **Different writing systems**

Generally speaking there are three types of Orthography: Logography, syllabary and alphabetic. In logography words and morphemes are linguistic units; Chinese is the best example of logography. In syllabary system, syllables are the unit of writing such as Old Persian Cuneiform. But in alphabetic orthography, letters (graphemes) are units of writing and each alphabet letter represents a phoneme, a good example of alphabetic writing system is Kurdish orthography.

### **Levels of written language processing**

Perception of written language psychologically occurs at different levels. According to Carroll (2008) in written perception we have three levels respectively: Feature, Letter and Word level. At feature level the shape of the alphabet letter is presented, that is we recognize letters by their shape e.g. we acknowledge /K/ as a vertical line and two diagonal lines or slashes. Then at the letter level we perceive letters as meaningful symbols rather than their physical shapes. For example we perceive the letter /F/ regardless of whether it is handwritten or is typed with different fonts. And finally at word level we see the word as a whole not as a set of letters, and then its properties such as pronunciation and meaning become available to us. Although in the Word-Superiority Effect theory words are important not letters, and word perception helps letter identification; but this is only correct with experienced readers, and novice readers need to decoding letters to understand new words either in their own language or another language.

### **Phonological recoding**

Words are composed of letters that represent sounds. Using systematic relationships between letters and phonemes to pronounce or spell words is called phonological recoding. Because there are too

many words in the language to rely on memorization as a primary word identification strategy, in alphabetic writing systems, recoding is an important and primary means of recognizing words. Studies of nonword reading skills show that the acquisition of phonological recoding skills varies among different orthographies. For example in English it is slow and difficult. Mean error rates for nonword reading at the end of grade 1 typically range from 40% to 80% (e.g. Seymour et al., 2003; Treiman, Goswami, & Bruck, 1990). In contrast, in Greek orthography which is regular, children of the same age made only about 10% errors when reading words and nonwords (Porpodas, 1999). In a review, Landerl (2000) reports that children in regular orthographies like Dutch, German, Greek, Italian, Portuguese or Turkish make no more than 25% errors on nonword reading at the end of grade 1.

### **Deep and shallow orthographies**

In successful reading, the brain must first make a correct connection between the orthographic character of the word and its sound. Regarding orthographic depth there are two types of orthographies, Deep and Shallow. Deep orthographies are writing systems that do not have a full correspondence between the spoken phoneme and the written grapheme.

English is an example of orthography where the written script does not fully represent the phonemic structure of spoken language. According to Brinton (2000), there are 44 phonemes in English. While there are only 26 letters in English alphabet, the number of graphemes is much higher and many graphemes consist of multiple letters. A phoneme can be marked with a variety of graphemes, depending on the context, and vice versa. In English the reader has first to be able to make orthographic recoding of multi-letter and often inconsistent digraphs (e.g. ps-y-ch-o-l-o-g-y), where the knowledge of basic letter sounds does not suffice for being able to use the grapheme-phoneme correspondences.

Shallow orthographies, however, have a one-to-one relationship between graphemes and phonemes. Kurdish provides a good example, with 31 associations that match the exact number of letters (Bedir-Xan, 1931). There is one to one correspondence between phonemes and graphemes in this writing system. In fact, this means that a non- Kurdish person, who knows the sound of each letter, would be capable of reading aloud a Kurdish text and make it perfectly comprehensible to a Kurdish listener.

Written Kurdish stands in clear contrast to written English, which is a very inconsistent orthography. For example consider the English word 'school', the IPA phonemic representation for this word is

/skul/, and its representation in Kurdish orthography is almost the same as IPA by showing it with four graphemes 'skûl' instead of six graphemes as in English orthography. This highly phonemic alphabet has a great role in reading acquisition and using Kurdish as a written language, especially in Turkey despite the state ban on Kurdish education. But there is no factual data showing the level of literacy acquisition pace among Kurdish learners using this orthography. Considering the fact that there exist two different competent types of orthographies in Kurdish, i.e. Soranî vs. Kurmancî, studying their effects on literacy acquisition, and evaluating them will be of considerable importance in choosing the best one to be the standard orthography as a prerequisite to language standardization.

### **Orthographic depth hypothesis (ODH)**

According to orthographic depth hypothesis (ODH), lexical word recognition in shallow orthographies is mediated primarily by phonemic cues generated prelexically by grapheme-to-phoneme translation. In contrast, lexical access for word recognition in a deep orthography relies strongly on orthographic cues, where phonology is derived from internal lexicon.

While the question of differences between alphabetic orthographies has not received much attention in the field of reading acquisition, it has attracted more interest in studies of skilled reading and lexical access. The issue was first introduced into reading research as a result of findings concerning word recognition processes in Serbo-Croatian and English (e.g. Feldman & Turvey, 1983). These studies revealed that in Serbo-Croatian, word-recognition processes were biased towards phonemic coding, whereas in English, the orthographic processes were more important. Frost, Katz, and Bentin (1987) investigated the psychological reality of the concept of orthographical depth and its influence on visual word recognition in Hebrew, English, and Serbo-Croatian languages. The results were also interpreted as strong support for the orthographical depth hypothesis and suggest, in general, that in shallow orthographies phonology is generated directly from print, whereas in deep orthographies phonology is derived from the internal lexicon.

Two versions of the orthographic depth hypothesis (ODH) exist in the current literature, strong ODH and weak ODH. What can be called the strong ODH states that phonological representations derived from assembled phonology alone are sufficient for naming and lexical decision in shallow orthographies. Thus, according to the strong ODH, rapid naming in shallow orthographies is a result of only this prelexical analytic process and does not involve pronunciation obtained from memory, i.e., the lexicon. However Katz and Frost (1992) accept the role of lexicon in generating phonology and support the weak ODH. In this version, the phonology needed for the pronunciation of printed

words comes not only from prelexical letterphonology correspondences but also from stored lexical phonology, that is to say, from memory.

### **The effect of orthography on the acquisition of reading skills**

Most cross-linguistic comparisons of reading acquisition have been pair wise comparisons of English and a supposedly more regular orthography. One of the earliest studies of this kind was carried out by Öney and Goldman (1984). They compared the pseudo word reading skills of Turkish and American children at first and third grades. The results showed that the Turkish children were more accurate and also faster than the American children at the first grade, the accuracy percentages being 94% and 59%, respectively. At the third grade, the ceiling was reached by both groups, but the Turkish children were still the more fluent readers.

On the other hand research findings show that orthographic defects are time consuming and have a burden on development of children's literacy acquisition. It is important to note that the L1 English speaking beginner reader has been found to need twice as much time to develop basic decoding skills than a beginner reader of a shallow orthography (Seymour et al 2003). This conclusion is in agreement with Bassetti (2006), who has proposed that L2 orthography affects the mental representations of L2 phonology in beginner L2 learners. An essential part of it must be spelling acquisition, which must be carefully designed and taught, so that it will no longer contribute towards generating the wrong L2 English phonology.

Predictability is also an important factor in gaining reading skills. The results of an experiment carried out by Thorstad (1991) suggest that, if the orthography is predictable and invariant, the children use a systematic, phonological strategy and learn to read and spell more quickly and accurately. The cases of this study were English and Italian children, and while English children read fast and inaccurately, the Italian children read slowly and accurately using a systematic, phonological strategy until 10 years, when they read fast and accurately.

The importance of phonological awareness as a central precursor for later developing reading skills is widely accepted. Phonological awareness refers to the child's awareness of sub-lexical segments of speech sounds; the realization that words can be divided into constituent sound segments. Furthermore, the development of phoneme awareness seems to be more rapid in transparent

orthographies than in English. The results from orthographies such as Italian, Turkish, Finnish, Norwegian, Greek and German, show that phonemic awareness is at maximum level relatively soon after the beginning of reading instruction (Cossu, Shankweiler, Liberman, Katz, & Tola, 1988; Durguno lu & Öney, 1999).

Finally in a study Ellis et al (2004) investigated the effects of orthographic depth on reading acquisition in alphabetic, syllabic, and logographic scripts. Children between 6 and 15 years old read aloud in transparent syllabic Japanese hiragana, alphabets of increasing orthographic depth (Albanian, Greek, English), and orthographically opaque Japanese kanji ideograms, with items being matched cross-linguistically for word frequency. This study analyzed response accuracy, latency, and error types. Accuracy correlated with depth: Hiragana was read more accurately than, in turn, Albanian, Greek, English, and kanji. The deeper the orthography, the less latency was a function of word length, the greater the proportion of errors that were no-responses, and the more the substantive errors tended to be whole-word substitutions rather than nonword mispronunciations. Orthographic depth thus affected both rate and strategy of reading.

## **Conclusion**

The development of early reading skills in a shallow orthography seems to be completely dependent on the phonological apparatus of the beginning reader. However, it can be concluded that a shallow orthography treats even a phonologically immature reader in a moderate manner. It helps in explicating the alphabetic principle, the correspondence between spoken and written language. Since the grapheme-phoneme correspondences are regular at the level of single letters it does not trouble the beginning reader with complicated correspondence rules; and together with a systematic phonics teaching it provides the beginning reader with a simple tool for successful word recognition, without the troubles caused by contextual effects and irregularities.

## **References**

1. Bassetti, Benedetta (2006) Orthographic input and phonological representations in learners of Chinese as a foreign language. *Written Language & Literacy*, vol. 9, No 1, pp. 95-114(20).
2. Bedir-Xan, C.A. (1931). *Elfabêya Kurdî û bîngêhên gramera Kurdmancî* (Kurdish alphabet and principles of Kurdmancî grammar). Digital version: NEFEL.

3. Brinton, Laurel J. (2000) *The Structure of Modern English: A Linguistic Introduction*. John Benjamins Publishing Company.
4. Burt Jennifer S. (2006). What is orthographic processing skill and how does it relate to word identification in reading? *Journal of Research in Reading*, Volume 29, Issue 4, 2006, pp 400–417
5. Cahill M. and Elke Karan (2008). Factors in designing effective orthographies for unwritten languages. SIL Electronic Working Papers 2008-001.
6. Carroll D. W. (2008). *Psychology of Language*, 5<sup>th</sup> ed. Thomson Wadsworth.
7. Cossu, G., Shankweiler, D., Liberman, I. Y., Katz, L., & Tola, G. (1988). Awareness of phonological segments and reading ability in Italian children. *Applied Psycholinguistics*, 9, 1.16.
8. DeFrancis, J. (1989). *Visible speech: The diverse oneness of writing systems*. Honolulu: University of Hawaii Press.
9. Durguno lu, A. Y., & Öney, B. (1999). A cross-linguistic comparison of phonological awareness and word recognition. *Reading and Writing: An Interdisciplinary Journal*, 11, 281.299.
10. Ellis et al (2004). The effects of orthographic depth on learning to read alphabetic, syllabic, and logographic scripts. *International Reading Association* (pp. 438–468).
11. Feldman, L. B., & Turvey, M. T. (1983). Word recognition in Serbo-Croatian is phonologically analytic. *Journal of Experimental Psychology: Human Perception and Performance*, 9, 288.298.



## ZIMAN Û NETEWE

**Nûsînî: profêsor Peter Trudgill**

**Wergêran le Inglîsiyewe: Hesênî Qazî**

Le bendî pêşûy em kitêbe da sebarek be çilonayetî komelnasî zîman le Kampala û Uganda cexitman le ser dû şit kirdewe. Yekemyan eweye lewê zor le takuterayan yan dûzimane yan frezîmanen - wate ewan detuwanin be ziyatir le zîmanêk ta astêkî rewan qise biken. Xalî duwem eweye, ew helumerce akamî ew rastiyeke ke ew komeley ewanî têda dejîn komelêkî firezîmanî ye.

Dûzimane bûnî take kesî bew şeweye de rastî da akamî pêwîstî frezîmanî komelayetî yan neteweyî niye: komeley firezîmanî ewto hen ke têyanda zor le axêweran nabin be dûzimane ta pileyekî girîng – bo nimûne, Swîs – û dûzimaneyî take kesî egerçî zor lewe berbilawtîre lewey bikirê be zeynî axêwerêkî Inglîsî biga, be hîç cor diyardeyekî dinyagirewe niye. Belam frezîmanî komelayetî de rastî da, le astî cîhanî da diyardeyekî zor berbilawe. Ew çilonayetiye frezîmanîyey ke le Uganda weberçaw dekewê ziyatir qa'îdiyeke ta ewey rêzper bê. Zorbey here zorî dewlet – netewekanî dinya le çuwarçêwey sinûrekanyan da ziyatir le zîmanêkî xocêyîyan têdaye ke qiseyan pêdekirê. Le hêndêk nimûnanda wekû Kamêrûn yan le Papua le Gîney Nwê, jimarey zîmanan lewane ye bigate sedan zîman ( egerçî hasan niye be wurdî diyarî bikirê ke zîmanêk çiyê, be leber çawgirtinî ew dijwariyey le bendî yekemda hêmanan pêkird, bo ewey ke jimareyekî wurd sebarek bew nawçaney wek emane be destewe bidrê).

Netewegelî frezîman le gişt beşekanî dinya da hen, û miro detuwanê zor nimûnan bas bika. Kêşe û dijwarî ew demî dête gorê eger miro hewil bida şwêngêrî wulatêk bika ke be rastî takzîmane ye. Wa wêdeçê wulatî ewto le çend cêyek ziyatir nebin. Tenanet le Urûpaş zor nimûney rasteqîney ewto nîne, egerçî ême deqman pêgirtuwe wa bîr bikeynewe ke zorbey dewlete Urûpayîyekan tak zîmanen. Zorbey xelik ewe be qiseyekî rast dadênên eger bigutrê Almaniyekan be Almanî, Feranseyîyekan be Feranseyî û htd. dedwên. Ho û songey baş bo eme bedestewe ye, belam rastî ew babete ta radeyek ciyawaze. Teqrîben gişt wulate Urûpayîyekan kemayetî zîmanî bûmî (xocêyî) yan têdaye - destey axêweran ke şewezarî xocêyîyan zîmanêke cwê lew zîmaney ke zîmanî resmî, zal yan zîmanî serekî ew wulateye ke têyda dejîn. Islend, ke têyda le sedasedî danîştûwanî xocêyî



ewê axêweranî zîmanî Islendîn, rêzperêke lew qa'îde û pêwane ye. Le hêndêk nimûnanda, lew cêyaney ke kemayetiyeke be rêje gewrene, dewlet – netewe be asayî ziyatir le zîmanêkî resmî heye. Nimûnegelî ewe Bêlîjk ( zîmanî Holendî – ke le bêlîjk be Filamanî be nêw dekrê- û zîmanî Feranseyi), Swîs( Almanî, Feranseyi, Italiyayî û Romanş), û Fenland ( Fenlandî û Swêdî)n.

Lew cêyaney ke kemayetî piçûktire yan kemtir be destelate, wênaçê zîmanî kemayetî yan zimangeli kemayetî piley resmîyan hebê , û axêweranyan, zor car tenê le ber pêdawîstî be kirdewe û piratîkî, meylî dûzîmane bûnyan têda be dî dekirê. Em hokarey duwayî ew şiteye yarmetî deka bew bawerey ke Urûpa le derewey xoy ruwaletêkî tak zîmanî peyda bika. Zorbey here zorî hawwulatiyanî Feranse detuwanin be Feranseyi bidwên, sere ray ew rastiyeke ke bo jimareyek le wan ew zimane zîmanî duweme. her ew core helûmerce le şanîşînî Yekgirtû (Birîtanya)ş heye. şanîşînî Yekgirtû hemû ruwaletêk denwênê bo ewey be wulatêkî tak zimane dabindrê, û ewaney serî lêdeden be dilniyayiyewe hewcêyan bewe niye cige le Inglîsî nebê hîç zîmanêkî dîke bizanin. Legel eweşda, ew ruwalete ta radeyek helxeletênere. Ewe raste Inglîstan leweta kûjanewe û damirkanî zîmanî Kornîş le Sedey Hejdehemda, hîç zîmanêkî kemayetî xocêyi nebuwe, belam êsta lew wulate da destey axêweranî be ejimar zor le zîmananî têda dejîn ke le şwênî cor be corî cîhanewe hatûn, lewane, bo nimûne, le şêwey qarey Bakûrî Hîndûstanewe, wekû Puncabî û Bengalî ( û her weha miro detuwanê bilê zîmanî yekemî zor le xelkî Birîtaniyayî kon ke reçekekî Hîndî Rojawayiyan heye Inglîsî niye, egerçî zorîşî wêdeçê – birwane bendî noyemî em kitêbe). Le nêw zimane xocêyiyekanda Weylzî , zîmanî yekemî yek le pêncî danîştûwanî Weylz e, û Geylîkî Skatlendî nizîkey 70000 xelkî xocêyi qisey pêdeken, ziyatir le berzayiyekan (Highlands) û durgekanî Hebirdeanî Skatlend.

Dirêjbûnewe û radey firezîmanî neteweyî (sertaserî) le Urûpa lem lîstaney xuwarewe da nîşan dirawe. Lîstî yekem, ke hemû layene niye, ta radeyek ewe nîşan deda ta çî radeyek zimangeli bandestî resmîy neteweyî le wulatanî taybetîda le layen kemayetî zîmanî le cêy dîke da qiseyan pêdekirê

**zîman**

**kemayetî zîmanî xocêyi qisey pêdeken le**

Almanî  
Sirbiya,

Danimark, Bêlîjk, Feranse, Italiya, Silovêniya,  
Romanî, Rûsiye, Okrayn, Qazaxstan, Mecarstan, çêk, Lehistan

Tirkî	Yonan, Meqdûniye, Sirbiya, Albanî, Bulxarstan, Romanî, Moldavî, Okrayn
Yonanî	Italiya, Meqdûniye, Albanî, Bulxarstan, Romanî, Okrayn, Tirkiye
Albaniyayî	Yonan, Sirbiya, Montênêgiro, Meqdûniye, Italiya
Mecarstanî	Utirîş, Sirbiya, Romanî, Slovêniya, Slovakiya, Okrayn
Fenlandî	Swêd, Norwêj, Rûsiye
Swêdî	Fenland
Feranseyî	Italiya
Lehîstanî	Lîtwanî, çêk, Okrayn
Bulxarî	Romanî, Yonan , Okrayn
Holendî	Feranse
Italiyayî	Slovêniya, Kirwatiya
Rûsî	êstonî, Latvîa, Lîtwanî, Okrayn
Okrayniyayî	Romanî, Slovakî, Lehîstan
Slovakiyayî	Mecarstan, Romanî, çêk
çêkî	Lehîstan, Romanî, Slovakî
Slovêniyayî	Utirîş, îtaliya
Meqdûniyeyî	Yonan, Albanî

Lêtwaniyayî	Lehîstan
Romaniyayî	Yonan, Bulxarstan, Albanî, Sirbiya, Meqdûniye

helbet jimareyekîş ziman le [Urûpa] hen le hemû cêgayek zimangeli kemayetîn. hêndêk lemane ewaney xuwarewen:

ziman le kuwê qisey pêdekirê:

Samî (Laplendî) Norwêj, Swêd, Fenland, Rûsiye

Frîsiyayî Alman, Holend

Bask êspaniya, Feranse

Katalanî êspaniya, feranse

Birêton Feranse

Sorbiyayî Alman

Kaşubiyayî Lehîstan

Weylî şanşînî Yekgirtû

Geylîk şanşînî Yekgirtû

Cige lemane, zimanê Yîdîş ( Cûlekeyî Almanî ) û Romanî ( zimanê xelkî Roma) wekû zimangeli kemayetî le beşe corbecorekanî wîşkaroy [ Urûpa] be berbilawî qiseyan pê dekirê. ( çilonayetî naasayî Geylîkî Irlendî le xuwarewe basî lêwe dekeyn. )

Ke wabû, gişt dewletekanî Urûpa ta radeyek fire zimanin. Renge firezimantirîn wulatî Urûpa, cige le Rûsiye nebê ( ke helbet , herçonêk bê zorbey xakekey dekewête Asiya), Romanî bê. Destey zimanî here gewre de naw 24 mîlyon danîştûwanî ew wulate da zimanî Romaniyayî zimanî daykiyane, belam lew wulate da be lanî kemewe 14 zimanî dîkeş wekû zimanî xocêyî qiseyan pê dekrê. Jimarey wurd û tewaw be destewe niye, belam xelkî Romay Romaniyayî axêwer gewretirîn kemayetîn u be lanî kemewe 10 le sedî danîştûwan pêk dehênin, destey gewretirî kemayetî birîtîn le Mecarstaniyekan, Almaniyekan, û Cûlekekan ke be zimanî Yîdîş yan, le hêndêk nimûneyanda, Ladîno wate Cûlekeyî Êspanyayî qise deken. zimangelî dîkey kemayetî birîtîn le Rûsî, Okrayniyayî, Sirbî, Slovakiyayî, Tartarî, Tirkî, Bulxarî, çêkî, Yonanî û hermenî.

Firezimanî bew berbilawîye aşkiraye bo hukûmetekan û destelatdarî cor be corî rêkxirawe neteweyeyekan kêşe û dijwarî saz deka,ême duwatir basî em core kêşe û girftane dekeyn. Firezimanî be her radeyek bê, legel xoy gîrugirft bo takekes yan destey takuterayan dexulqênê, be taybetî bo ew kesaney ke endamî kemayetiye zimaniyekanin. Be pêçewaney endamenî destey zorbey zimanî, ewan debê be lanî kemewe dû zimanan baş fêr bibin bo ewey bituwanin wekû endamî tewawî komeleyekî sertaserî ke le nawyan da dejîn berey xoyan le qurawê derkêşin. Renge gewretirîn kêşey ke le ber demyan qut bêtewe perwerde bê. Le hêndêk nimûnan da, renga, ew kêşe û girfte zor tund nebê, çunkû ew dû zimaney karyan pêdekrê le wane ye be taybetî hênde ciyawaz nebin. Bo nimûne ew mindale Firîsiyayî zimananey ke fêrî Holendî debin qet tûşî ew core dijwariyane nayan ke dête ser rêy mindalanî Samî axêwer bo fêr bûnî zimanî Swêdî, çunkû Firîsiyayî û Holendî zimangelî zor leyekewe nizîkn. Yan lewane ye siyasetî perwerdey wulate pêwendîdareke le ruwangey zimaniyewe ewende jêrane û hemûlayene bê, û mindalan le qonaxe berayiyekanî çûne xwêndinge da , ke hemîşe debê awa bê, xwêndinewe û nûsîn be rêgey zimanî xocêyî xoyan fêr bin, û zimanî zorbeyan duwatir fêr bikrê. Ew şêwe boçûne le zorêk le beşekanî wulatî Weylz da reçaw kirawe, her weha le Norwêj û cêgay dîkeş. Amanc le bekar hênanî ew core şêwe perwerde kirdine ewe ye mindalan tuwanayî eweyan hebê hem be zimanî xocêyî xoyan û hem be zimanî zorbe bixwêninewe, binûsn û qise biken. Le nimûnegelî dîke da mindalî ser be kemayetî lewane ye tûşî dijwarî û kêşey gewre bê. Eweş katêk dête gorê ew dûzimaney karyan pêdekrê le yektirî nizîk nebin, û her weha leweş girîngtir, katêk siyasetî perwerdey dewlet – neteweyekî taybetî yan piştî zimangelî kemayetî nagirê, yan layan lê nakatewe û çawyan lê heldebwêrê û deyan xate pişt gwê. Le nimûney zor tîjper da zimanî kemayetî lewane ye qedexe bikrê yan bo ders dadan le xwêndinge be pesind nezandrê. Ew şêweye le pêşû da hem sebarete be zimanî Weylzî le Weylz û hem le mer zimanî Geylîk le Skatlend awa bû – le rastîda

serdemêk qanûnêk karî pêdekra ke de rastîda be pêy ew qisekirdin be zimanî Geylîk naqanûnî bû – û şêweyekî ewtoş be salanî dûrudrêj siyasetî hukûmetî Tirkîye buwe sebarete be zimanî Kurdî.

Karlêkerî dasepandinî zoremlî zimanêkî neteweyî (sertaserî) bêgane wekû Inglîsî yan Tirkî dekrê zor cîdî bê. Ladanî zoremlî zimanêkî û şwênpirkirdinewey be zimanêkî dîke hewlêke bo binebir kirdin û nehêştinî kultûrêk be tewawî, lewane ye ewe nîşaney têruwanînekî nametîqî êtinîkî bê ( ' Weylziyekan le Inglîsiyekan ' kemtirn' 'Kurdekan her nîn') 'û ewe zor be cîdî çet le pêşweçûnî perwerdeyî mindalan dexta ke debê zimanêkî taze fêr bin ber lewey btuwanin lewe têbigen mamosta basî çî deka, çî dega be fêr bûnî xwêdinewe û nûsîn.

Ew boçûne be salanî dirêjîş siyasetî perwerdeyî bû le Dewlete Yekgirtuwekanî Emrîka, ke her nebê ta radeyek le gel ruwangey berbilawtirî komelayetî lemer zimanî kemayetî da, berpîrsî tuwandinewey xêra û berbilawî zimane kemayetiyeke bû de zimanî zorbey Inglîsî axêwer da ( bo agadarî ziyatir sebarete be bar û doxî tazetirî bizûtnewey goya ' tenê Inglîsî' le Dewlete Yekgirtuwekanî Emrîka biruwane bendî 10-î em kitêbe. )Êsta, hengawî berbeçaw bo bojandinewe û bexodahatinî zimanî hêndêk le destê kemayetiyeke helhêndrawetewe, be taybetî Êspaniyayî axêweran û Hîndiyekanî xocêyî Emrkayî, ke bo yan heye be zimanî xoyan perwerde bibînîn, hêndêk hengawî dîkeş nirawetewe: bowêne agadarî giştî le şarî New York, hem be zimanî Êspaniyayî û hem be zimanî Inglîsî heldawesrên,eweş be mebestî karhasanîkirdin bo civatêkî gewrey Portorîkayî ke lewê dejîn. Le gel eweşda, tenanet ew kemayetiye zimanîaney dî ke gewretir , û ziyatir danîştuwî derewey şare gewrekanin wek ewaney ke birîtin le axêweranî zimanî Feranseî ( le Bakûrî Rojhelat û le Louisiana) û axêweranî Holendî pênsîlvaniyayî ( şêweyek le zimanî Almanî) be xêrayî le jimareyan kem debêtewe. le salanî 1970 kanda, 10 kemayetî here gewrey zimanî le Dewlete Yekgirtuwekanî Emrîka awa bûn:

Êspaniyayî 7 mîlyon û 900000

Almanî 6 mîlyon û 200000

Italiyayî 4 mîlyon

Feranseî 2 mîlyon û 600000

Lehîstanî 2 mîlyon û 300000

Yîdîş 1mîlyon û 500000

Norwêjî 600000

Swêdî 600000

Slovakiyayî 500000

Mecarstanî 500000

Be giştî , nizîkey 34 mîlyon Emrîkayî êsta zîmanî daykiyan zîmanêke cwê le Inglîsî.

Be xoşiyewe, boçûnî ' her tenê Inglîsî' û ew ruwanganey pêyewe likawn êsta be tewawî le şanoy perwerdey şaşînî Yekgirtû ( Birîtaniya)ş bizir buwe,egerçî zor le axêweranî zîmanî Weylî û Geylîk hen wenebê hêndyan dil be pile û statusî zîmanekanî xoyan xoş bê û lêy razî bin. Le weta 1918 rêge dirawe be xwêndinî Geylîk le xwêndingekanî Geylêk axêwerî nawçekanî Skatlend,egerçî ta 1958-î xayand bo ewey wekû amrazêkî perwerde û fêrkirdin bekar bihêndrê,eweş be şêwey serekî bo mindalanî piçûktir le xwêndinge seretayiyekanda. Bo zorbey mindalan, be taybetî le xwêndinge nawendiyekanda,Inglîsî hêsta amrazî perwerdey asayîye, eweş manay ew ebuwe zor le axêweranî zîmanî Geylîk deçne ew core xwêndingeyane ke zorbey endam û şagirdanyan mindalanî na Geylîk axêweran.

Wez'î zîmanî Weylî le şaşînî Yekgirtû be şêweyekî berçaw zor le helwêstî zîmanî Geylîk pitewtir e. Ew zîmane axêwerî ziyatir e, be rêje katêkî baş bo bilaw kirdinewey bernamêy radyoyî û tilêvîzyonî be zîmanî Weylî terxan kirawe (egerçî ewendeş niye ke miro pêy xoş bê). Her wek nimûney Geylîk, le mer Weylîş boçûnî siyasetî konî perwerdeyî egerçî nemawe belam be lînge firteş bê xoy der dexa. êsta zor le xelkî betementir, le katêkda be rewanî be zîmanî Weylî qise deken, belam qet fêrnebûn bînûsn. Ewan tenanet debê namey zor taybetî xoşyan be zîmanî bêgane, wate Inglîsî binûsn, û zor car boyan asteme Weylî standard bixwêninewe. Henûke helumerc zor baştir buwe, û be taybetî le berayiyekanî salanî 1930 yekanewe helumerc gorawe. Her lew serubende da be şêwey cîdî ders dadan be zîmanî Weylî le zorêk le fêrge seretayiyekan le nawçey Weylî axêwer da destî pêkird,egerçî dewrî ew zîmane le xwêndinge nawendiyekanda zor kem bû. Le akamda, le salî 1953 da, raportêk bilaw kirayewe ke lelayen wezaretî perwerdey Birîtaniyawe pesind kira: ew raporte pêşniyarî kird le Weylî gişt mindalan debê hem fêrî Weylî û hem Inglîsî bikirên. Ew siyasetî dû zîmaneyîye êsta be berbilawî wexo kirawe û pêroyî lêdekirê, egerçî çilonayetî rasteqîne taradeyek aloz û pêçelpêçe çunkû siyasetî perwerdeyî le her nawçeyek da le layen destelatdarî nawçeyîyewe biriyarî le ser dedrê. Legel eweşda, miro be giştî detuwanê bilê le zor beşekanî Weylî da,çi înglîsêndrabin yan na, miro dekrê hêndêk xwêndinge çî le astî seretayî û çî le piley nawendî da bibînê ke têyanda zîmanî Weylî tenê wekû babetêk be ders dekuwêrê,û le hêndêkî dîkeyanda be tenîşt

zîmanî Inglîsiyewe wekû amrazî perwerde bekar dehêndrê û tenanet xwêndingey ewtoş hen ke têyanda Weylî tenya zîmanî perwerde ye û Inglîsî her wek babetêk dexwêndrê. Pêşweçûnêkî çawrakêşî dîke destgay polî sawayan û pêşxwêndingeyê ke betewawî Weylî axêwern belam zor le daykubawkanî Inglîsî zîmanîş mindalekanî xoyan denêrne ewê bo ewey ewan wek dû zimane gewre bin. Be ruwalet, wekû, zor le xelkî Irlendî hêndêk lew daykubabe Weylîyane hest deken be wexo kirdinî zîmanî Inglîsî ewan yan dayubapîranyan be şêweyek le şêwan le ast nerîtî kultûrî xoyan wefadar nebûn, û hîwadarin mindalekanyan btuwanin toley ewe bikenewe û barudoxeke rast kenewe. Wêdeçî karubarî xwêndingekan zor be başî helsûrê, û wa denwênin ke le wecî dahatû da le wane ye jimarey ew kesaney be rewanî be zîmanî Weylî qise biken ziyad bika. Le rastî da, ejmarî duwayîn pêwanekan nîşan deden dakişanî jimarey axêweranî zîmanî Weylî îdî êsta pêşî pê gîrawe, û ew derfet û deretaney heyane rûy le ziyad bûne. Legel eweşda dahatûy zimane Sêltîkekan le Bîrîtaniya hêşta zor nadiyar û narûne. Le salî 1831 jimarey axêweranî Geylêk le Skatlend ke 136000 kes bû le salî 1931 ta 81000 dakişa, her le heman serubend da jimarey axêweranî zîmanî Weylîş le 902000 kesewe dabezî bo 656000 kes. Yekêk lew kêşaney rûberûy axêweranî zîmanî Weylî hat hatinî Inglîsî zîmanan bû bo Weylî ke nek her amade nebûn xoyan fêrî zîmanî Weylî ken belkû beweş naqayil bibûn mindalekanyan perwerdey zîmanî Weylî bibînin, boçûnêk ke hîç lêy naweşêtewe pesin bidrê.

Fêrkirdinî zimangêlî kemayetî bem şêweye be aşkirayî be qazancî mindalanî destey kemayetiye, nek tenê le fêrbûnî xwêndinewe û nûsînda, belkû le babetekanî dîkeş da. Ewe herweha karlêkerî nasînî nasêne û yekangîrbûnî kultûrî û komelayetî mindalekey be dû da dê û debête hoy la lêkirdinewe û berewpêşçûn û bexodahatinî kulturgêlî kemayetîş. Le heman kat da destrageyştinî mindaleke be zîmanî zorbeş berbest naka û lêy bêbeş nabê, ke wêdeçê pêwîst bê bo wegerkewtinî berew jûrî komelayetî. Ew axêweraney Geylîk û Weylî ke zîmanî Inglîsî dezanin detuwanin zor helsûrawanetir wekû endamanî komelêkî berîntir bicûlênewe. Diyare eger ewan wîstêkî ewtoyan hebê.

çilonayetî zimangêlî kemayetî dîkey Urûpa le biwarî perwerde da ta radeyekî berçaw le yek ciyawaze, ew core zimananey, wekû Almanî, ke le cêgay dîke zîmanî zorben îmtiyazêkî aşkira û rûnî kirdeweyan heye be ser zimangêlî wek Geylîk û Samî (Laplendî) da ke kereste û babetî fêrkirdin û xwêndin û xwêndineweyan yekcar zor keme. Le layekî dîkeşewe, ewan dekrê le wulatanî der û dirawsê da helkewtêkî siyasî lawaz û hejaraneyan hebê. Zîmanî Almanî le Feranse zor kem lay lêdekirêtewe; zîmanî Meqdûniyeyî le Yonan çalakane pişt gwê dexirê; û helkewtî kemayetî zor

gewrey Mecarstanî le Romanî, Slovakiya û Sirbiya zor dijaware. Le layekî dîkewe zîmanî Firîsiyayî le Holend ta radeyek piştgîrî lê dekirê û destî beser da dê, herweha le wulatanî Skandînaviyaş hewl dirawe bo pêşxestîni perwerde be zîmanî Samî (Laplendî). Yek lew zîmananey lew bareyewe be taybetî zor xirap mamley le gel kirawe zîmanî Romanî, wate zîmanêkî be reçek Bakûrî Hîndûstaniye ke xelkî roma (Qereçiyekan)\* qisey pêdeken. Ew çilonayetiye be taybetî lew wulatane da we ber çaw dekewê ke têyanda xelkî Roma kemayeti zor gewrene belam deretanêkî zor kemyan, lecêda hîç derfetêkyan niye bo ewey be zîmanî xoyan perwerde bibînin, wek le Slovakiya û Mecarstan. Leweş ziyatir, ew raportaney le salî 1999 we le wulatî çêkewe hatûn, ewe nîşan deden lew wulate xelkî Roma be şêwey asayî lew core xwêndingeyaneda cêyan dekrêtewe ke bo kesanî duwakewtû le barî perwerdeyîewe dandirawin be bê ewey hîç core sirincêk bew rastiye bidrê ke lawazî ewan le xwêndinda le ber ewey ke hîç zîmanî çêkî nazanin. Le layekî dîkewe, le Bakûrî Yonan, hêndêk bernamêy ber tesik bo xwêndewar kirdinî mindalanî Romanî axêwer pêş xirawe.

Lew cêyey zîman xesletêkî diyarkerî (birwane laperey 44-î em kitêbe) desteyekî êtinîkî ye ke daway serbexoyî deka, be taybetî lew şwêney ke xesletekanî dîke (bo nimûne xesletî tebîî) girîng nîn (wek nimûney zîmanî Weylzî), lewaneyê hokare zîmaniyekan dewrêkî girîng bigêrin le her bizûtineweyekî ciyawazîxwazî da ke ew girûpe werêy dexa. Ewe beşêkî bo wulamdanewey gîrugirfte kirdeweyîekane, wekû perwerde, belam be şêwey serekî akamêkî ew rastiye ke zîman, her wek ta êsta lem kitêbeda dîtûmane (laperey 12), wekû remzêkî girîngî huşyarî desteyî û hawpêwendî heldesûrê. Ewey ew rastiye deselmênê lew dewre da xoy derdexa ke destê zîmaniyekan le berew pêşbirdinî netewegelî nwêy serbexo le Urûpa gêrawyane le duway helweşanî împiratoriye firezîmaniyekanî kontir da. Be dem geşanewe û bûjanewey wuşiyarî neteweyî, zîmanî wekû Fenlandî û çendîn zîmanî dîke, edebîyatêkyan pêşxst, rêbazî standard bûnyan girte pêş, û wek zîmananî neteweyî lew nawçaney ke ta radeyekî zor takzîmanî bûn, seryan helhêna, ewe katey ke serbexoyîyan we dest hêna.

Boye serhelhênanî xêray dewlet – netewey serbexoy Urûpayî le mawey sed sal û kisûrî rabirdû da, hawterîb buwe le gel bexodahatinî xêray jimarey zimangelî serbexo, neteweyî û resmî. Le mawey Sedey Nozdehemda jimarey zîmanan le [Urûpa] le şazde zîmanewe geşte sî zîman, û lewe ta ewdemî ew jimareye le 50-î têperanduwe. Be cêye lêre da hêndêk wêney qonaxekanî ew pêşweçûne bikêşînewe, be taybetî leber ewey arasteke be tewawî her berew layek nebuwe. Bo



nimûne, le mawey Sedekanî Nêwerast da, hêndêk le zimanekan – wekû Pirovênşal û Almanî textayîyan ( birwane xwarewetir) û 'Erebî – îtir dewrî zimananî resmîy standardyan nema (ewey duwayîyan tenê le Urûpa), le katêkda ewanîtir – Inglîsî û Norwêjî – bûne yek, tenê duwatir wek zimanî serbexo seryan heldawe. Ta salî 1800 kan ew zimananey xuwarewe wekû zimangelî neteweyî le Urûpa heldesûran ( cige le Rûsiye nebê):

Islendî, Swêdî, Danmarkî, Almanî, Holendî, Inglîsî, Feransewî, Êspaniyayî, Purtugalî, Italiyayî, Lehîstanî, Mecarstanî, Yonanî, u Tirkî. Ta salî 1900 kan em zimananey xuwareweş wek zimangelî standardî neteweyî, resmî yan nûsîn derkewtin (yan dîsan seryan helhênawe): Norwêjî, Fenlandî, Weylî, Romaniyayî, û zimane Silaviyekan çêkî, Silovakiyayî, Silovênîyayî, Sirbû – Kirowatî. Û le mawey paşmawey

edey Bîstemda Geylîkî Irlendî, Geylîkî Skatlendî, Birêton, Katalanî, Romanş, Meqdûniyeyî, Albanîyayî û Bask giştîyan standard kiran, bûjandranewe yan pereyan pêdra. Zimanêkî here duwayî ke le salanî 1990kanda, le mane ziyad buwe, her wek bînîman, zimanî Lugzamburgîş bû.

Kêşekanî barudoxî firezimanêtî bo takekes dekrê yan be rêgey serbexoyî siyasî, yan şêwe-serbexoyî, yan, kemtir tundajoyane, be rêgey bername û siyasetî becê û durustî perwerdeyîyewe derdest yan kem bikrênewe. Başê, kêşegelî firezimanêtî bo hukûmete neteweyîyekan çin? Mixabin zor le hukûmetekan ew rastiye be kêşeyekî gewre dadenên ke ziman detuwanê wekû çeçî narezayetî ew kemayetîyane helsûrê ke destelat, serbexoyî, yan peywest bûn û legel kewtinî dewletêkî dirawsêyan dewê. Lew cêgayaney hukûmetekan ewe be hereşe yan newîstû û dilnexwaz dananên, lewane ye legel kemayetiye zimaniyekan be başî bicûlênewe (yan be sadeyî her xoyan tenegeyênin). Bo nimûne, hukûmetî modêrnî Birîtaniya, zor be cîdî helneker niye, egerçî bedaxewe lewaneye çî gwê nedate axêweranî zimanî Geylîk. Hukûmetekanî Skandînaviya, her awa, aşkiraye ewan çî şitêkî newîstû û dilnexwaz le zimanî Samî da nabînin û tirsyan lêy niye. Hukûmetî komarî Irlendîş, çalakane piştîwanî le zimanî kemayetî deka (ştêk le naw 1 ta 3 le sedî danîştûwanî ewê zimanî xocêyîyan Irlendî ye û qisey pêdeken), û hukûmet xwêndinî ew zimaney le xwêndingekanda kirdûwete babetêkî tobzî. Helbet, eweş, leber ewey ke Irlendî le pêşû da zimanî gişt Irlendîyekan buwe û bem çeşne remzî kultûr û nasêney neteweyî ye ta ewey ke nîşaney hîç core narezayetiye bê.

Le layekî dîkewe, lew nimûnaneyda ke hukûmetekan bedaxewe kemayetiye zimaniyekan be tuwanayekî be 'têkder' dadenên, dekrê zor ciyawaz û gewcane bicûlênewe û le rasteqîney komelgelî

kemayetî zîman tênegen ke le cêyî dî nasrawin û başyan mamle legel kirawe,bo nimûne le perwerde da,û eweş derfetî ewey xulqandewe ke kemtir narazî bin. Tirsî ew core hukûmetane ke rîşey le boçûnî nalîbêral û nêwendxwazîyan aw dexwatewe,zor car dekrê awa pasaw bidrê: wefadarî û pêbendî zîmanî dekrê çekêkî behêz bê,û zor car bo wedest xistinî berjewendî siyasî bekarhêndirawe. Le zor nimûnan da zîmanêkî kemayetî serkutkiraw yan la lênekirawe detuwanê zîmanî dewletêkî dirawsêy dijberîş bê – eme lemer Meqdûniyeyî le Yonan,Silovêniyayî le Italiya,û Almanî le Feranse û Italiya werast degerê -û tirs lewe daye pêbendî zîmanî lewaneye behêztir bê le bestiranewey neteweyî (dewletî). Le nimûnegelî dîkeda zimangelî lalênekirawey kemayetî lewaneye be sadeyî wekû amrazêk bo wurûjandinî narezayetî bekar bihêndrên, çunkû deste kemayetiyekeyan hoyekî zêdebûyan bedestewe ye bo ewey le çarenûsî xoyan narazî bin û pêy qayil nebin.

Yek lew zîmananey ke mêjûyekî demkutkirdinî le songey ewto we heye zîmanî Katalanî ye. Katalanî zîmanêkî Romî ye û teqrîben her ewendey ke le Feranseyî nizîke her awaş le êspaniyayî. Ew zimane le êspanya nizîkey hewt mîlyon kes qisey pêdeken- le Katakoniya, valênsiya û durgekanî Balearic – her weha nizîkey 250000 kesîş le Roussillon le Feranse qisey pêdeken,û desteyekî zor piçûkîş le Sardîniya (le Italiya). Ew zimane yekêk le dû zîmanî resmiye le Andora ( ewî dîyan Feranseyî ye). Ta berayiyekanî Sedey Hejdehem ew zimane le Kataloniya zîmanî resmî, îdarî nûsîn bû ta ew nawçeyey weser Castile (êspaniya) xira. Le akamda,le salî 1768,be pêy fermanî hukûmet zîmanî êspaniyayî le xwêndingekanî pêşûy Katalanî da sepêndra,û duwatir le salî 1856 qanûnêk pesnid kira ke raygeyand gişt sened û belgey siyasî û peymannamey qanûnî debê be zîmanî êspaniyayî binûsrên. Lîbêralîze kirdinî ew siyasete le jêr hukûmî komarî da le nêwan salanî 1931 ta 1939 berêwe çû. Mindalanî Katalanî zîman be zîmanî Katalanî perwerde dekran,le heman katda derfetî eweş rexsêndira mindalanîêspaniyayî axêwer le nawçey Katalan da perwerdey xoyan be zîmanî êspaniyayî dest pêbiken,û le temenî desalî da her kam le destekan destyan kird be fêrbûnî zimanekey dîkeş. Legel eweşda,le jêr hukmî dîktatorî Franko da carêkî dîke zîmanî Katalanî le xwêndingeyan be tewawî qedexey kira û kursî zîman û edebîatî Katalanî le zankoy Barsélona helweşawe. Deqî kitêbî Katalanî şwênbizir kiran, û mindalanî Katalan carêkî dîke debû perwerde û xwêndinî xoyan beêspaniyayî dest pêbiken û tewawî ken. Piştîwananî zîmanî Katalanî îdî'a deken hukûmetî Franko le binaxewe xesletêkî ' nasîonalîstî Kastîliyanî' hebû,û be aşkirayî bekarhênanî Katalanî be meylî ciyawazîxuwazî dadena û lêy peşêw û nîgeran bû. Zîman remzêkî nasêney desteyî ye, û herkes hewil bida bo sazîkirdinî dewlet – neteweyekî yekgirtû, be taybetî le çeşnî yekparçeyî Franko; her core nîşane û meylêkî nasêneyekî ciyawaz be dilnexwaz û newîstû yan be metirsî dadenê. Jêrdeste kirdinî zîmanî

(yan yekxstînewey zîmanî, be pêy ewey ke miro çonî lê birwanê) boye sitratêjîyê girînge le cêbecêkirdinî jêrdestekirdinî siyasî (yan yekxstînewey siyasî ) da.

Le salekanî kotayî rêjîmî Franko da barudoxî zîmanî Katalanî ta radeyek guşarî le ser kem buwewe. Kitêbêkî zor be Katalanî derkewtin û dû rojnamey mîzahî mindalan û kowarêk bew zimane destyan be bilaw kirdinewe kird. Legel eweşda, hêştta hîç rojnameyek nebû û katî bilawkirdinewey radyo û têlêvîzîonî heta bilêy kem bû. Le hemuwan girîngtir ewe bû le xwêndingeyanda, Katalanî hêştta qedexe bû. Eweş manay awa bû mindalanî Katalan ke bo yekem car deçûne xwêndinge, neyan detuwanî lewe têbigen mamostake delê çî – be lanî kemewe le çendîn hewtûy yekem da – û ewan be bê ewey bituwanin zîmanî xoyan bixwêninewe yan binûsn gewre debûn megîn ewey daykubawkan zehmetyan dabaye ber xoyan û le malê fêryan kirdiban. Kêşey zîmanî ta radeyek bew birgeyey xuwarewe be zîmanî Katalanî û wergêrawe êspanyayîyekey aşkira debê.

**Katalanî:**

Maigret escolta distret, tot pensant qwe la meitat de Paris està de vacances i que la resta, en aquesta hora, bew begudes freques a les tauletes de les terrasses. Quina comtessa? Ah si! L'home trist s'explica. Una senyora que ha tingut més d'un revés de fortuna i que ha obert ub salo de bridge al carrer Pyramides. Una dona ben bonica. Es nota que el pobre home n'stà enamorat. - Avui, a les quatre, he agafat un bitllet de mil de la caixa dels amos.

**êspaniyayî:**

Maigret escucha distraidamente, pensando que medo Paris està de vacaciones y que el resto a estas horas estará tomando refrescos en las mesitas de las terrazas. Que condesa? Ah, si! El hombre triste s'explica. Una senora que ha surfido más de un contratempo y que abiro un salon de bridge en la calle Piràmides. Una mujer muy guapa. Se conoce que el pobre hombre està enamorado- Hoy, a las cuatro, he cogido un billete de mil de la caja de los duenos.

**Kurdî nêwerast:**

Maigret her nîwe gwê degirê, pêy waye nîwey Parîs le pişû daye, û ewanî dî, lem se'ate da, le derewe le piyadero bedewrî mêzanewe [danîştûn ] û xuardinewey sard dexonewe. Kame kontês? eha erê ! piyawew xembareke delê. Ew yayey ke ziyatir le carêk nehametî tûş hat û le şeqamî Pyramides yaneyekî birîcî kirduwetewe. Jinêkî ta bilêy cuwane. Wa wêdeçê ew piyawew

xefetbare dilî pêwey bê. " emro, le se'at çuwar  
emin eskînasêkî hezar firankîm le serkarekan wergirt' bo'

Legel eweşda, leweta dêmokrat bûnî êspaniya le salanî 1970kanewe, barudoxeke heta bilêy gorawe. Helkewt û çilonayetî zimanî Katalanî yekcar baş buwe û zor lew kêşaney le serewe basyan lêwe kira ta radeyekî zor nemawin û şwênbizir bûn. Katalanî gerawetewe biwarî mîdiya û perwerde,ew biwaraney ke lêy qedexe kirabû.

Her ew core engêze û hokare palpêweneraney sebarete be cûlanewey hukûmetî pêşûy êspaniya le mer zimanî Katalanî basman kird,be aşkirayî le nimûney hukûmetî Birîtaniyaş da debîndira ke be duway serheldanî 1745da zimanî Geylîkî Skatlendî qedexe kird. Her ew core hokarane handerî ew hukûmetaney Yonan bûn bo Hêlêndinî (be Yonanî kirdinî) Bakorî Yonan be qedexe kirdinî bekarhênanî Meqdûniyeyî le nawçekeda.

Ew çalakîyaney ke hukûmetekan sebarete be ziman deyken dekrê wek hewildan bo plandariştinî zimanî nêwzed bikrê. Le nimûnegelî yekcar zor da çalakî ew çeşne, be pêçewaney ew şitaney lemew pêş basman kirdin, dekrê hem be pêwîst û hem be şiyawî rêz û sitayiş bizandrên- bo nimûne ew wulataney le gel kêşey destbjêr kirdinî zimanêkî neteweyî yan zimangelî neteweyî û,le akamda, berewpêşbirdin û standard kirdinî ew/ ewan rûberû bûn. Ew core pilandariştiney zimaniye, ke biryar deda kame ziman kame dewr bigêrê,be pilandariştinî status (pile) nasrawe. Ême ta êsta basî hêndêk lew kêşe û girftaneman kird ke le firezimanêtî le Urûpa dekeewnewe. Le zor nawçey dinya da kêşe û gîrugirftekan ta radeyekî berçaw aloztirin. Bo nimûne, şêwe Sehay Efrîqa,herêmêkî zor firezimaney ke têyda kêşegelî zimanî zor xiraptir bûn çunkû hêze kolonyalekan sinûre neteweyîyekanyan be bê le berçaw girtinî bilaw bûnewey cugrafîyayî deste êtinîkî yan zimaniyekan diyarî kirduwe.

Legel eweşda, kêşey pêwendî û têkelawî le nawçey ewto da be pêwîstî ewendeş cîdî nîn ke miro lewaneye bîrî lêbikatewe. Le nimûney Kampala da, ke basman lêwe kird (laperey 106),ême bînîman xelik le wuzeyan daye zor be hasanî pêwendî be yekdiyewe biken,sereray ew rastiye ewan zimanekanî yekdî nazanin,çunke ewan aşnayîyan le gel zimanekanî dîş wek Luganda, Swahîlî û Inglîsîş heye: Her kam lew sê zimanane detuwanin wekû zimanî hawbeş Lingua Francaş dewir bigêrn. Lingua Franca ( zimanî hawbeş) zimanêke wekû amrazêkî hawbeşî pêwendî û têkelawî le nêwan ew xelkane da bekardehêndirê ke hîç zimanêkî hawbeşî xocêyîyan niye. Hêndêk lew zimananey bew şêweye le Efrîqa bekardehêndrên, wek Inglîsî û Feranseyî, zimanî xocêyî (bûmî) herêmekey berbas

nîn û zor car xelik be rêgey perwerdey resmîyewe fêryan debîn. Egerçî, zor le Lingua Francakanî Efrîqay, xocêyîn, û zoryan leber zalbûn û bandestî axêweranyan, awa bekar dehêndirên, wek zîmanî Luganda, yan leber ewey ke ewane zîmanî bazirganî helkewtû û berimênin le herêm da, wek Swahîlî. Le Efrîqay Rojava yek le Lingua Franca here girîngekan ke hêsta be şêwey serekî le biwarî bazirganî û sat û sewda da bekar dehêndrê zîmanî Hausa ye. Hausa zîmanêkî Efr û- Asiyayîye ke le binawanda le herêmî Deryaçey çad le Bakûrî Nêwendî Efrîqay qîsey pêdekirê, Belam ewende be berbilawî xelik fêrî bûn ke le biwarî bazirganî û mebestgelî dîke da be mîlyonan axêwer bekarî dehênin le şwêngelî wekû Gana, Nîcêriye û Dahomey. Zorêk le zîmananî dîke her bew rêgeye da wekû Lingua Franca bilaw bûnetewe, tenê duwatir le swêngey abûrî yan siyaset dîsan le kurtêyan dawê. Bo nimûne, zîmanî Yonanî, le dinyaî kewnara da, le seretawe, le ber destbeserdagirtine 'eskeriyekanî Eskender, bû be Lingua Franka, û serdemayek le Tirkiyewe ta Purtugal be panewe bekar dehêndra. Duwatir le dinyaî Rojava zîmanî Latînî wek Lingua Franca dekar kira, be şêwey serekî le akamî peresendin û gewrebûnewey împiratorî Rom, û paşan her wa mayewe, sereray ew rastiye ke bo zor sedan, hîç axêwerî xocêyî nebû. 'Lingua Franca'y eslî, ke ew zarawayey lêkewtuwetewe (ke manay 'zîmanî Feranseî' ye), şêweyek bû le zîmanî Provênçal ke wekû Lingua Franca le layen xaçperistanî firezîmanewe de kar dekra. Katêk hukûmetan kêşeyan dekwête ber dem, wek ewey ke bo zorêk le netewegelî 'nwê' destbjêr kirdinî zîmanêk yan zimangeli neteweyî dête gorê, aşkiraye Lingua Francay lew çeşne zor be kelke. Destbjêr kirdinî zîmanêk ke be nexden xelkêkî zor têydegen qazancêkî zor rûnî lê dekwêtewe. Egerçî, le hêndêk nimûnanda lewaneye alozî û dijwarî bête gorê, le ber hebûnî Lingua Francay riqeber yan bedîl. Le Hîndûstan, zîmanî Hîndî le zorbey beşe Bakûriyekanî wulat da wekû Lingua Franca bekar dehêndrê. Ew zimane ew îmtiyazey heye ke zîmanêkî xocêyîye, ta ewey wek Inglîsî le binawanewe zîmanêkî kolonyalî bê, belam ew xewş û nalebarîyeşî heye ke le berjewendî axêwere xocêyîyekan daye û be zererî ewane deşkêtewe ke debê wekû zîmanî duwem fêrî bin. Le layekî dîkewe, Inglîsî, wekû Lingua Franca le sertaserî Hîndûstanda dekardekirdrê, belam tenê le layen axêweranî xwêndewar û perwerde dîtû ra. Axêwerêkî xwêndewarî Bêngalî rege le gel axêwerêkî xwêndewarî Tamîl be zîmanî Inglîsî têkelawî û pêwendî damezrênê, eger hîçyan zîmanî yekemî ewîdiyan nezanê, ke wênaçê bîzanê.

Kêşeyekî dî hawşêwey Ligua Francay riqeber le Malayziya da heye. Fêdrasîonî Malayziya le salî 1963 damezra be heşîmetêkî tenê 10 mîlîon kesiyewe, belam be barudoxêkî zimaniyewe ke yekcar zor pêçelpêç û aloz bû. Le Malayziya da boxoy zîmanî Malayî rege zîmanî xocêyî 30 le sedî danîştûwan bê, egerçî çendîn şêwey ciyawazî heye, lewane Malayî standardî nuxbey xwêndewarî şarnşîn; Malayî

qise pêkirdin,ke zor şêwezari lehceyi heye; û ' Malayî bazar', ke be berbilawî le biwarî bazrganîda wekû Lingua Franca dekar dekirdirê. 30 le sedî dîkey danîştûwanî Malayziya be yekêk le duwazde zimangele ciyawazekanî çînî dedwên,ke çuwarî here berbilawyan ke lewê bekar dehêndirên, birîtîn le Cantonese, Hokkien,Hakka uTiechiu. (le her kam le komele çîniyekanî şarnîşîn da be asayî yek lew zîmanane wekû Lingua Franca dekar dekirdrê. ),Nizîkey 10 le sedî danêştûwanîş be zîmananî corbecorî Hîndûstanî qise deken,be şêwey serekî Tamîl,belam be zîmanekanî dîkey Dravidiyayîş wekû Telugo û Malayalam,û zîmanî HîndûUrûpayî Puncabî; serbaqî emane,zor le komele Uruasiyayekan be şêweyek le Purtugalî dedwên,û Inglîsîş bo zorêk le kesanî xwêndewar û perwerdedîtû wek Lingua Franca karî pêdekirê. Zîmanî Tayî û çendîn zîmanî ' bûmî' dîkeş bekar dehêndirên. Wêney komelnasî zîmanî lewê be bekarhênanî ew zîmananey ke le xwêndingeyan da wekû amrazî xwêndin û perwerde bekar dehêndirên ewendey dîkeş aloz û pêçelpêçî lê dê. Malayî,Tamîl û Inglîsî giştyan bew şêweye dekar dekirdirên,her weha çînî Mandarînîş,ke yek le şêwezare serekiyekanî zîmanî çînî niye wekû zîmanêkî xocêyi lew wulateda qisey pêdekirê,her weha 'Erebîş bekar dehêndirê.

Le cêgay dîke, lew şwênaney wulat ke le rabirdû da Bakûrî Borneo y pêk hênawe,be zor zîmanan qise dekirê ke xizmayetiyen le gel Malayî heye,her weha hêndêk zîmanî ke le hêndêk le zîmanekanî Fîlîpîns nizîkn,û her weha çînî. Ca boye le Malayziya be aşkirayî ew gîrugirfte le gorê daye ke kameyeyek le zîmanekan destbjêr bikirê bo ewey wekû zîmanêkî neteweyî karî pêbikrê. Malayî ew zîmaneye ke lehemû zîmanekan ziyatir xelik wek Lingua Franca lêy têdegen,û Malayiyekan lebarî siyasiyewe be ser wulatda zal û bandestî û hewil dan bo ewey zîmanî Malayî bikrê be tenya zîmanî resmî lewaneye bibête hoy dilêşe û bêzarî çîniyekan û Hîndûstaniyekan. Her weha ewe debête hoy kembûnî kereste û kitêbî xwêndinîş, çunkû êsta zoryan be zîmanî Inglîsîn,û akamêkî dîkeşî lêdekewêtewe ewîş ta radeyek le destçûn û helpisanî pêwendî û têkelawîye nêwneteweyiyekane. Le layekî dîkewe,be hîç cor nakrê ew îdî'aye bikrê ke Inglîsî zîmanêkî neteweyî ye,belam amrazî here gelwîstî perwerdeye,eweş ziyatir leber hoy abûrî. Serkewtin le kar û pîşe da le Malayziya wêdeçê pîdawîstî be zanîn û tuwanayî le zîmanî Inglîsîda hebê, le katêk da le biwarî xizmetî giştî da pîdawîstî be zîmanî Malayî heye,û le bazrganî û sat û sewda da be zîmanîçênî. Ew gîrugirft û kêşeye berastî hêşta çareser nekrawe, belam le katêkda nasêney desteyî dewrêkî girîng degêrê le parastîni pêbendî û wefadarî zîmanîda berew zimangelî wek Tamîl, wa wêdeçê ew komele le zîmanan bere bere girîngayetî xoyan le ast zîmanî Malayî ( ewîş le songey wefadarî neteweyî) û zîmanî Inglîsî ( le ber



hoy abûrî nêwneteweyî) le dest biden le zor biwar û helumercî resmîda. Arastey siyasetî hukûmetî wêdeçê berew rahêzandinî hem Malayî û hem Inglîsî bçê.

Carubar çareseriyekî dîkeş bo cêbecêkirdinî kêşe û gîrugirftî firezimanêti pêş xirawe - ewîş eweye zimanêkî deskird wekû êspêranto debê wekû Lingua Franca wexo bikrê. Le halî hazir da wênaçê hîç dewlet – neteweyek amade bê êspêranto wekû zimanî resmî xoy wexo bika ewîş leber kêşey kirdeyî û piratîkî, û her weha, leber ewey ke zimanêkî bêlayene, be hîç şeweyek natuwanê neteweyî bê, leger eweşda, layengir û piştîwananî êspêranto zoryan pê xoşe bibînin ew zimane le astî cîhanî da wekû Lingua Francayek bekarbihêndirê bo ewey kêşe û girftî firezimanêti nêwneteweyî çareser bikirê. Le komelekanî firezimanêti, fire neteweyî da, wekû Yekêti Urûpa, zorcar gêre û kêşe dekrê katêk serhelbida ke kam ziman yan zimangel debê be resmî bekar bihêndirên. Layengiranî êspêranto delên, eger êspêranto bikrê be zimanî resmî Yekêti Urûpa, îdî ew core gêre û kêşane nayene gorê. Be pêçewaney Inglîsî yan Feranseyi, êspêranto zimanî xocêyi û bûmî hîç kes niye, ca boye nakrê be berjewendî hîç layekda bişkêtewe, her wek çon Inglîsî le Hîndûstan le zor baranewe helbijardinêki rewatire le zimanî Hîndî wekû Lingua Franca.

Ew pasawhênaweye renga lemer rêkxirawe gewretirekanî nêwneteweyî wek Korî Netewe Yekgirtuwekan rast derneçê. Ewîş leber ewey ke, êspêranto, egerçî fêrbûnî le zimane xoriskiyekan hasantire, belam be aşkirayî zimanêkî corî – Urûpayî ye, û boye be qazancî axêweranî xocêyi ew zimane dekişêtewe ke le binawanewe î ew nawçeyen. Herçunêk bê, hêştta hîç nîşaneyekî rasteqîney ewto dernekewtuwe ke êspêranto, yan zimanêkî dîkey hawçeşnî le şanoy resmî nêwneteweyî da cêgey xoyan bikenewe.

Zorcar dewrî hukûmetêki neteweyî pêş be destbjêr kirdinî zimanêki neteweyî nagirê. Her ke helbjêrda, zimaneke renga pêwîst bê dabimezrê, pêşbixirê û standard bikirê. Bo nimûne, hukûmet lewaneye bituwanê dewrêk bigêrê le berew pêşbirdinî rênûsêki lebar û şiyaw, yan biriyar bida ke lehceyekî taybetî zimaneke yan zincîreyek le şewegeli ke rêkkewtîyan le ser kirawe destbjêr bikirên. Lewane ye biyewê yarmetîş bika be berew pêşbirdinî wuşe û biryar bida kame le şewegeli rêzimanî û dengsazî debê le zimanî standard da nwênerayeti bikirên. Ew core pilandariştiney zimanî ke cext dekatewe le ser xeslete zimaniyekanî şewezarekan ke dextrêne ber pilandan pây degutrê corpus planing wate le nêw telefuzê corbecorekanî wuşeyek le zimanda kameyan helbjêrdîrî û pêş bixirê, kame şewey binaxey ristesazî û wuşe ronane reçaw bikrê û rêgeyan pêbidrê; kameyek le wuşe

hawatakanî herêmekan destbjêr bikirên û çî rêbazêk weber bigîrê bo perepêdanî wuşe, eger ewe be pêwîst bizandirê.

Helbet, zimanî Inglîsî, şêwezarêkî standardî le mawey be sedan salda pêş xist, be rêje be rêgey ' xoriskî ' û le ser binemay sazan, eweş le ber hokarî ciyawazî komelayetî. Legel eweşda, bo zorêk le wulate tazetirekan, pêş xistinî zimanêkî standard debû zor be xêratir pêş bixrê, boye desttêwerdanî hukûmet lew biware da pêwîst buwe. Pasaw dehênrêtewe û degutirê, standard kirdin, bo hasankirdinî pêwendî û têkelawî, bo rexsandinî rênûsêkî le ser rêkkewtû , û bo rêxoşkirdinî amade kirdinî kitêb û kerestey xwêndin pêwîste. (helbet, diyare ewe pirsiyarêkî wulam nedraweye daxuda bo cêbecêkirdinî her kam lew babetane zimanî standard çende û lecêda pêwîste yan na. miro dekrê be şêweyekî tewaw me'qûlane pasaw bihênêtewe hêndêk car standard kirdin hîç nageyênê, wek zor car le nêw komelgelî Inglîsî axêwer da waye, mindalan se'atêkî zor bextî fêr bûnî rênûsêkî be tewawî yekgirtû deken, û her core heleyek le rênûs da debête babetî serkone yan galte pêkirdin, û ladan le standard wekû belgeyekî bê emla û ewlay nezanî lêk dedrêtewe. )

Yek le nimûne here çawrakêşekanî çalakî hukûmet le biwarî pilandarştinî zimanî û standard kirdinî ziman le Norwêjî modêrn da berêwe çuwe. Êsta le Norwêj dû zimanî resmî standardî Norwêjî heye. Be ruwalet ewe şitêkî seyre bo karubarî wulatêkî ke her çuwar mîlyon û kusûr danîştûy heye. Dû standardekan Ny Norsk (' Norwêjî nwê') û Bokmål (' Norwêjî kitêb') n – hîç kamiyan be taybetî nêwî becê nîn – û her dûkyan piley yeksanî resmîyan heye (be gutinêkî dî pêwendî ew duwane pêwendiyekî dûzarêtî (diglossic) niye bew corey le bendî 5-î em kitêbe basî lêwe kira. ) Bokmål zimanî çapemenî neteweyî (sertaserî) (egerçî hêndêk le rojnamekan be Nynorsk îş wutar bilaw dekenewe) zorbey kitêban, be taybetî kitêbî wergêrdiraw, û zimanî zorbey mindale medreseyan, û amrazêkî perwerdeye. Nynorsk le hêndêk çapemenî nawçeyî, betaybetî le Rojaway wulatda bekar dehêndrê; zimanî xwêndinî nizîkey 20 lesedî mindalane; û le honrawe û edebîat da zor bekar dehêndirê, be taybetî lew karaney da ke piştêneyekî ladêyîyaneyan heye. Hemû belge resmiyekan be her dû standardekanin, mindalan debê herdûkyan çî be xwêndinewe û çî be nûsîn fêr bin; û her dûkyan be berbilawî le radyo û têtêwîzyon da bekar dehêndirên. Le her nawçeyek da encumenekanî nawçeyî biryar deden kameyek le şêwezarekan le agadariye giştîyekanda bekar bihêndirê, û bekarhênanî her kam le standardekan le her kam le xwêndinge nawçeyîyekanişda be rêgey pêvajoyekî dêmokiratîk da biryarî le ser dedrê.



Le barî zimaniyewe ew dû şêwezare zor le yektirî nizîkn, û her dûk la dûlayene be tewawî le yektirî têdegen. Ew dûberêtî (dichotomy) ye, leweş ziyatir, le zîmananî standardî nûsîn da piyade dekrê ta zîmanî qise pêkirdin. Zorbey xelik be lehcekanî derewey şaran û gondane yan be lehcekanî nastandardî şarstanyane qise deken, egerçî lehcekanî Rojawayî zor ziyatir û le nizîktirewe we Nynorsk deçin, û hêndêk le lehcekanî Rojhelatî zor ziyatir wek Bokmål wan. Renge le ruwangey komelnasî zimaniyewe xalî here çawrakêş ciyawazî le nêw zîmanekan da bê ta ciyawazî denêw xoy her kam le wanda. Hem le Bokmål û hem le nî Nynorsk da çeşne (variant) hen (telefuzkirdinî cêgorkê pêkiraw û binaxey rêzîmanî) ke be xoparêz û radîkal (conservative û radical) benêw bangin. Le şêwezarî Bokmål da, rojname rastajoyekan şêwekanî xoparêz bekardehênin, û le rojname çepajoyekan da şêwey radîkal. Zor carîş miro detuwanê be rêgey ewey ra ke axêweranî perwerdedîtû û xwêndewar kame şêwe bekar dehênin bizanê ser be çî siyasetêkin. Ew çûn debaliyekewey zîman û siyaset, ta radeyekî naasayî be şêweyekî aşkira, bew manayeye Norwêjîyekî zor kem hen ke sebarek be barudoxî zîmanî le wulatekeyan da objêktîv bin, û ewey ke 'meseley zîman' zor car miştumirêkî zor germî le ser dekirê. Daxî û germugurî pasawhênawe û lêduwan lew bareyewe dekrê bew rastiye ra dawerî le ser bikirê ke le salî 1955 bêjerêkî pêşbînî barudoxî keşwhewa ke be ' zebelahî befrî' nêw bangî derkird le radyoy Norwêj le ser kar ladira çunkû ew amade nebû bilê snø (befir) (şêweyekî radîkalî Bokmål), le ciyat sne ( şêweyekî xoparêz).

Barudoxî zîmanî Norwêjî be rûnî naasayî ye, û, zorêk le Norwêjîyekan delên, barudoxêkî aloze, çunkû ewe be giran radewestê le wulatêkda ke danîştûwanî ewende kemin kitêbî xwêndin û sened û belgey resmî be her dûk zîmanekan le çap bidrên, û katêkî zor le xwêndingekan dekrê naçar bin be her dûk zîmanekan ders gutinewe rêk bixen. Be boçûnî min ew barudoxe le zor ruwewe yekcar zorîş başe, çunkû ewe manay waye jimareyekî zor ziyatir le xelik boyan heye bixwêninewe, û eger pêyan xoş bê be zîmanî standard binûsn, qisey pêbiken û boçûnî xoyan derbirin, ke ewe neba awa nedebû, le ber ewey zîmanî standard zor le şêwezarî xocêyî xoyan nizîke (le Norwêj corawcorî lehceyî yekcar zor le ber çawe).

Ewe sirincrakêşe berewpêşcûnî em barudoxe şwêngêrî bikirê, çunkû legel eweşda le Urûpa barudoxêkî taqaneye, herçonêk bê nîşaneyeke le şêwazêk le çalakî pilandariştinî zîman ke hukûmetan detuwanin beşdarî têda biken. Norwêj le Sedey Pazdehemewe ta salî 1814 le jêr fermanrewayî Danmark dabû. Lew maweyeda tenya zîmanî resmî zîmanî Danmarkî bû, akamî eweş ewe bû lehcegelî Norwêjî le gel standradî Danmarkî deguncêndiran. Eweş, helbet, tenê leber ewe

heldesûra çunkû Danmarkî û Norwêjî zor weyek deçin. Ew demey le salî 1814 Norwêj serbexoyî le Danmark estand,çi zimanêkî taybetî standardî Norwêjî le gorêda nebû. Jimareyekî kem le xewareyan de rastîda be Danmarkî qiseyan dekird,ke ewe zimanî tiyatirîş bû, le katêkda zimanî resmî karbedestanî xocêyî hukûmetîş le rastîda Danmarkiyek bû be telefuzî Norwêjîyewe. Le xwêndingeyanîş da xwêndinewe bew core fêrî şagirdan dekira. Şêwey axaftinî rojane û naresmî axêweranî ser be çînî serewey komel têkelawêk bû le ewe û şêwezare nawçeyîyan: le rastîda core kartêkerîyekî yekparçey Danmarkî be ser zimanî Norwêjî da hebû. Axêweranî çînekanî xuwarewetir bew lehce Nor-wêjîyane qiseyan dekird ke ta radeyek kartêkerî Danmarkî pêwe diyar bû,û werzêran û kiştukêl karan be lehcegelî ladêyîyaney Norwêjî deduwan.

Be peregirtinî hest û dawxuwarz le wulat da bo damezrandinî zimanêkî neteweyî Norwêjî,dû wulamî tewaw ciyawaz le yektirî bo cêbecê kirdinî ew meseleye hatne gorê. Sitratêjîyek ewe bû kem kem Danmarkî alugorî têda bikrê û berew arastey zimanî xelkî şarnşîney ser be çînî serewe bibdrê ke be Norwêjîyek qiseyan dekird ke le jêr tawî Danmarkî dabû. Ew zimanî Norwêjîy Danmarkîye,be Riksmål ('zimanî dewlet ') nêwbangî derkird û, duwaye bû be Bokmål. Wulamekey dîke le layen Ivar Aasen dirayewe,ke mamostayekî medrese bû û lêkolîneweyekî hemûlayeney sebarete be lehce Norwêjîyekan kirdibû. Ew layengirî boçûnêkî zor şorşgêraney zimanî bû,û zimanêkî lemer xoy darişt le ser binemay ew lêkolînewaney lemer lehce Norwêjîyekan kirdibûy. Zimaneke le ser binemay ew lehce ladêyîane helnira bû, be şêwey serekî ewaney rojaway wulat, ke Aasen pêy wabû lanî herî kem be Danmarkî 'jarawî kirawn',û eweş nêwî lëndira Landsmål ('zimanî wulat '),ke duwatir bû be Nynorsk. Le salî 1885 da bo wulamdanewey hest û sozî nasyonalîstî Landsmål hawşanî zimanî Danmarkî (yan Riksmål) wekû zimanî resmî rageyandira. Belam hukûmet neydetuwanî zimanî Norwêjîy Danmarkî helweşênêtewe çunkû ewe hêştî zimanî nuxbey şarnîşînî be destelat bû. Le rastîda,le salî 1887 helkewtî Norwêjîy Danmarkî behêztir bû. Katêk mamostayan raspêrdiran be telefuzî Danmarkî xwêndinewe fêrî mindalan neken belkû be standardî zarekî, wate Norwêjîy Danmarkî Riksmål bilênewe. Ew dû kirdeweye yekem têwegilanî hukûmet bû le pilandariştinî zimanîda.

Emro rîşey şêwekanî xoparêz û radîkal le her dû zimane resmiyekeda le wîstî hukûmete yek be duway yekekanewe aw dexwatewe bo damezrandinî zimanêkî neteweyî le ciyat duwan be bê ewey ke hîç kam lewan helweşênêtewe. Ca ew wîste ziyatir berew ew çuwe ke her dûkiyan bere bere berew nizîtkirkirdinewe le yekdî rêformyan têda bikrê,bo nimûne,le lehce Norwêjîyekanda,lewane

ew lehcanêş ke çînî kirêkarî şarnîşîn qiseyan pêdeken, naw sê cînsî heye (nêr, mê, û bêlayan), le katêkda le Norwêjîy Danmarkî, û be duway ew le Riksmål da wekû Danmarkî naw dû cînsî heye (giştî û bêlayan). Riksmål nîşaney nasînewey wekû yekî hebû (ke le zimanî Norwêjî da be duway naw da dê) bo wuşey nêr û mê: mann ' piyau', ko ' ga'; wate debête 'mannen' piyaweke', koen ' gayeke', belam Landsmål şêwey ciyawazî hebû: kui wate ' gayeke'. Le salî 1917 da hukûmet rêformêkî resmî kird, yekêk le akamekanî ew rêforme ewe bû ke lew bareyewe (û Leser şitî dîş) pêkhatinêk le nêwan her dû zimanekanda bikrê. Le Landsmål da nîşaney nasînewey mêy le -i we debû bigordirê be -a bo ewey le gel lehce Rojhelatîyekan biguncê, le heman katda şêwey mêy -a bo hêndêk wuşan kira tobzî, be taybetî ew core wuşaney ke pêwendîan be ladêyanewe hebû, wekû ga, û be şêwey helbijarde bo wuşey dîş. Ewe manay wabû ke 'gayeke' îtir êsta le her dûk zimananda bû be kua . lêreda ('tobzî' be manay tobzî bûn le kitêbî medresan û le nûsînî şagird medresanda bû. ) le akamî ew rêforme da nîşaney nasînewey mê ke le hêndêk pêwendî le Bokmål da bo hêndêk naw da dekardekirdirê be şêweyekî radîkal dadendirê, nîşaney nasînewey nêr ( yan giştî) be şêweyekî xoparêz dadendrê.

Berew pêşcûnêkî dîkey girîng le pilandariştinî zimanî hukûmet da rêformêk bû ke le salî 1938 da kira, û eweş le ser binemay lêkolînewey komîteyek ke raspêdirabû û destelatî dirabûye bo le yek nizîk kirdinewey zimanekan le biwarî rênûs, şêwey wuşe, û gerdankirdin da, le ser binçîney zimanî gelîy Norwêjî. Ewan be taybetî amojgarî kirabûn zimanî standardî qisekirdinî çîne serewe xwêndewarekan neken be sermeşq, hengawêkî naasayî û girîng le mêjûy standard kirdinî ziman da. Zorêk lew goraney ke debû le kitêbî xwêndinî Bokmål da bikirên birîtî bûn le kirdine dîftongî (dû dengî vowel) be monoftong (yek vowelî) le zor wuşanda, wek le Nynorsk û zor lehçanda:

øst aust < 'rojhelat' be Danmarkî øst

sten < stein ' berd ' be Danmarkî sten

û her weha goranêk le kotayî zemanî rabirdûy kirdaranewe le -et we bo -a, dîsan wekû zor le lehce rojhelatiye kem pirêstîjtirekan, lehce ladêyîekan û Nynorsk :

vaknet < vakna ' lexew hestan'

Dabezandin û cêbecê kirdinê ew rêformane le ber şerî Duwemî dinya girewe we duwaye kewt, belam duway biranewey şer kitêbî xwêndin be pêy standarde tazekan çap kiran. Goran le Bokmål da berhelstî û kardanewey le nêw axêweranî çînî serewe û zor le twêjî çînî mamnêwncî le Rojhelat wurûjand û zorî pê tûre bûn. Zor le daykubawkan, be taybetî le Oslo, hestyan dekird ew rêforme nwêyane zor heremekîn, û le dijî ewe derkewtin ke ew şêwaney ewan hewlyan dabû le axawtinî mindalekanyanda 'rastyan kenewe' êsta ewe de rastîda be çapkirawî dekwête ber çawyan. Boye le mawey berayîyekanî salanî 1950kanda, kompanîye gewrekanî bazriganî û siyasetmedarî koneparêz destyankird be danî diraw û yarmetî darayî bo werêxstinî berberekanî be dijî rêformekan. Ewe cencal û herayekî zorî lê saz bû, û le keşwhewayekî awa da bû ke rûdawî 'zebelahî befrî' qewma.

Sereray ew dijayetî û berhelstkariye, komîsyonêkî nwêy zimanî pêk hat be heman destelat û raspardeyey ke dirabû bew komîteyey ke raportî salî 1938-î amade kirdibû, bo ewey çawedêrî bika be ser pêwane û normekanî kitêbî xwêndin da be her dûk zimanekan. (balî rastajo ew komîsyoneyan be nwênerî 'be qanûnkirdinî zimanî heremekî 'dezanî, çepajoyanîş pêkhatinî ew komîsyoneyan be 'serkewtinêk da dena bo dêmokrasî'. ) le salî 1959 da ew normaney kitêbî xwêndin bilaw bûnewe, û derkewt le cêda her heman şêwekanî 1938n, egerçî be radîkalî ewanîş nebûn. Le akamî amojgarîyekanî ew pêwananeda êsta le kitêbî xwêndin da sê şêwey ciyawaz bedî dekrê, hem le Bokmål û hem le Nynorskda: şêwey tobzî (tenê rêge deda be derfetêk); şêwey bedîl (rêge deda be dû derfet ); û şêwey serpişkî (le çap da rêgey nadrê, belam mindalan detuwanin le nûsînekanî xoyanda bekaryan bihênin). Ca boye axêweran û nûseranî her dû zimane Norwêjîyekan helbijarde û pişkî berçawyan le ber dest daye, ke emeş le zor ruwewe şitêkî zor çake.

Ew pêşniyaze diyarî û taybetîyaney le layen komîsyonewe kiran birîtî bûn lewey ke nîşaney nasînewey mê le Bokmål da debê le jimareyekî zor kem le nawan da tobzî bê; jimarey ew şêwaney kirdar le zemanî rabirdû da ke kotayî hatinyan be -a tobzî bû yekcar zor kem kiranewe û -a û -et her dûkyan wek bedîlî yektir pesind kiran; û dîftongekanîş le jimareyek wuşey kemptir da be tobzî dandiran. Bo nimûne, dîftongêk le wuşey wekû sein 'direng' da tobzî ye (egerçî rojname xoparêzekan hêşta denûsn sen ); dû wuşey beisk/besk 'tal' wek bedîlî yektir pesindin; le bekar hênanî wuşey (eid)/ ed 'swênd' da miro detuwanê serpişk bê; û le wuşey en 'yek' (tenê le Nynorsk da ein e ) monotong (tak vowelî) tobzî ye. ( her awaş, seyre, wuşey daud 'mirdû' bo ajal başe, belam debê bo însan død bekar bihêndrê. ) Ew nimûney xuwarewe be kelke bo agadar bûn û lêk kirdinewey

binîçey bilawkirawey nûsraw le Bokmål da"

' kitêbeke ' wedirengî kewt'

rastî siyasî denûsê                      boken forsinket  
çepî siyasî denûsê                      boka forsinket  
zor le kitêbekanî xwêndin denûsin boka forsinka

Perawêzêkî kotayî sebarete be şanoy zimanî Norwêjî:le rastîda wulatî Norwêj be zimanî Norwêjî dû nêwî heye,Noreg be Nynorsk,û Norge be Bokmål.

Wek dîtman,le jêr fermanrewayî Danmark da,lehce Norwêjîyekan le pêwendî le gel zimanî Danmarkîda haw gunc bûn – wate ewan be lehcegelî zimanî Danmarkî dadendiran. Belam êsta ewan awa çaw lê nakirên – ewan êsta be lehcegelî zimanî Norwêjî dadendirên,çunkû wekû zimanêkî serbexo otonomî bedest hênawe. Wek le bendî yekemî em kitêbe da hêman bo kird,û her weha dîsan le bendî sêş da le bas kirdinî zimanî Sirbo Kirowatî da gutman çon bû be sê zimanî Sirbî,Kirowatî û Bosniyayî,ciyawazî nêwan zimanêk û lehceyek zor car ciyawazîyekî sîyasîye. Her wek nimûney zimanî Norwêjî be cuwanî derî dexa,le ber ewey ke serbexoyî diyardeyekî kultûrîye,hem dekrê le dest bidrê û hemîş dekrê wedest bixrê. Norwêjî serdemêk lehce bû,êsta zimane Efrîkans zemanêk lehceyekî Holendî bû; êsta wa nîye. Her heman şit le ser Meqdûnîyeyî raste,ke pêştir be şitêk dadendira ke birîtî bê le lehcegelî Bulxarî,belam êsta le layen Meqdûnîyekan xoyanewe û zurbey xelkî dîkeş, renga cige le Bulxarekan nebê,be zimanêkî ciyawaz dadendirê. Ême her weha basî rewî Lugzamburgîşman kird le lehce bûnawe berew wedest hênanî piley zimanêk.

Le layekî dîkewe,le serdemî pêşû da,Pirovênşal û Almanî Textanîyan zimangelî otonom bûn,belam êsta be giştî be rîz be lehcegelî Feranseyî û Almanî dadendirên. Le gel eweşda,serbexoyî le destçû,dekrê dabimezrêndirênewe,û le ber ewey serbexoyî diyardeyekî kultûrî û sîyasîye,be taybetî girînge lew hewlaneyda ke bo damezrandinewey dedrê le ser hokargelî kultûrî,sîyasî û remzî Kar bikrê wekû bedest xistinî rênûsêkî qol le ser kêşraw û şiyawî nasînewe û bekar hênanî şewezarekey berbas le zor biwar û helumercî komelayetî da ta ew cêyey ke helldesûrê, be taybetî le biwarî resmî û le nûsînda. Skatlendî le pêşû da,wek Pirovênşiyal,be serî xoy zimanêk bû,belam êsta be giştî wekû hawguncî Ingîsî dadendrê. Ilegel eweşda, jimareyek xelk le Skatlend û Irlendî Bakûrî(ke beşêkî

Skatlendî axêwere bo mawey ziyatir le 300 sal le akamî koç û koçbarî le Skatlendî Textayîyanewe) êsta hewil deden Skatlendî wekû zîmanêkî serbexo bibûjênnewe. Ew hewlane hêndêk nasîn û piştîwanî resmîşî bedest hênawe. Bo nimûne, Skatlendî Ulster le Irlendî Bakûrî be resmî nasrawe, û le salî 1999 le rojnamekanî Irlendî Bakûrî da agadarî bo pîşeyek bilaw kirawe, ke beşêkî wek ewey xwarewe wa bû

It's noo apen fur tae pit in jab foarms fur tha ontak o Unner-Editor (Inglis an Ulster-Scotch) wi tha Chawmmer o tha Scriver Account o tha New Ulster Semmlie sittin at tha Tolse Biggins, Stormont, Bilfawst . A start wull be gien fur sax month, wi anither contraick aiblins forbye.

Inglîsiyekey heman beşî agadariyeke awaye

Applications are invited for the post of Sub- Editor ( English and Ulster- Scots) in the Office of the Official Report of the New Northern Ireland Assembly, which is located in the Parliament Buildings, Stormont, Belfast. The appointment will be for six months, with the possibility of renewal of contract.

Dawxuwazîname bo karî îdtorî (be Inglîsî û Skatlendî Ulster ) werdegîrê, le Idarey guzarîştî resmî sebarete be meclîsî nwêy Irlendî Bakûrî da, ke le xanûwekanî parlamen, stormont, le Bêlfast helkewtuwe. Damezrandineke bo şeş mangan debê, be deretanî tazekirdinewey kontirakteke.

Otonomî û serbexoyî zîmanî dekrê weduwaş dirêtewe. Leber ewey zîmanî Katalanî beşêke le heman zincîrey lehceyî wekû êspanyayî, ew derfete bo rêjîmî Franco rexa nek her ewey Katalanî demkut bika belkû îdî'aş bika ke ' le rastîda' lehceyekî zîmanî êspanyayî ye û be hîç cor zîmanêkî serbexo niye.

Labirdinî zîmanî Katalanî le biwarekanî giştî û resmî da, her wek le serewetir amajeman pêda, be mebestî behêzkirdin û pitewkirdin ew îdî'aye bû. Her awaş, le Yugoslawîyay pêşû da, be leberçaw girtinî ewey ke hukûmet pêyî xoş bû cext le ser yekêtî neteweyî (sertaserî) bikatewe, asayî bû ke Sirbu-Kirowatî be zîmanêkî taqane dabindirê be dû normî ta radeyek ciyawazaewe, nek wekû Inglîsî Bîrîtanayî û Inglîsî Emrîkayî. Belam le berayî salanî 1990e kanewe , her wek ta êsta dîtûmane, ewe buwe be siyasetêkî resmî – ke diyare be pêwîstîş le layen hemû ewaney ke pêwey 'elaqedarn qolî le

ser nekêşrawe - ke Sirbî û Kirowatî û Bosniyayî be zîmananî ciyawaz dabindirên egerçî hemûyan dûlayene le yektirî têdegen, wekû Norwêjî û Danmarkî. Sirinc biden ke nakrê hîç wulamêkî zimannasane bo ew meseleye hebê daxuda Sirbu-Kirowatî zîmanêke yan sê zîman. Wulamekey kultûrî û siyasiye.

Le Urûpay modêrn da zor meseley dîkey away sîyasî û komelnasîzîmanî hen. Daxuda be rastî Meqdûniyeyî zîmanêke? Daxuda Moldovayî û Romaniyayî 'eynî zîmanin yan na? Gelo Filamanî û Holendî yek yan dû zîmanin? Daxuda Korsîkayî lehceyekî Italiyayiye? Gelo berastîş Lugzamburgîş cwêye le Almanî?

Leber napeywest bûn û berdeuwambûnî ew kêşane, hîç rêgayek niye bo ewey ême bituwanîn wulamî em pirsîyarane tenê le ser binemay zîmanî bideynewe. û, xoş eweye ewe tenê zimannasanin ke be tewawî lewe têdegen ew pirsîyarane ta çende pirsîyargelî zîmanî nîn. Rastîyekey ewe ye zorbey zimane Urûpayîyekan ewen ke le komelnasî zîman da be ' zîman le rûy dirêj bûnewe ' benêwbangin ( be almanî zimangêlî Ausbau ). Ewane birîtîn le şêwezare standardekan ke le ser dirêjeyek le lehcan dandrawin ke, le ber hoy komelayetî û mêjûyî, le gel ew standardane xoyan guncanduwe. Boye zîmananî Ausbau le ber hoy siyasî, kultûrî û komelayetî û her weha xesletekanî zîmanî xoyan zimangêlî ciyawaz le yektirîne.

Legel eweşda, hêndêk zîmanî ewto hen, ke ew pêwaneye legeliyan naxwênêtewe boye dekirê be tewawî le ser binemay zimannasane be zîmananî tewaw serbexo dabindirên. Ême bo nimûne detuwanîn be zîmanî Bask bilêyn ' zîmanêk le rûwî mewda' ( be Almanî zîmanî Abstand ) çunkû le ruwangey zîman î yewe ewende le hemû zîmanekanî dîke ciyawaze ke nakrê sebarete be piley be tewawî serbexoy wî hîç dimeteqe û miştumirêk bîkrê. Tenanet rêjîmî Francoş neydetuwanî îdî'a bika ke zîmanî Bask 'le rastîda' êspanyayî ye!

\* Nûser le hemû cêyek wuşey Gypsies(Qereçiyekan) î bekar hênawe. Emin wekû wergêr agam le barî nerêyî em wuşe û çemke tenanet le şêwezare Kurdiyekanîş da heye, Belam bo wefadarî be deqî mak be pêwîstîm zanî carêk le kewane da binûsm (Qereçiyekan), dena wekû dî lem wergêrane da Gypsies im be xelkî Roma wergêrawe- têbînî wergêr

**Serçawe:** Em nûsraweyey profêsor Peter Trudgill kitêbî

Peter Trudgill : Sociolinguistics , An introduction to language and society, Fourth Edition, 2000, Penguin Books, PP 119 – 149 e

Xiştêy laperey 142 û 143 le mer ciyawazîyekanî bekar hênan le şêwezare Norwêjîyekanda lem deqe kurdiye da wernegêdirawe.

www.arasivakurdî.org



## BIKARANÎNA NAVÊN HEYWANAN BI MECAZÎ

### *Kovara Kanîzar bi hevkarî li gel koma "Zîmanê Kurdî" li ser Facebookê*

Hejmareke ne kêr ya navên heywanan ne tenê bi maneya wan heywanan lê herwiha li cihê hin rengdêran wek sifet bo behskirina mirovan jî di kurdî de tên bikaranîn. Gotinên wek, "filan kes ker e" anku bêaqil e, "bêvan kes bilbil" anku bo axivîne zîrek e yan "filan keç/jin xezal e" anku spehî û delal e, di kurdî de pir tên bikaranîn.

Li ser vê mijarê, me suhbet di koma "Zîmanê Kurdî" ya li ser Facebookê de vekir û ji endamên komê pirsî, gelo navê çi heywanan bi mecazî wek rengdêr tên bikaranîn.

Kerem bikin li encamên pirsê me binêrin.

**baz** şerxwaz; wêrek

**beran** serhişk, bêtirs

**beraz** xirab, neqenc, bedxwaz, bedniyet

**berx** delalî, dilber, ezîz, xweştivî, xoşewîst

**bilbil** xweşbêj, xweşaxiv, zûaxiv, zûbêj

**bizin** bînat, serhişk

**caş, ceş** dijminê gelê xwe, xainê milletê xwe

**çêl, çêlek** zêde qelew

**dêl, dêhl, dêhlik** qehbe, fahişe, jinên bêedeb

**dîk, dîkil** qurre, metho, pozbilind

**elok** pozbilind, metho, xwemezinker

**fêrik** (çûçelkên mirîşkan) keçên spehî

**ga, gamêş** zêde mezin, zêde gir

**golik** zêde gir yan qelew

**gur, gurg** çavbirsî, çarbirçî, hesûd; hov, dirrinde

**hacîreşk, hehecîk** pîroz

**hêştir** nelihev, zêde dirêj û loma kirêt

**hirç** gir, girs, zexm; tirsnaq; bêserûber, porr-neşehkirî

**hût** pîr gir û zexm; zêde bixwere

**karik** nesekinî, netebitî, şûm, neqet

**kavir** gêj, bêhay

'*keftar* rezîl

**ker** bêaqil, bêhiş, nezan, cahil

**kevok** aştxwaz; evîndar; spehî

**kirnî** xwînmêj

**kund** bedbext, wêranî

**kurebeşk** qelew

**kûçik** kole, bindest (bidin ber **se, seg**)

**kûsî, kûsele** hêdî, ne bilez

**legleg** zêde dirêj û zeîf

**mar** xirab, bêwijdan, bêbext

**meqesok** biziyan e lê hay ji xwe nîne

**meymûn** kirêt, kirh, ne spehî; bêedeb

**mêrû, mûrî** hûrik, pir biçûk

**mêşa mirî** tembel, tiral, keslan, bêxîret

**mih, mî** sernerm; newêrek; miskîn, bêdeng

**mirîşk** newêrek; xewto, pîrxew

**pepûk** reben, perîşan, bêçare

**piling** wêrek, cesûr, bicesaret, bêtirs

**qijak** zeîf, qels

**rovî, rûvî** hîlebaz, hîleker, teşqeleşî

**qaz** spehî, bedew, xweşik, ciwan, delal

**se, seg** pîs, heram

**şêr** wêrek, cesûr, bicesaret, bêtirs

**tajî** beza, zûbez, kesê ku bi lez dibeze

**têtî** tenê, bêkes

**werdek** keça meşa wê bi şox û şeng

**xezal** spehî, bedew, xweşik, ciwan, delal

## Kêşey zimanî resmîy kurdî (3)

### Pirsgirêka zimanê kurdî yê resmî (3)

**Emîrî Hesepûr**

*wergerandin li kurmancî: Kulturname*

#### 3- Çemkekan: Zimanî Resmî, Neteweyî, Edebî, Yekgirtû û Klasîk

##### 3- Term: Zimanê resmî, neteweyî, edebî, yekgirtî û klasîk

Le dû beşî pêşû da, basî wem kird ke le Sedey Bîstem da serbaqî têkoşanêkî zor bo standard kirdinî zimanî Kurdî, ew pirojeye le seretawe piştî nebest be zanstîyekanî ziman wek zimannasî, zimannasî-komefayetî, û bername ronanî zimanî yan sîyasetî zimanî.\* ew kem û kûrîye le dekarinehênanî çemke serekîyekan û le nebûnî zanistî tîyorî da bedî dekrê. bo wêne, qamûse Kurdîyekan amrazêkî girîngî standard kirdinin û le pêşekî ew berhemaneda basî hêndêk kêşey zimanî Kurdî û wuşekanî kirawe befam be bê dekarhênanî çemkî pêwîst û be bê agadar bûn le tîyorî.

*Min di du beşên pêşiyê de behsê hindê kir ku di sedsala bîstê de li gel têkoşîneka pir ji bo standardkirina zimanê kurdî, wê projeyê her ji destpêkê piştî xwe bi zanistên zimanî ve wek zimannasîyê, zimannasî-civakî û programên tertîbkirina zimanî yan siyaseta zimanî negirêda (1). Ew kêmasî di bikaranîna termên serekî û di nebûna zanistê teorî de têt dîtin. Wek mînak, ferhengên kurdî amrazekê girîng yê standardkirinê ne û di pêşiya wan berheman de behsê hinek arêşeyên zimanê kurdî û peyvên wî hatiye kirin lê bê bikaranîna termên pêwîst û bê agahdarbûnê ji teoriyê.*

Carî wa heye ew pê nezanîne be tîyorî xo le qerey î tirajîdî de da. Bo nimûne, zorbey ewaney le çêkirdinî elf û bê da têkoşawin cîyawaziyan danenawe le nêwan herif û deng (fonêm)\*\* û ew duwaneyan têkef kirdûwe û le akam da rêbazêkî wayan reçaw kirdûwe ke, bê ewey mebestyan bûbê, le piratîk da kospyan xistûwete ser rêy geşe kirdinî zimaneke(le beşekanî dahatû da ew base zortir şîdekemewe). Carê lêre da, zor be kurtî basî çend çemkêk dekem ke le basî zimanî standardî Kurdî da dekar hatûn.

Carên weha hene ku tê de ew nezanîna li ser teoriyê xwe li sinûrên terajediyê dide. Wek mînak, Piraniya wan yên ku di çêkirina alfabeyê de xebitîne çi ferqî di navbera herf û dengî (fonem)î (2) nedaniye û wan ew herdu tevlihev kirine û wan di encamê de rêbazeka weha daye ber xwe, bê ku mebesta wan ew be, wan di praktîkê de asteng xistine ser rêya geşkirina zimanî (ez dê vî behsî di beşên bihên de bêtir şirove bikim). Ez carê dê li vê derê gelek bi kurtî behsê çend terman bikim ku ew di behskirina zimanê kurdî de hatine bikaranîn.

Hîç kam lew çemkane (zimanî resmî, netewey, edebî, yekgirtû, û klasîk) me'na yan te'rîfêkî sakar û rûn û yekcarekiyan nîye û le hêndêk xaî da hawbeşin û le hêndêk da lêk cwê debinewe. Ew rêkî û na'êkîyeş le ber eweye ke, le layêkewe ziman xoy dîyardeyêkî tewaw aloz e û le qalb nadrê, û le layêkî dîkewe zanstîyekanî zimanîş boçûnî corawcoryan têdaye. Le biwarî tîyorîş da, têgeyîştinî ew çemkane be gwêrey mekîtebe zimannasîyekan dego'rdîrê.

Çi yekê ji wan terman (zimanê resmî, neteweyî, edebî, yekgirtî û klasîk) mana yan teirîfeka hêsan û zelal û yekcarkî nîne û ew di hin niqteyan de hevbeş in û di hinên din de jêk cida dibin. Ew hevbeşî û ferqî ji ber hindê ne ku ji alieykî ve ziman bi xwe diyardeyeka bi timamî aloz e û nahêt li qalib dan û ji alieykê din ve zanistên zimanî jî dîtinên cor bi cor yên xwe hene. Di warê teorî de jî têgehiştina wan terman li gor mektebeyên zimansiyê têt guhortin.

Zimanî standard le beramber zimanî nastandard (lehce) radewestê. Zimanî standard zimanêkî nûsraw yan edebîye ke yek no'rmî heye bo nûsîn û xwêndinewe û qise kirdin, û be gwêrey nawçe, çînî kome'layetî, pêkhatey kome'layetî ('eşîretî, gundnişînî, şarnişînî...) yan cînsêtî (jin û pîyawî) nago'rdîrê. Standard bûn nîsbîye û hîç zimanêkî zîndû be yekcarî û be tewawî standard nabê. Bo wêne, le Kurdî da Soranî û Kirmançî her kam ta radeyêk standard bûn be'lam Hewramî ta êsta standard nebûwe û wek lehceyêkî edebî nawçeyî mawetewe û renga le barûdaxêkî mêjûyî da standard bikrê. Herweha, Dimilkî yan Zazayî ke pêşîney edebî le sê lehcekey dî kemtîre, le safanî rabirdû da zortir dekar hatûwe. Eger Dimilkî bo maweyêkî zor be lehceyêkî Kurdî dadendira, êsta ko'êkî nasyonâlîstî Zazayî peyda bûn ke be zimanêkî serbexoy le qetem deden.

Zimanê standard li hember zimanê nestandard (lehce) radiweste. Zimanê standard zimanekê nivîskî yan edebî ye ku yek norma xwe ya nivîsîn û xwendin û axiftinê heye û ew li gor deverê, çîna civakî, pêkhatina civakî (eşîrî, gundî, bajarî ...) yan zayendê (jin û mêr) nahêt guhortin. Standardbûn nisbî ye û çi zimanekê zindî bi yekcarî û bi timamî standard nabe. Ji bo nimûne, di kurdiyê de soranî û

*kurmancî, her yek ji wan heta dereceyê standardbûne lê hewramî heta niha standard nebûye û ew wek lehceyeka edebî ya deverkî maye û dibe ku ew di rewşeka dîrokî de bê standardkirin. Herweha dimilkî yan zazayî ku berhemê wê yê edebî ji wan sê lehceyên din kêmtir e, di salên derbasbûyî de bêtir hatiye bi kar anîn. Heger dimilkî di demekê dirêj de wek lehceyeka kurdî nedihat hisêb kirin, niha komeleyên nasyonalîstên zazayî peydabûne û ew wê bi zimanekê serbixwe li qelem didin.*

Zimanî standard detuwanê resmî bê yan nebê. Bo wêne zimanî Înglîsî le Emrîka be qanûn û be destûr resmî nebûwe ke wabû "resmî bûn", "standard bûn" û "dewlê tî bûn" yek şit nîn leget eweş da zimanî resmî zortir be dewletê bûn debête resmî. Wa heye zimanêk le wîlatêk da resmî bê û le wîlatêkî dî da na resmî û tenanet na qanûnî bê. Bo wêne, Tirkî Azerbaycanî le komarî Azerbaycan da zimanî resmî û neteweyî ye beşam le Êran da zimanêkî serkut kirawe. Kurdî le 'Îraq resmîye beşam le Turkîye tenanet nawî zimanekê ("kurdî") le daudezgay dewletê da qedexeye.

*Zimanê standard dikare resmî be yan nebe. Wek mînak, zimanê îngilîzî li Emerîkayê bi qanûn û bi destûrê resmî nebûye. Yanî (resmîbûn), (standardbûn) û (dewletbûn) ne yek tişt in, li gel hindê jî zimanê resmî bêtir bi dewletbûnê dibe resmî. Weha bûye zimanek li welatekî resmî be û ew li welatekê din ne resmî û heta ne qanûnî be. Wek nimûne, zimanê tirkî yê azerbêcanî li Komara Azerbêcanê zimanê resmî û neteweyî ye lê ew li Îranî perçiqandiyê. Kurdî li Îraqê resmî ye lê li Tirkîyeyê heta navê zimanî (kurdî) di saziyên dewletê de qedexe ye.*

Dîyar e zimanî standard, wek zimanî nûsraw, debê zimanêkî edebî bê beşam her zimanêkî edebî le waneye standard nebê. Peyda bûnî edebîyat le zimanêk da, noşmî durustî û nadurustî dademezrênê beşam ewe be tenyayî zimanêk naka be standard. Bo wêne, Hewramî û Kirmancî û Soranî lehcey e debî bûn beşam Hewramî derifetî standard bûnî nebûwe. Herweha, Farsî û 'Erebî ta axirî Sedey Nozde zimanî edebî here berzî Bakûrî Efrîqa û Asîyay Rojava û Nawendî bûn beşam standard nebûn. Wa heye "zimanî edebî" le beramber zimanî qise kirdin dadendirê.

Diyar e zimanê standard, wek zimanekê nivîskî, divêt zimanekê edebî be lê dibe ne her zimanekê edebî standard be. Peydabûna edebîyatê di zimanekî de normên durist û ne durist dadimezrîne lê ew bi tenê zimanekî nake standard. Wek mînak, hewramî û kurmancî û soranî lehceyên edebî bûn lê hewramiyê derfeta standardbûnê nebûye. Herweha farisî û erebî heta dawîya sedsala nozdeyê zimanên edebî yên herî bilind yên bakûrê Efrîqayê û Asya Rojava û Navîn bûn lê ew ne standard bûn. Hene ku (zimanê edebî) li hember zimanê axiftinê dadinin.

"Zimanî neteweyî" le beramber "zimanî nawçeyî" dadendirê. Beîam "netewe", wek her çemkêkî dî, yek me'nay nîye û çemkî "zimanî neteweyî" be lanî kemewe be dû me'na dekarhatûwe. Bo wêne, Farsî le Êran da zimanî kam neteweye, netewey Fars yan Êranî? zimanî neteweyî zortir standard e beîam detuwanê standard nebê. Bo wêne, serok komarî Somalî le 1972 bişyarî da ke zimanî Somalî zimanî neteweyî û resmî ew wîfate ye beîam ew zimane hêştta tewaw standard ne bûwe û be helweşanewey dewletî Somalîya û damezranî hikûmetî nawçeyî zimanekeş let û kut bûwe.

*Hinek "zimanê neteweyî" li hember "zimanê deverkî" dadinin. Lê "netewe" wek termeka din ne xwedî yek manayê ye û terma (zimanê neteweyî) bi kêmanî bi du manayan hatiye bi kar anîn. Wek mînak, farisî li Îranê zimanê kîj neteweyê ye, neteweya faris yan ya îranî? Zimanê neteweyî bêtir standard e lê dikare ne standard be. Ji bo nimûne, serokkomarê somalî di 1972-ê de biryar da ku zimanê somalî zimanê neteweyî û resmî ye wî welatî be, lê ew ziman hêj timam standard nebûye û bi hilweşiyana dewleta Somalyayê û damezrandina hikûmetên deverkî zimanê wê jî qede qed bû.*

"Zimanî yekgirtû"ş me'nay corawcorî heye. Hem yekgirtûyî û hem na yekgirtûyî dîyardey nîsbîn. Ta êste le basî Kurdî da, zortir mebest têkef kirdinî lehcekan be taybetî Soranî û Kirmançî û daîştinî lehceyêkî tewaw destkird ("Surmançî) bûwe. Zimanî wa heye tenya elfubêyekey debê yek bigrê û carî wa heye (wek Kurdî û Albanî) hewil dedrê dû lehcey serekî têkefaw bikrên. Çaweruwana dekrê "zimanî standard" zimanî hawbeş û yekgirtû bê bo ewey tewawî netewe bituwanê be bê kend û kospî lehceyî pêy bidwê û pêy binûsê beîam çemkî yekgirtûyî çemkêkî sîyasîye. Beşêk le nasyonalistekan yekgirtûyî legef yek lehceyî têkef deken û deyanewê, be pişt bestin be deseîatî sîyasî, yek nawend yan lehcey nawendî bo zimanî fire lehceyî Kurdî dabitaşin. Pêş Sedey Nozde, 'Erebî û Farsî û Latîn û Çînî û çend zimanî dî be şeweyêkî zor berîn qa'îde bendî kirabûn edebîyatêkî dewlemendyan pêkhênabû beîam ewane wek "zimanî edebîy kilasîk" nasirawin û xîstetî wayan heye ke le zimanî standard cwêyan dekatewe (le beşekanî dahatûda degerê mewewer ser ew base. Aşkriye hîç kam lew zimane "neteweyî" nebûn û zortir nawneteweyî bûn û le meîbendêkî yekcar gewre dekar hatûn dekarhatûn û pêyan defên ("lîngwa firanka").\*\*\* zor car be zimanî standard degutrê "zimanî standardî neteweyî" bo ewey le ew core zimane cwê bikrênewe.

*"Zimanê yekgirtî" jî manayên cor bi cor hene. Hem yekgirtî û hem neyekgirtî diyardeyên nisbî ne. Heta niha di behsê kurdiyê de bêtir mebest jê têkelkirina lehceyan, bi taybetî soranî û kurmanciyê û dariştina lehceyeka timam çêkirî (sormancî) bûye. Zimanê weha heye divêt bi tenê alfabêya wî bêt yekkirin û carna jî weha ye (wek kurdî û elbanî) hewil têt dan ku du lehceyên serekî bêten têkel kirin.*

Têt çaverê kirin ku (zimanê standard) zimanê hevbeş û yekgirtî be ji bo ku tevaya neteweyî, ku ew bikare bê zehmetî û astengên lehceyî pê biaxive û pê binivîse, lê terma yekgirtî termeka siyasî ye. Beşekê nasyonalistan yekgirtî têkelî yeklehceyîye dikin û ew dixwazin bi piştgiriya desthilata siyasî yek navendê yan lehceya navendî ji zimanê pirlehceyî yê kurdî re bidin qebûl kirin. Berî sedsala nozdeyê erebî û farisî û latînî û çînî û çend zimanên din bi şêweyekê gelek berferh berbelav bûn û wan edebiyateka dewlemend pêk anîbû lê ew wek (zimanê edebî yê klasîk) hatibûn naskirin û wan xesletên weha hene ku wan ji zimanê standard cida dike (ez dê di beşên bihên de vegerim ser vî behsî). Aşkera ye ku çî ji wan zimanan ne (neteweyî) bûn, ew bêtir neneteweyî bûn û ew di melbendeka yekcar mezin de dihatin bikaranîn û dibêjinê (lingua franca). Gelek caran ji zimanê standard re têt gotin (zimanê standard yê neteweyî) ji bo ku ew ji wan nifşên zimanan bêt cida kirin.

Ta êste, çend goşeyêkî tîyorî, û sîyasî û mêtîyîm bas kirdûwe be tam babetekan zor berînin û ew basane û zor babetî dî le beşekanî dahatûda be le berçaw girtinî ezimûnî zimanî Kurdî dirêje pêdedem.

Min heta niha behsê çend pirsên teorî û siyasî û dîrokî kir lê babet gelek berferh in û ez dê di beşên bihên de, li gel berçavgiritina ezmûna zimanê kurdî, dirêjîyê bidim wan behsan û gelek babetên din.

#### **4- Qonaxî pêş standard bûn: Hewramî, Kirmancî, û Soranî**

##### **4 - Qonaxa berî standardbûnê: hewramî, kirmancî û soranî**

Bo rûnkirdinewey kêşekanî zimanî standardî Kurdî pêwîste dû qonaxî pêş û paş standardbûnî lehce edebîye kan -- Hewramî, Kirmancî û Soranî – berawird bikey û rewî standardbûnyan dîyarî bikeyn. Sê lehcekan pêş bihawbûnewey rojnamey Kurdistan le 1898 da standard ne bûn. Standardbûn, wek piroseyêk, ne seretayêkî deqîqî heye û ne kotayî dê. Be tam dekrê bihêyn ew piroseye le Kirmancî da le 1898 destpêkird û duway bîst safan le Soranî (1918) da werêkewit û le Hewramî da hêştê bedî nakirê.

Divêt em ji bo zelalkirina arêşeyên zimanê kurdî yê standard du qonaxên berî û piştî standardbûna lehceyên edebî -hewramî, kirmancî û soranîyê- hevber bikin (miqayese bikin) û pêvajoya

standardbûna wan diyar bikin. Ev sê lehce berî belavbûna rojnameya Kurdistanê di 1898-ê de standard nebûn. Standardbûnê wek proses ne destpêkeka xwe ya deqîq heye û ne jî bi dawî têt. Lê em dikarin bibêjin ku wê prosesê di kurmanciyê de di 1898-ê de dest pê kir û piştî bîst salan di soraniyê (1918) de bi rê keft û ew hêj di hewramiyê de nahêt dîtin.

Taybetêtîyekanî ew lehce edebiyane ke ta radeyêkî zor le Soranî û Kirmancî ewro dayan debîrê ewanen:

*Taybetîniyên wan lehceyên edebî ku ew heta hedekê mezin pê ji soranî û kirmanciya evro tên cida kirin ev in:*

**Yekem:** lehce edebîyekan honraweyî bûn û pexşanyan nebûwe yan zor kem bûwe.

**Yek:** Lehceyên edebî hozankî (şîrî) bûn û pexşana wan nebû yan pir kêr bû.

**Dûhem:** Erkekaniyan ber tesk bû (zortir le edebîyat da dekardehatin nek le zaniste corawcorekan).

**Du:** Erkên wan berteng bûn (ew bêtir di edebîyatê de, ne di zanistên cor bi cor de dihatin bikaranîn).

**Sêhem:** binkey komeleyetî ew lehçane zor tesik bû (dahênerî berhemî nûsraw zortir rohanêtî û axawet bûn; jnan rêgeyan ne dedira xwendewar bin û "cemawerî xwênerewe" pêk ne hatibû û ney detuwanî pêk bê) û eweş berhemî komeley derebegî û 'eşîreyî bû.

**Sê:** Bingeha civakî ya wan lehceyan gelek berteng bû (Afîrînerên berhemên nivîskî di piraniyê de ruhanî û axa bûn; rê ji jinan re nedihat dan ku ew xwendewar bin û »cemawerê xwendevanan« pêk nehatibû û nedikarî pêk bihêt) û ew jî berhemê civaka derebegî û eşîriyê bû.

**Çuwarem:** Qa'îderonan (codification) le formî zimanda (le elf û bê û xalbendî û rênûs ra bigre heta wuşeronan û şêwazî nûsîn û rêziman) zor kem bû û nûser ta radeyêk azad bû be selîqey xoy binûsê.



**Çar:** Qaîdesazî (codification) di forma zimanî de (di alfabê û niqteşanî û rênivîsê de bigire heta di peyvîsazî û şêweyê nivîsîn û rêzimanî de) gelek kêr bû û nivîskar heta hedekî azad bû ku li gor selîqeya xwe binivîse.

**Pêncem:** her kam le sê lehcekan çend bin lehceyan hebû û hîç kamyar le ser normêk sax ne bibûnewe û her kes bin- lehcey xoy dekardehêna.

**Pênc:** Her yekê ji wan sê lehceyan çend binlehce (devok) hebûn û çî ji wan li ser normekê li hev nehatibûn û her kesî binlehceya xwe bi kar dianî.

**Şeşem:** her lehceyêk le sinûrî xoyda dekardehat û axêweranî lehcey dî fêrî ne debûn û dekaryan ne dehêna (Hewramî ta radeyêk bibû be zimanî edebî le hcekanî dewrûberî xoy).

**Şeş:** Her lehceyek di sinorê xwe de dihat bi kar anîn û axêverên lehceyên din hînî wê nedibûn û ew bi kar nedianî (hewramî heta hedekî bûbû zimanî edebî yê lehceyên dormandora xwe).

**Hewtem:** le geş eweşda zimanekan ('erebî, kurdî, farsî, tirkî...) le barî deseîatewe naberaber bûn û mîlîmilaney zimanîy le arada bû, "îdeolojî zimanî" yan "sîyasetî zimanî" zortir be lay lêkfêrbûn û lêkwergirtin û xuwestineweda deşikawe. Sê sede lewey pêş Ehmedî Xanî le barudoxî komeşgey derebegîda, dijî jêr çepokeyî sîyasî û zimanî wexokewit û têkoşa Kurdî wek Farsî bibête zimanêkî edebî be pêz û be hêz û Farsî wek modêlî geşanewey Kurdî dadena.

**Heft:** Li gel hindê jî zimanê (erebî, kurdî, farsî, tirkî...) ji aliyê desthilatê ve ne hevşeng bûn û hevrikiya zimanî hebû, »idiolojiya zimanî« yan »siyaseta zimanî« bêtir bi aliyê jêkhînbûn û jêkwergirtin û jêqerkirinê ve diçû. Berî sêsed salan Ehmedê Xanî di rewşa civaka derebegiyê de, li dijî bindestiya sîyasî û zimanî rabû ser xwe û xebat kir ku kurdî wek farsiyê bibe zimanekê edebî yê bi pêz û bi hêz û farsî ji kurdîyê re bi modêleka geşbûnê dadena.

Ew xîstetane le yektir cîyawaz nîn û wêkîra pêkhatûn û yekitr daderêjin û debîrnewe û degirnewe. Bo wêne tesîkbûnî binkey komeşayetî (rohanêtî û erîstokirasî derebegî) erkekanî zimanî nûsrawî tengeber dekird (zortir bo edebî honraweyî dekardehat) û berteng bûnî erkekan rêgey ne deda nûsîn be pexîşan geşe bika û ew dû hoyaneş pêşyan le xemfînî wuşe û çemk degirt. Le geş eweşda ew xîstetane zimanî standard û na standard lêk cuwê dekenewe, pêwîste le bîrman bê ke perijînî nêwan

ew dûwane zor pitew nîye. Dîyare zimanî standard çonêtêkî nwêye, befam eger her kam lew xisletane be tenyayî le ber çawbigrîn cîyawazî nêwan standard û na standard wek tefawetî çendêtî bedî dekrê nek çonêtî. Bo wêne eger sed saî lemew pêş lehce edebîyekan le ser normêk (binlehceyêk) sax ne bibûnewe, Kirmancî û Soranî standardî ewroş hêşta ew kêşeyan pê çareser nekirawe. Eger ew perjîn nizmîye le standard bûnî Kurdî da zortir we berçaw dekwê le ber eweye ke zimaneke hêşta le se retakanî ew pirose daye.

*Ew xeslet ji hev ne cida ne û ew pev re pêk hatine û ew yekûdu dadirêjin û dibirin û digirin. Ji bo nimûne bertengbûna bingeha civakî (ruhanî û arîstokratî ya derebegî) erkên zimanê nivîskî berteng dikir (ew bêtir bo edebê helbestê dihat bi kar anîn) û wê bertengbûna erkên wî rê nedida ku nivîsîna pexşanê pêş bikeve û wan herdu sedeman jî rê li xemilîna peyv û terman digirt. Li gel hindê jî ew xeslet zimanê standard û ne standard ji hev cida dikin, divêt li bîra me be ku perjanê di navbera wan herduyan de ne pir mukum e. Diyar e ku zimanê standard çawaniyeka (kalîteyeka) nû ye, lê heger her çî ya ji van xesletan bi tenê, bi serê xwe bihêt li ber çav girtin dê cidahiya di navbera standard û ne standardî de wek tefawuta çendîniyê, ne ya çawaniyê hêt dîtin. Wek mînak, heger sed salan berî niha lehceyên edebî li ser normekê (binlehceyêkê) li hev nehatibûna, ew arêşe bi kirmancî û soraniya standard ya evro jî nedihatin çareser kirin. Heger ew perjanê nizam di standardbûna kurdîyê de bêtir dikeve ber çavan ji ber hindê ye ku ev ziman hêj di destpêkên vê prosesê de ye.*

